**ROJEV**




## Em ji bo pêkanîna xeyala sedsalî dimeşin

**CIWANÊN** Netewî yên Kurdistanê(CNK) biryar wergirtin ku ji bo referandûma serxwebûna Kurdistanê ji Bakûr ber bi Hewlêra paytext ve bimeşin. Endamên Ciwanên Netewî yên Kurdistanê ji Heftenameya Basê re axivîn. **RÛPEL 04**

**EDEBIYAT**




## MORÎ dê bo perwerdeya zarokan bixebite

**EDEBIYATA** Zarokan û materyalên perwerdeya zarokan, di têgêhiştin û pêşveçûna zarokan de girîng û taybet e. Ji bo edebiyata zarokan û materyalên perwerdeya zarokên Kurd jî hin xebat tên meşandin ku yek ji van xebatan jî Morî dimeşîne. **RÛPEL 12**

**ABORÎ**



## Zebeşên Diyarbekirê li ber bi tunebûnê ne

**HIN** mexsûl, ji bo hin bajaran bûne nasname. Dema dibêjin zebeş hema Diyarbekir tê bîra mirov. Bi salan e cotkariya zebeşan li Diyarbekirê tê kirin û cotkariya zebeşan di folklor û aboriya vî bajarî de cî girtiye. **RÛPEL 13**

# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ
Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 30
07-13 TEBAX 2017
www.basnews.com



**3 SAL DERBAS BÛN: JENOSÎDA ŞINGALÊ** R2

# JENOSÎDA ŞINGALÊ WÊ WERE NASKIRIN?

**> BI HEZARAN JIN, KAL, PÎR, ZAROK HATIN QETILKIRIN**

Şingal 3ê Tebaxa 2014an rastî komkujiyeke mezin hat. Di encama êrişên DAIŞê ku xwedî çekên giran bû, jin, kal, pîr, zarok,mêr bi hezaran Kurdên Êzidî hatin qetilkirin û revandin. Bajarê Şingalê di 13ê Mijdara 2015an de ji aliyê Pêşmergeyên Kurdistanê ve ji DAIŞê hat paqijkirin. Hewldan û xebatên avadankirina bajêr berdewam dikin.

**> NYê BANG LI CÎHANÊ KIR: JENOSÎDÊ NAS BIKIN**

Komîsyona Lêkolînê ya Netewên Yekgirtî (NY) jî di salvegera komkujiya Şingalê de bi Kurdî û Îngîlîzî daxuyaniyek belav kir û bang li civaka navdewletî kir ku ev komkujî weke jenosîd were naskirin. Berdevka Wezareta Derve ya DYAyê ragihand: "DYA ji ber karesata bi serê Kurdên Êzidî de hat, gelek dilgiran e û qet jî jibîr nakin.

MUHAMMED SADETTİN:

## Divê xeletiya sedsalî bidawî bê û nexşeya Iraqê ji nû ve bê çêkirin



Serokê Partiya Geşepêdanê ya Tirkmen û Endamê Komîsyona Referandumê Muhammed Sadettin biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê, helwesta Tirkmenan a derbarê serxwebûna Kurdistanê, rêveberiya Bexdayê û cudahiyên Kurdistanê ji Heftenameya Basê re nirxandin. Muhammed Sadettinê di nav şandeya ku bi serpereştiya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî serdana Brûkselê kiribû de bû, ragihand ku Ewropayê jî ji wan re gotiye ew piştgiriyê didin û got, "Ne pêkan e ku em êdî behsa Iraqeke yekgirtî bikin. Dewleta Kurdistanê wê ji Iraqê re bibe cîranekî baş."



**EKREM ÖNEN** >02

Referandûm û Medya III



**HOŞENG OSÊ** >03

Salveger û rojên PKKê yên ku dawî li wan nayê!



**FIRAT CEWERÎ** >09

Bîranînek min û Mehmed Uzun

ABDULMENAF KIRAN: R04



## Neheqiyeke dîrokî wê ji holê rabe

Cîgirê Serokê Giştî yê Hak-Parê Abdulmenaf Kıran di derbarê helwest û xebatên partiya wan ên ji bo referandûma serxwebûnê de ji Heftenameya Basê re axivî. Kıran dibêje, "Miletê Kurd xwedî mafê diyarkirina çarenivîsa xwe ye. Îro derfet ji bo serxwebûna Herêma Kurdistanê çêbûye."

BEREVAN HEMDÎ: R05



## Serxwebûn wê rê li ber jenosîdên nû bigire

Rêveberê Giştî yê Wezareta Şehîd û Enfalkiriyan Berevan Hemdî li ser jenosîda Enfala Barzaniyan bersiva pirsên Heftenameya Basê da. Berevan Hemdî dibêje rabirdûya Kurdan bi jenosîdan derbas bûye û dewletbûna Kurdan wê rê li ber jenosîdên nû bigire.

CÎHAN R08



## Endamên LGBTÎ ji bo mafên xwe li kolanan e

Serokê DYAyê Trump di 26ê Tîrmehê de li dijî transan di hesabê xwe yê twitterê de çend twît parvekirin. Trump di wan parvekirinan de daxwaza qedexekirina beşdarbûna Transan bo nav artêşê dike û piştî vê yekê protestoyan destpê kir. Endamên Sîwana Sor Serkan û Belgim re axivîn ji Heftenameya Basê re axivîn.



EKREM ÖNEN

## Referandûm û Medya III

Înformasyon – Desînformasyon, Propaganda - Kontrpropaganda, Manîpulasyon û Şerê Psîkolojîk

Ev demeke biryara referandûmê hatiye girtin û em dikarin bêjin ji bo referandûmê demeke pir kin maye. Lê heta niha medya kurdî nikare civata kurd mobilîze bike. Medya kurdî nikare bi propagandayek rêk û pêk raya giştî a Kurdistanê saz bike û bi civata kurd bide fam kirin ji bo çi referandûm di berjewendiyê kurdan de ye. Di warê aborî, siyasî, kultûrî, civakî û ewlekarî de çi berjewendiyê her ferdekî kurd di serkeftina referandûmê de heye, heta niha mirov nikare programek weha bi rêk û pêk bibîne. Bes bi gotina referandûm “başe û qence” tenê têrê nake. Ji ber medya xêrnexwazê kurda bi metodên profesyonal ku ji merkezekê bi kadroyên profesyonal propaganda dijberiya referandûmê dike û raya giştî ya kurd ew saz dikin li hember vêya medya kurd bê çareye û nikare bi kontrpropagandayê civata kurd li hember propaganda xêrnexwazê kurda biparêze, hişyar bike û mobilîze bike. Heger rêjeya erê ji referandûmê weke kurd dixwazin dernekeve, divê em kumê xwe deynin ber xwe û bifikirin, me di ku de şaşîtî kir. Ji niha de pir vekirî dibêjim sebebê esasî Medya Kurdî ye her weha wezareta Hikûmeta Herêma Kurdistanê a karê komunîkasyonê û komîsyona bilind a referandûmê ye ku nikarê dezgehek medya profesyonal bi rêk û pêk ava bikin ku referandûm ê serkeftî derbas bikin, “gazin ji dijmin nabe”. Weke ez dizanim komîsyona bilind a referandûmê niha komîteyek bilind a bi karê “Referandûm û Medya” re eleqedar dibe ava kirine. Wek prensîp tiştekî baş, rast û lazim e, bes me di gelek bûyerên derbasbûyî de dît ku gelek komîtê weha hatine ava kirin û encam hûn tev zanin çawa medya kurdî li hember medya xêrnexwazê kurda çawa bê çarebûye. Wek di bûyerên Şingalê de, bûyerên Musilê de û gelek bûyerên din de. Ji ber çi weha ye? Ji ber hemû komîteyên beriya demê berê hatine ava kirin ne ji pisporê medya profesyonal hatine ava kirin, ji kesên amator û heta kesên ku haya wan ji medya qet niye. Ji kesê teknokrat, burokrat û xal û xwarzêtî tên ava kirin, Gelek caran mirov his dike ku kesên li van dezgehan kar dikin haya wan ji sîstema medya çawa li welatên din kar dike hîç niye, tevî ku înformasyon di vî warî de bi dest xistin gelek hesane. Çima nakin? Ji ber înformasyon hebe jî lazime tu bi xwe ji medya fam bike, esasek li cem te hebe ku tu bi karibe fam bike li welatên din sîstema medya cîhanê çawa kar dike. Ji xwe ew nikare fam bike ku ew ji karê medya fam nake, tu çiqas bêje jî bê fêde ye. Gotinek kurda a pêşiya heye dibêjin; “Nezan ji zalima xerabtir in.” Çare ewe kesen weha neynin dezgehên medya yê. Ji ber medya ilmeke û bes kesên ji vî karî fam dikin dikarin vî karî bikin. Medya bi teknokrat û burokrata nameşe.

Propaganda û kontrpropaganda du formên teorîk yê medya ye. Propaganda, belav kirina înformasyonê ye, ew înformasyon dikare bi formên cuda be, ew dimîne li ser dezgeh û kesê propagandê dike bê ka armanca wî/wan ji propaganda dike çi ye? Wek mînak di demên berê de di nava kurda de, propaganda li şûna Ala Kurdistanê ya rasteqîn, alek din, li şûna navê pêşmerge, navekî din. li şûna neşîda (marşa) millî Ey Raqîb neşîdek din. Qehremanên Kurdistanê ên dîrokî yên wek Şêx Ubeydullah, Şêx Mehmûd, Şêx Seîd, Simko, Seyîd Riza, Dr. Nurî Dersimî, Qadî Muhemmed, Mistefa Barzanî û gelekî din, “paşverû û nokerên welatên biyanî” hate propaganda kirin niha jî Birêz Mesûd Barzanî weke “Cihû û hevalê dewleta Tirkiyê” propaganda dikin, bi hezaran mirov bûn qurbanê propaganda vî şerê psîkolojîk û weha bawer dikin. Her weha niha nobeta “Demokrasî û Edelatê” manîpulasyona civata kurde ku girîngiya referandûmê ji ortê rakin. HDP vêya çiqas bi zanetî an nezantî dike ew karê wan e. Ji ber ne wext û ne cih, ne dema karekî weha ye dema kurd lazim e mobilîzeyî referandûmê bibin. Medya kurd jî cihekî mezin dide nûçeyên nobeta “Edalet û Demokrasî yê”. Ji bo çi?

Di rastiya xwe de propaganda û kontrpropaganda du tiştên bi heve girêdayîne, weke îstixbarat û kontristixbaratê. Dikare weke du sîstemên cuda bên diyar kirin jî lê di rastiya xwe de sîstemek komunîkasyonê ya siyasî ye. Kontrpropaganda sîstema li hember sekn û nutral kirina propaganda dijmin an openentê ku dixwaze tesîra psîkolojîk li milet an civata te bike, ji bo karibe wê kontrol bike û weke dixwaze bi rê ve bibe, ev di eynî wextî de propaganda ye

Kontrpropaganda êrîşker li ser esasê derew, dezgeh û şexsên dizî ê nav û adresên derew li xwe dikin, bikaranîna metodên cuda ji bo bêşexsiyet kirin, piçûkxistin û reşkirina dezgeh û şexsan belav kirina nûçeyên bêfakt û argument bi rêve diçe. Armanca wê di mala muxalifê xwe de şerê wî bike. Medya kurdî li gor qaîda heye tev negere kurdê destkeftiyên mezin wenda bikin.




Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

3 sal derbas bûn

# Jenosîda Şingalê wê were naskirin?





**DAIŞê bi alîkariya Eşîrên Ereb ên li derdora Şingalê êrîşî Şingalê kir û ew komkujiyên mezin pêkanîn. Piştî salek û nîv dagirkeriya DAIŞê, Pêşmergeyên Kurdistanê di bin fermandariya Serokê Herêma Kurdistanê, Barzanî de di 13ê Mijdara 2015an de Şingal ji DAIŞê paqij kirin.**

MURAT ÖZDEMİR

Bajarê Şingalê warê Kurdên Êzidî sê sal berê di sala 2014an de rastî karesateke mezin hat. Di 3ê Tebaxa 2014an de rêxistina DAIŞê bi çekên giran ku ji Artêşa Iraqê jê re mabûn, bi hemû hêza xwe êrişî Şingalê kir ku bi awayekî fermî ne girêdayî Herêma Kurdistanê ye. Di encama vê êrişê de bi hezaran keç, xort, jin, kal û pîrên Kurdên Êzidî hatin qetilkirin û bi hezaran hatin revandin û çarenivîsa bi hezaran jî ne diyar e. Şingal, piştî heyameke dagirkeriyê, ji aliyê Pêşmergeyên di bin fermandariya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ve hat rizgarkirin.

**Êrişê çawa destpê kir?**

Rêxistina DAIŞê ku beşeke mezin ji xaka Sûriyê û Iraqê dagir kiribû, 10ê Hezîrana 2014an duyemîn bajarê mezin yê Iraqê Mûsil dagir kir. Di pevçûnên li vî bajarî de Artêşa Iraqê bêyî kuli ber xwe bide, hemû çekên xwe ku DYAyê jê re dabîn kiribûn, li paş xwe hiştin û bajar ket destê rêxistina tundrew. Piştî ku Mûsil ket bi kontrola vê rêxistinê, talûke û metrsiyên li ser herêmên Kurdî jî zêde bûn ku yek ji van herêman jî Şingal bû. Ne tenê navenda Mûsilê, herêmên li ser sînorê Şingalê jî ketin destê DAIŞê û Artêşa Iraqê ew dever jî terikandibûn û Şingal ku bajarê Kurdistanê yê Kurdên Êzidî ye, di nav herêmên binakok de ye û statûya wê bi awayekî fermî nehatiye diyarkirin, ji êrişan re vekirî mabû. Ji ber wê yekê jî hêzêke mezin a Pêşmergeyên Kurdistanê li wê derê tune bû. DAIŞê piştî ku çekên giran bidest xistin, bi alîkariya hin eşîr û hozên Ereb êrişek bir ser nahiyeya Zumarê. DAIŞê ku xwedî çekên dewletekê bû, 3ê Tebaxa 2014an gihişt bajarê Şingalê û di encama êrişên vê rêxistina hov de komkujî û karesateke mezin bi serê Kurdên Êzidî de hat.

> Komîsyona Lêkolînê ya Netewên Yekgirtî (NY) a Sûriye, di salvegera komkujiya Şingalê de bi zimanên Kurdî û Îngîlîzî daxuyaniyek belav kir û bang li civaka navdewletî kir ku ev komkujî weke jenosîd were naskirin.

Li gor daneyên Berpirsên Herêma Kurdistanê di encama êrişên DAIŞê de 360 hezar kes ji Şingalê belavî cîhanê bûn. Zêdetirî hezar û 500 Kurdên Êzidî hatin qetilkirin û piraniya wan jin û zarok 6 hezar û 500 Kurdên Êzidî jî ji aliyê DAIŞê ve hatin revandin. Bi operasyonên Pêşmerge û hevpeymana navdewletî jî zêdetirî 3 hezar Kurdên Êzidî ji destên DAIŞê hatin rizgarkirin.

**Şingal bi fermandariya Serok Barzanî hat rizgarkirin**

Hikûmeta navendî her tim di nav hewldanên veqetandina Şingalê ji Herêma Kurdistanê de bû. Tê ragihandin ku bi çêkirina bendava Mûsilê zêdetirî 100 gundên Kurdên Êzidî di bin avê de man û beriya wê jî bi polîtîka û lîstikên qirêj bi demografiya herêmê dihat lîstin. Di êrişa DAIŞê û pêşveçûna wê ya bi lez de jî bandora van kiryaran hebû. DAIŞê bi alîkariya Eşîrên Ereb ên li derdora Şingalê êrişî Şingalê kir û ew komkujiyên mezin pêkanîn. Piştî salek û nîv dagirkeriya DAIŞê Pêşmergeyên Kurdistanê di bin fermandariya Serokê Herêma Kurdistanê Barzanî de 13ê Mijdara 2015an Şingal ji DAIŞê paqij kir.

**“Dema avadankirin û pêkvejiyanê ye li Kurdistan û Şingalê”**

Li Duhokê heftiya derbasbûyî bi boneya 3. Salvegera komkujiya Şingalê merasîmeke bîranînê hat lidarxistin û Serokwezîrê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî jî gotarek pêşkeş kir. Serokwezîr Barzanî di vê gotara xwe de eşkere kir ku wan hikûmeta navendî ya Iraqê di derbarê metirsiya DAIŞê ya li Şingal û derdorê de agahdar dikir lêbelê tiştek nehat kirin. Barzanî wiha axivî: “Dema ku DAIŞê êrişî Şingalê kir, Hêzên Pêşmerge ne xwedî çekên giran û pêşketî bûn. Artêşa Iraqê tevî çekên giran jî nikarî êrişan rawestîne û bi hezaran leşkerên Artêşa Iraqê çekên giran ji DAIŞê re hiştin û revîn. Ne mimkûn bû ku Pêşmerge bi çekên di destê xwe de Şingalê biparêze. Şingal serperiştiya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî bi destê Pêşmergeyên qehreman, ji DAIŞê hat rizgarkirin. Dema wê hatiye ku em pirên baweriyê ava bikin û rûpela reş a DAIŞê rakin û rûpeleke spî ya avadankirinê û pêkvejiyanê vekin li Kurdistanê û Şingalê.”

**“974 malbatên Êzidî vegeriyan Şingalê”**

Qayimeqamê Şingalê Mehma Xelîl di axaftina xwe ya salvegera komkujiya Şingalê de eşkere kir ku 974 malbat ku di encama êrişên DAIŞê de ji cih û warên xwe çûbûn, vegeriyane Şingalê. Xelîl wiha axivî: “Ji 6 hezar û 400 Kurdên Êzidî yên hatine revandin, 3 hezar û 50 kes ji destê DAIŞê hatin rizgarkirin. Piraniya wan jin û zarok 3 hezar û 367 Kurdên Êzidî hê jî dîl girtî ne, di destê DAIŞê de.” Xelîl herwiha diyar kir ku Êzidî êdî dixwazn di welatekî serbixwe de bijîn û got, “Kurdên Êzidî wê bi dirûşma ‘Duh jenosîd, îro referandûm, sibê serxwebûn’ di 25ê Îlonê de biçin ser sindoqan.”

**Ji NYê bang: Jenosîda Şingalê nas bikin**

Komîsyona Lêkolînê ya Netewên Yekgirtî (NY) aSûriyê, di salvegera komkujiya Şingalê de bi zimanên Kurdî û Îngîlîzî daxuyaniyek belav kir. Di daxuyaniya ku ji aliyê endamên komîsyonê Paulo Sérgio, Karen Koning Abu Zayd û Carla Del Ponte ve hat kirin de komkujî hat şermezarkirin û bang li civaka navdewletî kirin ku ev komkujî weke jenosîd were naskirin. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku divê hewldanên ji bo dîtina Êzidiyên di destê DAIŞê de zêde bibin û bên rizgarkirin. Komkujiya Şingalê ji aliyê Kongre, Wezareta Derve ya DYAyê, Yekitiya Ewropayê û Hikûmeta Navendî ve weke jenosîd hatiye qebûlkirin.

**“Em karesata Şingalê tu caran jibîr nakin”**

Berdevka Wezareta Derve ya DYAyê Heather Nauert ragihand ku welatê wê ji ber karesata Şingalê pir dilgiran e û ti caran jî jibîr nakin.Berdevka Wezareta Derve ya Amerîkayê Heather Nauert di daxuyaniyeke çapemeniyê de ragihand, DYA ji ber karesata bi serê Kurdên Êzidî de hat, gelek dilgiran e û ti caran jî jibîr nakin. Nauert diyar kir ku DYAyê ji bo mexdûrên karesatê 1.4 milyar dolar alîkariyên mirovî pêşkêşî Iraqê kiriye.

**Şingal wê ji nû ve were avakirin**

Ji bo ji nû ve avakirina bajarê Şingalê, Hikûmeta Herêma Kurdistanê dinava xebat û hewldanan de ye. Şingal ku beriya êrişên DAIŞê bi gundewarên xwe ve zêdetirî 450 hezar xelk lê dijiyan, di wê heyama di bin dagirkeriya DAIŞê de, zirareke mezin dît. Qeyimûqamê Şingalê Mehma Xelîl beriya niha ragihandibû ku bi pêşniyaza Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, Şingal ku wêran bûye wê bibe muze û ji bo Kurdên Êzidî li nêzî Şingalê wê bajarekî nû bê avakirin û diyar kiribû ku hebûna hêzên leşkerî yên ser bi PKKê ve li navenda bajêr asteng in li pêşiya avadankirina bajêr.



## Êrişî Weqfa Alîkariyê ya Barzanî kirin

Hefteya borî di rojên salvegera komkujiya Şingalê de hat ragihandin ku hêzên ser bi PKKê ve êriş birin ser Weqfa Alîkariyê ya Barzanî ku alîkariya mirovî li xelkê herêmê û yê di kampan de belav dikir. Weqfa alîkariyê ya Barzanî ku heta niha ji aliyê gelek rêxistinên navdewletî ve jî hatiye xelatkirin, bêyî rawestan ji bo mexdûr û koçberên şer alîkariyan dabîn dike û roleke sereke di başkirina rewşa mexdûr û koçberan de dilîze. Hat zanîn dema ku dîsa xebatkarên weqfê alîkarî li xelkê belav dikirin rastî êrişa hêzên ser bi PKKê ve hatin. Berpirsekî Weqfê ji K24ê re eşkere kir ku ev ne êrişa yekem e û diyar kir ku ew ne nûnerên tu aliyên siyasî ne û armanca wan tenê belavkirina alîkariyan li xelkê ye.

## “Şingal axa Kurdistanê ye û divê bi ser Kurdistanê ve be”

Li Herêma Kurdistanê di 25ê Îlonê de referandûma serxwebûnê dê pêk were. Kurdên Êzidî yên ku rastî karesatên mezin hatine dibêjin ‘Eger miletek ne serbixwe be, ola wî miletî jî dê ne azad be û em bi hemû hêza xwe li gel serxwebûna Kurdistanê ne ku wê bidewletbûna Kurdan rê li ber karesatan jî bigire. Nûnerên Kurdên Êzidî li Herêma Kurdistanê jî ji Basê re ragihandin ku ew êdî naxwazin Şingal bi Bexdayê ve girêdayî bimîne û divê demildest bi awayekî fermî bi Herêma Kurdistanê ve were girêdan.

**“Em dev ji netewa xwe bernadin û bi hemû hêza xwe li gel Kurdistanê ne”**

Berpirsê Êzidiyan di Wezareta Ewqafê de Xeîrî Buzanî ji Basê re diyar kir ku li tevahiya Herêma Kurdistan û Iraqê di navbera 550 û 600 hezarî de Kurdên Êzidî hene û wiha pê de diçe, “Piraniya vê gelheyê di ser temenê 18an re ye û wê ji bo azadî û serxwebûnê biçin ser sindoqan. Mixabin hin alî dixwazin Kurdan ji nasnameya netewî dûr bixin. Lê belê her kes dizane ku çawa Kurdên Êzidî dev ji baweriya xwe bernedan, wê dev ji nasnameya xwe jî bernedin. Eger civatek ne serbixwe be, ola wê jî ne azad e. Em bi hemû hêza xwe li gel Herêma Kurdistanê ne û hêza tu kesî têrê nake ku me ji welat û nasnameya me veqetîne. Serxwebûn bo Kurdên misilman carekê baş be, ji bo me du caran baş e ji ber ku em him ji ber netewa xwe û him ji ber ola xwe rastî zext û zordariyan hatine. Em li benda serxwebûna Kurdistanê ne.”

**“Em dixwazin Şingal bi fermî bi Kurdistanê ve were girêdan”**

Berpirsyarê Şaxa Sinûnê yê Saziya Civakî ya Laleşê Silêman Fano, ji Basê re eşkere kir ku xelkê Kurdên Êzidî dixwazin êdî ji Bexdayê veqetin û got ku riya vê jî dengê ‘Erê’ di referandûmê re derbas dibe. Fano ragihand ku ew qet naxwazin li ser çarenivîsa Şingalê bi Bexdayê re gotûbêj bên kirin û wiha pê de çû: “Bi çi awayî be jî em dixwazin Şingal ser bi Herêma Kurdistanê ve be. Ji ber ku me tu xêr ji Bexdayê nedît.

**“Li Iraqê em gelek caran rastî karesatan hatin”**

Berpirsyarê Şaxa Şingalê ya Saziya Civakî ya Laleşê Xeşo Mîrza jî ragihand ku nabe êdî Şingal girêdayî Mûsil û herwiha Iraqê bimîne. Li Iraqê gelek caran em rastî komkujî û karesatan hatin. Di referandûmê de bi dengê ‘Erê’ em ê ji Bexdayê xilas bibin.

Serokê Partiya Geşepêdanê ya Tirkmen û Endamê Komîsyona Referandumê:

# Divê xeletiya sedsalî bidawî bê û nexşeya Iraqê ji nû ve bê çêkirin



Dema ku mirov li rewşa Iraqê dinêre mirov dibîne ku hê di serî de li ser bingeheke şaş hatiye avakirin. Ji ber ku wê demê weke 3 wîlayetên dewleta Osmanî bû. Tu têkiliya van her sê wîlayetan a sîyasî, çandî û olî çênebûye. Lêbelê dema ku Îngîlîz û rojavayiyan nexşeya Rojhilata Navîn çêdikirin, ev her sê wîlayet kirine dewleteke bi navê 'Iraq'.

RÊZAN KARWAN

**Tirkmen û pêkhateyên ku dixwazin li gel Iraqê bimînin gelo daxwaza dewleteke serbixwe dikin?**

Ez him weke welatiyekî Iraqê û him jî weke aliyekî netewî dema ku mirov li rewşa Iraqê dinêre mirov dibîne ku hê di serî de li ser bingeheke şaş hatiye avakirin. Ji ber ku wê demê weke 3 wîlayetên dewleta Osmanî bû. Tu têkiliya van her sê wîlayetan a sîyasî, çandî û olî çênebûye. Lêbelê dema ku Îngîlîz û rojavayiyan nexşeya Rojhilata Navîn çêdikirin, ev her sê wîlayet kirine dewleteke bi navê 'Iraq'. Nêzîkahî û fikrên xelk û pêkhateyan ji bo vê yekê nebûn yek û ji damezirandina wê heta niha tim kêşe derketine. Kurdistan û Iraq gelek ji hev cuda ne. Li Kurdistanê pêkvejiyan heye, aramî heye, geşepêdan heye, xizmetgûzarî heye. Ev tişt hemû, Kurdustanê ji Iraqê cihê dikin. Li Kurdistanê qeyraneke aborî jî heye lê dîsa jî yekgirtina wan ji ya Iraqê bihêztir e. Li Kurdistanê Tirkmen mafên xwe bidest dixin, bikar tînin û nêrîn û fikrên xwe bi hêsanî tînin ziman. Li Iraqê rewş berovajî vê yekê ye. Bexda, Tirkmenan bo berjewendiyên xwe yên hikûmraniyê bikar tîne.

**Divê nexşeya Iraqê ji nû ve bê çêkirin?**

Erê, divê ji nû ve bê çêkirin. Ji ber ku ev şaşiyeke sedsalî ye. Her sê herêm nehatin ba hev û nebûn yek. Ji ber wê yekê di rastiyê de Iraqeke yekgirtî nîn e. Iraq bi awayekî fîîlî di navbera sê hereman de dabeş bûye. Tenê Iraqeke ku Şîe lê zêde ne û Sunne tê de kêm in maye. Ji nîvê zêdetirê herêmên Sunneyan di destê terorîstên DAIŞê de ne û hizûr û aramî tune ye. Beşek jî di bin desthilata Şîeyan de ye. Beşa din jî Kurdistan e ku xwedî sîstemeke taybet, parlamento , hikûmeta xwe ye. Deriyên wê yên sînorî hene û aboriya xwe birêve dibe. Ji ber hindê divê nexşe ji nû ve bê xêzkirin û vegere rewşa berê. Bİ nexşeya rastîn wê serxwebûna sîyasî û erdnigarî ya Kurdistanê pêk were.

**Li herêmê dema dewleteke nû hatiye?**

Belê. Ji ber ku partiyên siyasî û pêkhatiyên Kurdistanê li ser vê mijarê biryar dane. Ev biryar di heman demê de biryara miletê Kurdistanê ye û poşmanî ji vê biryarê çênabe. Mafê me heye ku em xwe birêve bibin û ev yek jî dê bi beşdariya pêkhatiyên li herêmê pêk were. Herêma Kurdistanê di qada navdewletî de piştgiriyeke xurt distîne. Divê dewleteke demokratîk, medenî û rêzgirtî ji mafên pêkhateyên cuda û yasayên navdewletî were avakirin. Ji bo pêkvejiyana xelkê Kurdistanê divê dewleteke demokratîk û medenî bê avakirin ku ev dewlet mafên hemû pêkhate û mirovan biparêze.

**Tê gotin ku 'Dema Kurdistan ava bibe, herêmeke bi navê Sunneyan namîne. Ji ber ku li hemû aliyan Şîe wê bibin desthilat.' Gelo dewleta Kurdistanê ava bibe, metirsiyeke wiha heye?**

Divê Sunne bi xwe biryara xwe bidin. Eger vê yekê bikin, li Iraqê wê kêşeya Sunneyan çareser bikin. Nexwe me dît ka piştî 2003an çi hat serê Iraqê û çawa wêran bû. Ji bo rizgariya xwe divê xwedî projeyeke netewî û yekgirtî bin. Divê eniyeke siyasî ya hevbeş ava bikin û bi vî awayî wê serbikevin. Niha tenê Şîe ji Bexdayê memnun in. Iraq bi vî awayî nayê birêvebirin. Xelk ji Bexdayê direve û xwe dispêre Herêma Kurdistanê. Ji ber ku Iraqê ew neparastin û nikarî welêt birêve bibe. Piraniya herêmên Sunneyan ketin destê DAIŞê û wêran bûn. Xelkê wan herêman jî bûn koçber...

Deşta Nînowa wêran kirin, bajêrekî bi navê Mûsilê nehiştin. Çareseriya rasteqîn û baş ew e ku referandûm li Kerkûk, Diyala û Mûsilê jî pêk were. Kurdistan wê bibe dewleteke navenda aramî û ewlehiyê. Divê Sunne jî ji bo guhertinekê di herêmên xwe de pêk bînin, divê bi xebitin û divê Şîe jî li başûrê Iraqê ji bo xwe herêmeke taybet ava bikin û xwe birêve bibin. Dewleta Kurdistanê wê ji bo Iraqê bibe cîranekî baş. Herêma Kurdistanê niha tevî ku ne dewlet e jî pêwendiyên baş li gel Tirkiye, Iraq û Îranê ava kirine û herwiha xwedî hêzeke dîplomatîk a mezine jî. Kurdistana di bin serpereştiya Barzanî de di pêşerojê de wê ji bo hemû pêkhateyan bibe mînakeke baş û serkeftî. Ez piştrast im ku welatên Ewropî jî wê maf bidin me û wê bibêjin xweziya hê zûtir me ji bo damezirandina dewleta Kurdî kar bikira.

**Hûn di şandeya ligel Barzanî ya ku çûyî Brûkselê de bûn. Dîtin û boçûnên we li ser vê serdanê çi ne, çi biryar hatin girtin û çi hat kirin?**

Armanca me pêkhateyên li Kurdistanê ew e ku em bibêjin em dixwazin bi referandûmê biryarê li ser çarenivîsa xwe bidin. Me xwast em bêjin em ji bo pêşeroja herêmê ne talûke ne û berojavî wê em li ser başkirina herêmê dixebitin. Mafê me ye ku em bi awayekî medenî biryarê li ser çarenivîsa xwe bidin. Wan jî ji me re got, 'Em di referandûmê de piştgiriyê didin we'. Cîgirê Parlamentoya Ewropayê, parlementer û nûnerên berpirsên Yekitiya Ewropayê (YE) hemûyan di vê meseleyê de piştgirî dan me. Diyar kirin ku ew ê rêzê ji îradeya miletê Kurdistanê re bigirin. Lêbelê mixabin hin dezgehên ragihandinê yên Kurdistanê li ser vê mijarê agahiyên xelet belav kirin. Em hê jî nizanin ka çavkaniyên van nûçeyan ku der e. Van dezgehan îddîakirin ku YE piştgiriyê nade referandûmê. Lêbelê berovajî van îddiayan YEyê ji me re ragihand ku ew piştgiriyê didin û ew amade ne ku nûnerên xwe ji bo referandûmê bişînin. Li Belçîkayê partiya damezirîner a hikûmetê, piştgiriya xwe bi awayekî zelal eşkere kir. Gotin, "Mafê miletan ê diyarkirina çarenivîsa xwe di bernameya me de heye û em weke partî jî piştgiriyê didin we." Almanya, Polonya û Awusturyayê piştgiriyên xwe ragihandin û miletê Kurdistanê pîroz kirin.

## Li gorî we çima Iraqî naxwazin Kurdistan bibe dewleteke serbixwe?

Iraq kar li ser projeyeke netewî nake û karîgeriya welatên cîran li ser Iraqê heye. Em bibêjin û nebêjin Iraq nikare birayeke stratejîk li ser pêşeroja xwe bide. Eger Iraqê bixwasta ku yekgirtî bimîne, diviyabû yekrêzî û tifaqek di navbera hemû pêkhateyan de ava bikira. Iraqê, ji bo Pêşmerge, xelkê Kurdistanê û aboriya Kurdistanê kêşeyên mezin ava kirin. Ger ku Bexdayê Iraqeke baş bixwasta ev kiryar nedikirin. Asayî ye ku hin welat nexwezin dewletên mezin û di her warî de bihêz, ava bibin. Ji ber ku ne dixwazin Iraq bihêz bibe û ne jî dixwazin dewleteke bihêz ji nava Iraqê derkeve. Tenê dixwazin Iraq wiha bimîne. Lêbelê biryara me bi xwe heye û miletê Kurdistanê biryara xwe daye.

Iraq wê wiha bimîne an wê pêşeroja wê çawa be? Biryara we heye ku hûn ji bo gûftûgokirinê şandeyekê bişînin Bexdayê?

Ji bo çareserkirina kêşeyan beriya referandûmê û piştî referandûmê wê li gel Bexdayê gotûbêj werin kirin. Bexdayê hemû kozên di destê xwe de bikar anîn. Astengiyek nema ku li hemberî Pêşmerge, îdareya Kurdistanê û aboriya Kurdistanê dernexist. Iraqê para Kurdistanê a ji sedî 17 di bûdçeyê de birî. Lê Kurdistanê dîsa jî karî aboriya xwe ya xweser ava bike. Ji Mûsilê leşkerên xwe paş ve kişandin û Pêşmergeyên Kurdistanê ev herêm hemû parastin û heta ku hin deverên ne axa Kurdistanê ne jî ji aliyê Pêşmerge ve hatin parastin. Tiştekî Iraqê li gel me nemaye. Ji ber vê yekê divê bi hemû hêza xwe em Iraq, Îran û Tirkiyeyê qanih bikin û dewleta xwe ava bikin. Bi tecrûbeya siyasî ya piştî rûxandina rejîma Sedam, ketina Mûsilê û hêza Pêşmergeyên Kudistanê ku dikare welatê xwe biparêze, em gihiştin wê baweriyê ku divê em çarenivîsa xwe diyar bikin. Divê tiştên hatine jiyîn neyên jibîrkirin û dîsa bi Iraqê re ranebin. Du tecrûbeyên Kurdistanê çêbûn; Yek heyama 1992-2003 û ya din jî heyama 2013-2017an e. Di van qonaxan de çi hat guhertin em dizanin. Ji ber hindê divê di qonaxa sêyem de em bibin dewlet û divê hemû hewldanên me di vê çarçoveyê de bin. Em dixwazin çarenivîsa xwe bi awayekî siyasî, dîplomatîk û aştiyane diyar bikin.

## Gotegotên paşxistina referandûmê hene. Gelo îhtîmala paşxistinê heye û ji bo pêşerojê di ajandaya Kurdistanê de çi heye?

Miletê Kurdistanê dikare di mijara paşxistina referandûmê de biryar bide. Û herwiha karesateke xwezayî ku xebatên komîsyona hilbijartinan asteng bike dikare referandûmê bi paş bixe. Miletê Kurdistanê û aliyên siyasî yên Kurdistanê biryar dane ku di 25ê Îlonê de referandûma serxwebûnê pêk bînin. Tu kes nikare li pêşiya vê îradeyê raweste û referandûmê bi paş bixe. Tenê dimînin kêşeyên di navbera PDK û Goranê de û ji bo çareserkirina van kêşeyan jî hewldan hene. Jixwe ev kêşe nabin sedema paşxistina referandûmê ku meseleyeke gelek girîng e.

**Çavdêrên navdewletî wê kengî werin Kurdistanê?**

Komîsyon wê welatên ku piştgiriya xwe eşkere kirine bi awayekî fermî vexwîne. Du şêweyên çavdêriyê hene. Hinek tenê ji bo çavdêrîkirinê û hinek jî ji bo piştgirîkirinê tên û dişopînin. Beşdarbûn û şopandina çavdêrên navdewletî di vê referandûmê de gelek girîng e. Ji ber ku ev tê wê wateyê ku ew welatên şandeyên xwe dişînin, di heman demê de piştgiriyê jî didin.



## MUHAMMED SADETTIN

Serokê Partiya Geşepêdanê ya Tirkmen û Endamê Komîsyona Referandumê Muhammed Sadettin biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê, helwesta Tirkmenan a derbarê serxwebûna Kurdistanê, rêveberiya Bexdayê û cudahiyên Kurdistanê ji Heftenameya Basê re nirxandin. Muhammed Sadettinê di nav şandeya ku bi serpereştiya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî serdana Brûkselê kiribû de bû, ragihand ku Ewropayê jî ji wan re gotiye ew piştgiriyê didin û got, "Ne pêkan e ku em êdî behsa Iraqeke yekgirtî bikin. Dewleta Kurdistanê wê ji Iraqê re bibe cîranekî baş."

---

HOŞENG OSÊ



## Salveger û rojên PKKê yên ku dawî li wan nayê!

Tiştekî gelek nebaş li cem hemû partiyên Kurdan: PDK, YNK, PKK... hwd heye ku salveger û rojên xwe yên partîtî, dikin roj û cejnên netewî û li ser Kurd û Kurdistanê ferz dikin!. Ev diyarde, rêjeya wê, li cem PKKê ji hemû partiyên din yên Kurdan bêtir e, lê hemû partî, di nexweşiyê de, hevbeş û şirîk in. Dibe ku kesek bipirse: çima ev diyarde li cem PKKê bêhtir e?!. Ji ber ku PKKê dibîne ku vejîna gelê Kurd û vejîna xebat û têkoşîna azadiya Kurd û Kurdistanê ji PKKê dest pê dike û berî PKK; Kurd mirî bûn, kole û winda bûn, ne Kurd bûn, newêrek û xizmetkarê dijminên xwe bûn. Û piştî çêbûn û sazbûna PKKê, ji nû ve Kurd bûn Kurd!.

Birastî, hingî cejn û salvegerên PKKê pir in, mirov di nav wan de winda dibe. carinan jî, dema PKKê van roj û salvegeran pîroz dike, ev rêxistin dikeve nava nakokiyan. Mînak; PKKê roja 15ê tebaxê weke cejna vejînê bi nav dike û ev roja ku PKKê tê de dest bi şerê çekdarî ya sala 1984an kiriye, salane bi gelek şêweyan pîroz dike. Di gel vê jî, PKKê roja 1ê (septemberê) eylûlê ku roja aştî ya cîhanê ye, piroz dike û çalakiyan li dar dixe!. Ango PKKê roj û salvegerên şer û salvegera roja aştî ya cîhanê, herduyan pîroz dike!.

Roja 15ê sebatê ku Öcalan tê de hatiye revadin û dîlgirtin, PKKê weke "roja reş" û "komploya navnetewî" bi nav dike û salane vê rojê bi gelek şêweyan bibîr tîne. Her sal di vê rojê de PKKê di daxwiyana xwe de dibêje û dubare dike: "me komploya navnetewî têk bir". Lê carinan, dema rewş piçek li PKKê tengav dibe, PKKê di media û daxwiyaniyên xwe de bibêje: "komploya navnetewî berdewam e". vêja em nema zanin bê ev "kompilo" têk çûye? yan berdewam e?!.

Ta niha, camêrek yan jî xanimeke ji nav derûdora PKKê derneketiye û hejmarek ji van roj û salvegerên taybet yên PKKê çênekirine!?. Di van çend xêzên mayî yên vê nivîsê de, ezê hewl bidim hindek salvegerên PKKê bihijmêrim:

1- rojbûna PKKê di 27/11/1978an de. 2- roja şehîbûna M. Doğan 21/3/1982. 3- roja rojiya birçîbûnê ya girtiyên PKKê di 14/7/1982. 4- roja şehîdbûna Hakî Karer 18/5/1977 ku weke cejna şehîdan tê bi nav kirin û pîroz kirin. 5-roja 15/8/1984 ku şerê çekdarî dest pê kir. 6- 27/3/1986 roja şehîdbûna Mahsûm Korkmaz - Egîd. 7- şerê başûr 1992an û şehîdbûna Berîtan (GÜLNAZ KARATAŞ). 8- xweşewitandina Ronahî û Berîvan li Almanya, di sala 1994an de. 9- çalakiya Zîlan (Zeyneb Kinaci) di dawiya hezîrana 1996an de. 10/10/1998an derketina Öcalan ji Suriye û destpêka "kompilo". 9- 15 sebata 1999an girtin û revandina Öcalan. 10- rawestandina şer û şandina girûbên aştiyê di sala 2000î de. 11- şikandina êrîşa li ser herêma Zapê di 29/3/2008an de. 12- şandina girûbên aştiyê di sala 2010an de. 13- 4ê Nîsanê rojbûna Öcalan û serdana gundê wî. 14- salvegera koçkirina dayika Öcalan, Uwêş Öcalan di 10/4/1995an. 15- "şoreşa rojava" di 19/7/2013an de. 14- Berxwedana Kobanî....hwd.

Di nava van roj û salvegeran de, du qatên wan ku min jibîr kirine, hene. PKK-PYD van rojan weke rojên girîng û netewî dibîne û dixwaze wan li ser Kurdên di binê deshilatdariya xwe de ferz bike. Ji bilî vê jî, PKKê û belkî hin partiyên din jî, hin roj û salvegerên xwe yên partiyê, ji roj û salvegerên netewî bêtir bibîr tînin!.

Nifşên nû û zarokên Kurdan êdî li ser roj û salvegerên PKK perwerde û mezin dibin û van roj û salvegeran weke rojên netewî di mejî û giyanên wan de tên çandin. Bi vî şêweyî, civak û mirovên Kurd, li gorî rê û rêbaz û bîrdoziya PKK, tên "kedî" û "kerî" kirin.

Desthilatiya PKK-PYDê li rojavayê Kurdistanê van bîranîn û salvegerên xwe yên hizbî - partîtî û Îdyolojîk li ser civak û milet ferz kiriye û di roja 15 sibatê, yan di 15 tebaxê, yan di 4ê nîsanê de... jiyan li rojavayê Kurdistanê radiweste. Pirbûna van roj û salvegran êdî milet "gêjomêjo" kirine û kesek newêre bêje: ev çiye?! ev çi hal û rewş e?! ev çi dogmatîzima hişk e!?. û ta kengî ev pîrozkirina van salvegeran dê li gelê Kurd were ferzkirin!?.

Mixabin, bi navê azadiyê û rizgariyê û demorasiyê .... hwd, komkujiyeke civakî, giyanî, hişmendî, derûnî..., ji aliyê PKKê ve li ser gelê Kurd tê meşandin. di vê rewşê de jî, hela nivîskar û rojnamevan û rewşenbîrên derdora PKK çav, dev û guhê xwe ji vê komkujiyê bigirin, mirov dikare bihaneyan ji wan re bibîne. Lê ew kesên ku ji PKKê veqetiyane û van tiştan bi hûrbînî û detayan dizanin, ev kes çima dev, duh û çavên xwe ji vê rewşa kambax digirin!?. ji çi ditirsin!?.

Cîgirê Serokê Giştî yê Hak-Parê Abdulmenaf Kıran:

# Bi avabûna Kurdistanê neheqiyeke dîrokî wê ji holê rabe

JÎN MAZÎ




Li Herêma Kurdistanê amadekariyên referandûma serxwebûnê berdewam dikin û roj bi roj piştgiriya ji bo referandûma serxwebûna Kurdistanê zêde dibe. Ji bilî partiyan, rêxistinên navdewletî, partî, sazî û rêxistinên Bakûr jî piştgiriya xwe ya ji bo referandûma serxwebûnê tînin ziman. Yek ji van partiyan jî Partiya Maf û Azadiyan (Hak-Par) e. Cîgirê Serokê Giştî yê Hak-Parê Abdulmenaf Kıran di derbarê helwest û xebatên partiya wan ên di derbarê referandûma serxwebûnê de ji Heftenameya Basê re axivî.

**''Divê hemu Kurd piştgiriyê bidin referandûmê''**

Cîgirê Serokê Giştî yê Hak-Parê Abdulmenaf Kıran Helwesta partiya xwe ya li hember referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê wiha anî ziman: "Roja ku referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê hat rojevê, Partiya Maf û Azadiyan bi zelalî helwesta xwe anî ziman. Bêşik û bi biryardar me got em piştgiriyê didin referandûmê. Kurd xwedî mafê diyarkirina çarenivîsa xwe ne. Îro derfet ji bo serxwebûna Herêma Kurdistanê çêbûye. Divê em hemû Kurd bi kêfxweşî û bi coş piştgiriyê bidin. Partiya Maf û Azadiyan hê di destpêkê de piştgiriyê dide vê referandûmê."

**"Sînorên niha, ne yên xwezayî ne"**

Abdulmenaf Kıran di derbarê karîgeriya Kurdistana serbixwe ya li ser Rojhilata Navîn de wiha dibêje: "Wek tê zanîn, di şerê Cîhanê yê yekem de li Rojhilata Navin sînorên dewletan bi pênûsê hatin kifşkirin. Dewletên heyî ne li gor miletên ser erd hatine avakirin. Li gor pêwistiyên serkeftinên şer hatin avakirin. Serkeftiyên Şerê Cîhanê yê yekem wek ku tê zanîn Britanya û Fransa bû. Lewra Uris ji şer vekişiyabû. Piştî şoreşa sosyalist, Uris ji parvekirina têkçûna şer vekişiya. DYAyê jî ji encamê şer par nedixwest. Britanya û Fransa li Rojhilata Navîn di nav xwe de parvekirin. Di vê parvekirinê de sinorên netewan nedan ber çavan. Ji ber vê yekê Kurdistan bu çar perçe. Sînorên niha, ne yên xwezayî ne. Ji ber vê yekê di Rojhilata Navîn de miletekî bê dewlet heye ew jî miletê Kurd e. Eger di encama referandûmê de "erê" derkeve, wê miletê Kurd jî li Rojhilata Navîn bibe xwedî dewlet û wê beşek Kurdistanê azad bibe. Neheqiyeke dîrokî jî wê hinekî ji holê rabe. Birayên me yên Başûr wê bigihêjin heqên xwe. Kevir wê ji nû ve bi cih bibin. Kurd bi azadiya xwe xisarê nadin tu neteweyan. Li ser axa xwe ya hezar salan dewleta xwe ava dikin. Dewleta Kurdistanê wê bandoreke erênî li Rojhilata Navîn bike."

**"Miletê Kurd dev ji mafên xwe yên netewî bernade"**

Kıran di derbarê helwesta welatên cîran de wiha diaxive: "Gotineke pêşiyan heye dibêje, "Bêhntengî ji tengahiyê ye". Wek ku tê zanin,





perçeya herî mezin a Kurdistanê di bin hikûmraniya Tirkiyê de ye. Perçeyê dûyem ê mezin ê Kurdistanê jî di bin hikûmraniya Îranê de ye. Ev her du dewlet jî Serxwebûna Kurdan ji bo ewlekariya xwe weke 'talûke' dibînin. Tirsa wan a herî mezin ew e ku Kurdên hemwelatiyên wan doza mafên xwe yên netewî bikin. Bi nêrîna me ev tirs, tirsek bêfêde ye. Di sedsala bîst û yekan de mafên neteweyeke bi înkarkirinê ji holê ranabe. Miletê Kurd jî dev ji mafên xwe yên netewî bernade. Divê her du dewlet jî êdî demokratîze bibin. Mafên Kurdan ên sîyasî û demokratîk hemû nas bikin. Dev ji sîstemên yekgirtî (uniter) berdin. Bibin sîstemên federal û Kurd di sîstemên wan da xwe azad û wekhev bibînin. Sekna van dewletan li hember serxwebûna Herêma Kurdistanê nikare herika dîrokê bide sekinandin.

**"Serxwebûn ji bo hemû Kurdan wek evînê ye"**

Cîgirê Serokê Giştî yê Hak-Parê di derbarê bandora dewleta Kurdistanê li ser Kurdên perçeyên din û Kurdên li cîhanê belavbûyî de wiha pê de diçe: "Piştî ku Herêma Kurdistanê bibe dewleteke serbixwe wê bandoreke erênî li ser Kurdên perçeyên din û yên cîhanê bike. Serxwebûn ji bo hemû Kurdan wek evînê ye. Hêviya her Kurdekî dewleteke serbixwe ye. Ji bo tekoşîna Kurdên perçeyên din jî wê bibe mînak û sedema motivasyonê."

**"Divê hemû Kurd piştgiriyê bidin"**

Abdulmenaf Kıran li ser piştgiriya ji bo referandûmê jî wiha dibêje "Di vê hewldana azadîyê de divê hemû Kurd piştgiriyê bidin referandûmê. Bi daxuyanî û hemû çalakiyên demokratik piştgiriya xwe bînin ziman. Her Kurdek li gor derfetên xwe divê piştgiriyê bide. Hemû sazî û partiyên Kurdan ji bo piştgiriya referandûmê çalak bin. Bi dîtina min li gor derfetan piştgiriyeke gelek xurt di nav Kurdan da heye."

Eger di encama referandûmê de "erê" derkeve, wê miletê Kurd jî li Rojhilata Navîn bibe xwedî dewlet û wê beşeke Kurdistanê azad bibe. Neheqiyeke dîrokî jî wê hinekî ji holê rabe.

### "Em ê ji bo referandûmê civîn û çalakiyan pêk bînin"

Abdulmenaf Kıran di dawiya axaftina xwe de piştgiriya partiya xwe bo referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê dubare dike û axaftina xwe wiha bidawî dike: "Partiya me ji bo piştgiriya referandûmê tim çalak e. Em di hemû nivîs û daxuyaniyên xwe de piştgiriya xwe tînin ziman. Em ji bo piştgiriya xwe bi Kurdên Başûr bidin hîs kirin wek ku tê zanîn serokê partiya me Refik Karakoç û gelek rêvebirên partiyê, di 2yê Tîrmehê de serdana Başûr kirin. Biqasî heşt rojan li wir man. Piştgiriya Partiyê ji hikûmetê û hemû hevkarên referandûmê re diyar kirin. Di pêşerojê de jî wê daxuyaniyên me yên çapemeniyê ji bo piştgiriya referandûmê çêbibin. Em ê hinek civîn û çalakiyên din jî li darbixin. Em wek Partiya Maf û Azadiyan bi dil û can piştgiriyê didin referandûmê. Em serkeftinê ji bo serxwebûna Herêma Kurdistanê dixwazin."

Serokê PDK-T Mehmet Emin Kardaş:

# Kurd sedsalek din nikarin bêdewlet bimînin

MÎRA JÎN

Referandûma Herêma Kurdistanê ya ku dê 25 Îlonê dê pêk were di nav Kurdên her çar perçeya û Kurdên dinyayê de kelecanek mezin derxist holê. Bi diyarbûna roja referandûmê weke pêlên behrê piştgiriya bo referandûmê mezin bû. Ji aliyê din partî û aliyên ku neaktîf bûna parlementoya Herêma Kurdistanê dikirin hêncet li hember derdiketin. Li ser vê Lijneya Bilind ya Referandûmê biryar da ku parlemento ji nû ve bêaktîf kirin. Tê çaverêkirin ku li Herêma Kurdistanê 6 milyon dengdêr dengê xwe bo referandûma serxwebûnê bikar bîne. Ji aliyê din berdevkê Serokkomariya Tirkiye yê Îbrahim Kalın helwesta Tirkiye ya li hember referandûmê disa eşkere kir û di kanalek li Tirkiyeyê weşanê dike got, " Meseleya referandûmê dê ji bo yekparçebûna Îraqê gef be. Heger referandûm pêk were dê kî vê pesend bike? Divê Parlementoya Bexdadê jî vê pesend neke? Ji bo ev yek fermî bibe divê parlemento jî pesend bike." Her wiha Însiyatîfa Piştgiriya Referandûma Serxwebûna Kurdistanê ya ku ji partiyên Bakûrê Kurdistanê pêk tê, ji bo piştgiriya referandûmê li Tirkiye yê bidest bixe dê hin çalakî û konferansan pêk bînin. Hevpeyvînên Heftenameya Basê li gel partiyên Bakûr jî berdewam dike vê heftê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistan Tirkiye yê (PDK-T) Mehmet Emin Kardaş helwesta partiya xwe ya derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê vegot.

**''Em bi dil û can piştgiriya referandûmê dikin''**

Serokê PDK-T Mehmet Emin Kardaş derbarê helwesta partiya xwe bo referandûmê wiha axivî, ''Wexta Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di 7 Hezîranê de roja referandûma serxwebûna Kurdistanê diyar kir,ev biryar kelecanek mezin xist nav Kurdên herçar parçeyan. Ji ber ku ev roj roja ku Kurd bêhtir nêzî serxwebûnê bûyî û rojeke pir jî girîng e,ev biryar bi vî awayî hat nirxandin ji ber ku ev xewna ya hemû Kurda ye. Me wek Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkiye (PDK-T) diyar kiribû ku,biryara ku ji aliyê Serok Barzanî hatiye stendin ji dil û can piştgiriyê didin."



**''Serxwebûna Kurda dê li Rojhilata Navîn gelek tiştî bi erênî biguherîne''**

Kardaş got, ''Encama referandûma serxwebûnê her bi çi awayî be jî ev biryara miletê Kurd e divê her kes rêzê li vê biryarê bigre,ji ber ku ev biryarek meşrû û netewî ye û wiha berdewam kir ''Piştî ku encamê referandûmê ''Erê'' encam bide û îradeya xwe ya serxwebûnê nîşan bide divê kes li hember dernekeve. Hezar salan e ku milletekî nifûsa wê 50 milyon e û dewletek wan ya serbixwe tuneye,kansî daxwaza wan ya serxwebûnê tiştekî meşrû û xwezayî tuneye. Daxwaza bikar anîna vî mafî encama jiyana civakî û siyasî ya xwezayî ye. Tu millet weke Kurdan di bin siya dewletên din ji serxwebûnê bêpar ne jiyaye û ji bo dewletek serbixwe jî ewqas can feda nekirine. Ji ber wê milletekî wiha bêyî ku xwîn birije bi rêyê meşru dixwaze vî mafî bi dest bixe,tiştekî ku kansî vê daxwaza wan xwezayî jî tuneye. Heger Kurd serbixwe bibin dê li welatên cîran û li Rojhilata Navîn gelek tişt bi awayê erênî bigûhere.''

Mehmet Emin Kardaş derbarê helwesta cîranên Herêma Kurdistanê jî fikrên xwe wiha anî ziman, ''Pirsgirêkên Rêveberiya Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Navendî ya Îraqê li ber çava ye û Rêveberiya Navendî dixwaze midaxaleyî têkiliyê Rêveberiya Herêma Kurdistanê û cîranê wê bikin. Heger em van tiştan li ber çava bigrin (Bazirganiya di navbera Rêveberiya Herêma Kurdistanê û Tirkiye bo vê rewşê mînak e) îlan kirina Kurdistana serbixwe dê ji bo pirsgirêkên yê derve û hundir bo cîrana jî feydeyek mezin nîşan bide. Ji ber ku Kurd ne tenê li Îraqê li her sê welatên cîran jî nifûsa Kurda zêde ye û milletekî bi bandorê li ser polîtîkayên wan yê hundir jî dike. Heger cîranekî van welatan serbixwe bibe li wan welatan dê hin pêvajo bi awayekî rehet birêve biçe û polîtîkayên wan yê navxweyî û derve jî bandorek erênî lê bike."

Serokê PDK-T jî bo aliyên ku li hember referandûmê derdikevin got, '' Kes û aliyên hember serxwebûnê derdikevin yên ku ji çavkaniyên binerdên Kurdistanê û ji cîhê jeopolîtîk yê Kurdistanê nikarin feydeyê bibînin,li hember derdikevin û ditirsin ku li derveyî vê rewşê bimînin. Kes û aliyê li hember biryara referandûma serxwebûna Kurdistanê derdikevin vê yekê ji bîr dikin ku gelên Kurd hîn nasnekirin e."

Li şûna ku li hember referandûmê derdikevin bila piştgiriya ku referandûma encama wê ji niha ve diyar e bikin û divê li kêleka vê dewleta ku li vê erdnigariyê dê bibe xwedî gotin bisekinin. Li gor ku milleteke nikare heta dawiyê bi din hegemonyaya dewletekê de bijî, îlan kirina serxwebûnê jî dê bandorek erênî li welatên cîran bikin.

**''Ditirsin ku Kurdên li wî welatî dijîn doza serxwebûnê bikin''**

Serokê PDK-T derbarê biryara referandûmê jî wiha amaje kir, ''Kes û aliyê ku dibêjin biryara referandûmê biryarek zû ye, ditirsin ku Kurdên li wî welatî dijîn doza serxwebûnê bikin. Lê metirsiyê wan jî ne di cîh de ye ji ber ku herdu welat (Îran û Tirkiye) mafê mirovan yê bingehîn qedera tayîn kirin çarenûsê heger binasin, ew rewşa pêkve jiyana bi aşitî û aramiyê dê metirsiya parçebûnê ji holê rake.

Kardaş di dawiya axaftina xwe de wiha axivî, ''Dewleta ku wê li Başûr ava bibe helbet dê hemû Kurda bextewar bike. Ev li erdnîgariyek din jî be dê bandorek erênî li wan bike. Kurdê ku bizanibe li vê dinyê dewletek wan heye dê xwe bi qedr û qîmet his bike û dê wan ji bindestiyê xelas bike wan bigihêjînî aramiyê. Tiştekî ku ji vê rewşa, Kurdên ku li Rojhilata Navîn dijîn û xwedî nifûsek 50 milyonî ne, xwezayîtir tuneye ku bibin xwedî dewlet. Ev mafê wan yê rewa ye. Kurd bikar anîna vî mafî, mafê ti kesî binpê nake."



Ciwanên Netewî yên Kurdistanê:

# Em ji bo pêkanîna xeyala sedsalî dimeşin

NÛJÎN ONEN

Ciwanên Netewî yên Kurdistanê (CNK) ji bo piştgiriya referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê ku dê 25ê Îlona 2017an de pêk were di 11ê Îlonê de ji deriyê sînorî yê Xabûrê ber bi Hewlêra paytexta Kurdistanê ve bimeşin. Ciwanên Kurd du roj beriya referandûmê, 23ê Îlonê wê li ber Parlamentoya Kurdistanê daxuyaniyekê bidin.

Herêma Kurdistanê ji bo pêkanîna referandûmê amadekariyên xwe didomîne. Ji aliyê din çalakiyên ji bo piştgiriya referandûmê li Kurdistan, herêm û cîhanê zêde dibin. Tayber jî bajarên Kurdan çalakiyên palpiştî bo referandûmê berdewam dikin. Ciwanên Netewî yên Kurdistanê(CNK) biryar wergirtin ku ji bo referandûma serxwebûna Kurdistanê ji Bakûr ber bi Hewlêra paytext ve bimeşin. Endamên Ciwanên Netewî yên Kurdistanê ji Heftenameya Basê re axivîn û destnîşan kirin ku dê 11ê Îlonê de dest bi meşê bikin. Meş dê ji Şirnexê destpê bike û li Hewlêrê bidawî bibe.

**"Ev ne çalakî ye kompanya ye!"**

Berdevkê Ciwanên Netewî yên Kurdistanê Jiyan Tîmûrtaş dibêje, "Em ne piştgirên vê referandûmê, lê raste rast xebatkarên vê proseyê ne" û axaftina xwe wiha didomîne: " Em weke Ciwanên Netewî yên Kurdistanê biryara referandûmê bi erênî dinirxînin û em ê li her qadê jî piştgiriya vê proseyê bikin. Em ciwanên Kurd amade ne berpirsyariya xwe bicih bînin. Mafê her miletî heye çarenivîsa xwe bi destê xwe diyar bike. Ev maf, mafê Kurdan ê rewa ye. Em gel û hikûmeta xwe pîroz dikin ji ber vê biryara dîrokî."

**"Ji hemû aliyan piştgirî bidin kompanyayê heye"**

Tîmûrtaş di dirêjiya axaftina xwe de dibêje, "Dê çalakiya me di 11ê Îlonê li deriyê sînorî yê Xabûrê destpê bike û em ê sînoran bi meşê derbas bikin. Em ciwan, em ê starta meşê bidin. Car caran dê siyasetmedar û hunermendên navdar ên herêmê jî tevlî meşê bibin. Ev ji çalakiyekî bêtir kompanyaya piştgiriya referandûmê ye. Dema em lê dinêrin Katalan her roj meş û kompanyayan lidar dixin. Lê mixabin heta niha li herêma me ji bo piştgiriya referandûmê çalakiyek wiha ne hatiye pêk nehatiye."

**Armanca meşê bo piştgiriya serxwebûna herêma Kurdistanê ye**

Yek ji damezrêner û endamê Ciwanên Netewî yên Kurdistanê Ahmet Kinay jî dibêje, "armanca meşê piştgiriya ji bo referandûm û serxwebûna Kurdistanê ye. Ji bo piştgiriya wê doza ku bi serpereştiya Serok Barzanî didome û biryara pêkanîna referandûmê li Herêma Kurdistanê em weke ciwanên Kurd yên beşên din, çalakî û kompanyayan lidar dixin. Armanca vê meşa me jî ji bo piştgiriya biryara gelê Kurdistanê ye. Hêviya 500 salî yê gelê Kurd piştî çend mehê din dê vejîn bide. Em jî weke ciwanên Kurd bi meş û çalakiyên xwe piştgiriya xeyala sedsalî dikin. Em li benda tevlîbûna gelê Kurd bo vê kompanyayê ne. Tevlîbûna gel çiqas xurt be dê tesîr jî ewqas mezin be."

Li aliyê din siyasetmedarên Kurd jî piştgiriya xwe ji bo ciwanên Kurdan nîşan dan. Siyasetmedar Sertaç Bucak li ser hesabê xwe yê medya civakî çend parvekirinan kir û piştgiriya xwe nîşan da. Bucak dibêje: "Ciwan, dê ji bo piştgiriya referandûmê bimeşin. Em ê jî piştgiriya van ciwanan bikin."



## Berevan Hemdî:

# Serxwebûn wê rê li ber jenosîdên nû bigire

MURAT ÖZDEMİR

Rêveberê Giştî yê Wezareta Şehîd û Enfalkiriyan Berevan Hemdî li ser jenosîda Enfala Barzaniyan bersiva pirsên Heftenameya Basê da. Berevan Hemdî dibêje rabirdûya Kurdan bi jenosîdan derbas bûye û dewletbûna Kurdan wê rê li ber jenosîdên nû bigire.

**Jenosîda Enfala Barzaniyan kengî û çawa dest pê kir?**

Jenosîda Enfala Barzan 1983 dest pê kir. Li devera Barzan ji temenê 11 salî heta 70 salî hemû hatin vegûhastin û piştî wê hatin qetilkirin. Beşek li başûrê Iraqê hatin dîtin. Çarenivîsa beşeke mezin hê jî ne diyar e. Hemû hatin jenosîdkirin.

**Jenosîd ji çend qonaxan pêk dihat?**

Jenosîd bi Kurdên feylî des pê kir paşê bi jenosîdkirina Barzaniyan, li Germiyan, li devera Bahdînan berdewam kir. 1988an bombebarana kimyewî li Helebçe pêk hat. Piştî ku 1988an hikûmeta Iraqê wextê ew komkujî pêk hat, pişt re jî heman komkujî bi serê Kurdên Êzidî hat. Jenosîda li dijî xelkê Kurdistanê li dawiya 70'i piştî 75an destpêk û dawiya salên 80î piştî wê jî di salên 2000î de jî ev komkujî berdewam in.

**Hejmara şehîdên Enfalê?**

Ew deverên ku Enfal lê hatiye encamdan, zêdetirî 8 hezar Barzanî ne, 12 hezar Kurdên Feylî ne, 180 hezar biçûk, jin û zarok û pîr ên salên 1988an û herî dawîn niha jî zêdetirî 4 hezar Kurdên Êzidî hatine qetilkirin.

**Ji bo ev komkûjî di qada navdewletî de jî weke jenosîd were naskirin, çi kar hatine kirin?**

Du şêwaz hene. Jenosîda beriya niha ya 1988an jenosîda Barzaniyan, bomberana Helebçê, jenosîda feyliyan ji bo vekolana van jenosîdan di 2003-2005an de Dadageheke Bilind hat damezirandin. Di 2007-2008an de piştî lêkolînan, vê Dadgeha Bilind biryara xwe da ku Enfalê weke jenosîd nas bike û weke tawana şer binav kir û qebûl kir. Herêma Kurdistanê ji ber ku ne serbixwe ye û hê jî bi ser Iraqê ve ye, ji bo ku di qada navdewletî de jî ev bê naskirin û xebat bên kirin barê giran dikeve ser milên Iraqê. Iraq endamê Netewên Yekgirtî ye û ew di vê bareyê de berbirsyar e. Lê belê Hikûmeta Herêma Kurdistanê her di hewl û xebatan de bû. Niha jenosîda Enfalê ji aliyê gelek dewlet, parlemento, sazî û rêxistinên navdewletî ve weke jenosîd hatiye qebûlkirin. Hikûmeta navendî ya Iraqê heta niha peywîra xwe di vî warî de jî bicih neaniye.

Hikûmeta Kurdistanê ji bo ku komkujiya li dijî Kurdên Êzidî qewimî jî weke jenosîd were nas kirin kar, xebat û hewlên xwe berdewam dike. Bi rêka welatên endam di Netewên Yekgirtî de, bi riya Laheyê kar li ser dike ku ji bo jenosîdên bi serê Kurdan hatine dadgehên taybet werin avakirin û jenosîda dawîn a bi serê Kurdên me yên Êzidî û yên beriya wê bi zelalî werin vekolan û weke jenosîd bên naskirin. Hikûmeta Kurdistanê zext û gûvaşên xwe yên li ser Iraqê jî zêde dike ku pêngavan di vî warî de bavêje. Lê belê heta niha encameke baş derneketiye û Iraq barê dikeve ser milên wê bicih nayîne.

**Çi kar û xebat ji bo kesûkarên enfalkiriyan hatine kirin?**

Hikûmeta Herêma Kurdistanê taybet ji bo ku bi vê mijarê re mijûl bibe Wezaretek ava kiriye bi navê Wezareta Şehîdên Enfalkiriyan û herwiha bi hejmara 9an yasayek jî hatiye pêkanîn ji bo kesûkarên malbatên şehîdan. Niha mehane mûçe ji bo malbatên şehîdan tên dayîn, di warên tendûristî, perwerde, civakî û hemû warên din de kar û xebat tên kirin û pêwîstiyên wan tên dabînkirin. Lêbelê di vê mijarê de jî Iraqê karê xwe nekiriye.



Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi hemû sazî û dezgehên xwe di xizmeta malbatên şehîdan de ye, lê belê ji bo jinavçûna hin tiştan pêwîstî bi demê heye. Di aliyê aborî, civakî, tendûristiyê de her kar tê kirin. Lê belê rewşa kesûkarên şehîdan di warê tendûristî, civakî û di warên din de xirab e.

### Rewşa kesûkarên şehîdên enfalê çawa ye?

Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi hemû sazî û dezgehên xwe di xizmeta malbatên şehîdan de ye, lê belê ji bo jinavçûna hin tiştan pêwîstî bi demê heye. Di aliyê aborî, civakî, tendûristiyê de her kar tê kirin. Lê belê rewşa kesûkarên şehîdan di warê tendûristî, civakî û di warên din de xirab e. Ji ber ku kar û xebat berdewam bikin jî heta niha çarenivîsa bi hezaran kesan ne diyar e û nehatine dîtin. Ev rewş zehmet e û dem lazim e ku rewşa wan baştir bibe. Jinavbirina birînên van jenosîdan ne hêsan e. Tişta ku ji destê hikûmeta me, wezareta me bê tê kirin.

### Proseya referandûm û serxwebûna Kurdistanê...

Rabirdûya Kurdistanê û xelkê Kurdistanê bi jenosîdan tijî ye. Ev hemû encamên bêdewletiyê bûn. Niha Kurdistan ber bi referandûmê ve diçe û piştî referandûmê dema ku di encama qonaxekê de Kurdistanê serxwebûna xwe bi dest xist ji bo zelalkirina van jenosîdan ji bo naskirina van jenosîdên bi serê Kurdan û xelkên Kurdistanê yên ayînî û etnîkî hatî wê destê wê bihêz be û ne mecbûr e girêdayî tu hikûmetan bimîne. Serxwebûn wê parastinê, ewlehiyê, aramiyê bi xwe re bîne ji bo zelalkirin û eşkerekirina jenosîdên bi ser Kurdan hatine jî wê dewletbûn naskirina van jenosîdan bi xwe re bîne. Herwiha dewletbûn wê rê li ber jenosîdan bigire û wê Kurdistanî di nava ewlekariyê de bijîn û rastî jenosîdan nayên.

---

## ‘Jenosîda Barzaniyan’:

# Mirovahî bi zindî binax kirin

DARA PORXELEK

Destpêka komkûjiya Enfalê di belgeyên fermî de 1986 be jî di rastiyê de destpêk di sala 1983an de bi qetilkirina 8 hezar Barzaniyan dest pê dike. 8 Hezar Barzaniyên ku temenê wan di navbera 10–70 salî de bûn, li malên xwe hatin girtin û ji aliyê leşkerên Baasê ve li çolên Başûrê Iraqê bi zindî hatin binaxkirin. Ev jenosîd navê xwe ji sûreya Qurana Pîroz a bi navê ‘Enfal’ digire ku wateya wê parvekirinên di dema şer de ne. Her çiqas ev weke ‘Operasyon’ hatibe binavkirin jî biryara Sedam Husên ew bû ku di serî de Barzaniyan, hemû Kurdan jenosîd bike. Jenosîda di sala 1983an de bi qetilkirina 8 hezar Barzaniyan dest pê kir, bi bikaranîna kimyasalê cara yekem li Deşta Balîsanê berdewam kir. Li Balîsanê nayê zanîn bê çend kes hatine kuştin. Êrîş li Sergelî û Bergelî, Şanexşê, Helepçe, Karadağ, Germiyan û Gundê Ekserê berdewam kir. Qetlîama Enfalê piştî Holokosta di sedsala 20an de jenosîda ku li dijî Cihûyan pêk hat û vir ve ya herî mezin e. Di vê qetlîamê de piraniya wan Kurd 185 hezar Kurdistanî hatin qetilkirin. Di vê çarçoveyê de Pisborê Karên Civakî û Nivîskar Abdulazîz Muhsen Barzanî ku malbata wî jî hatiye enfalkirin ji Heftenameya Basê re Jenosîda Enfalê û Barzaniyan vegot.

**“Ne qetlîam e, Jenosîd e!”**

Abdulazîz Muhsen Barzanî, bikaranîna ‘Qetlîama Enfalê’ xelet dibîne û dibêje “Ev Jenosîd e”. Muhsen Barzanî dibêje: “Dema hûn dibêjin Qetlîma Enfalê hûn qala qetilkirina jin, zarok û zilaman dikin. Lê di Jenosîda Barzaniyan de ev yek nebû. Piştî Şoreşa Îlonê yên dikaribûn ber bi Îranê ve biçin filitîn. Yên mayî jî ku nikarîbûn derbasî Îran û Tirkiyeyê bibin ji aliyê birayê Sedam ve ji malên xwe hatin girtin û ber bi çolan ve birin. Zilamên Barzaniyan li herêmê qet nemabûn. Di sala 1983an de zilamên Barzaniyan ku ji 9 salî ta 90 salî, hatin girtin û li çolan bi zindî hatin qetilkirin. Ji ber ku armanc tunekirina zilamên Barzaniyan bû, da ku careke din zarokên Barzaniyan çênebin, ev yek jenosîd e ne qetlîam e.”

**“Bila dîrok pakrewaniya jinên Barzaniyan tomar bike”**

Muhsen Barzanî diyar dike ku piştî Jenosîda Barzaniyan li herêmê tenê jinên Barzaniyan mabûn û axaftina xwe wiha didomîne: “Li Herêma Barzanê tenê jin mabûn. Karebeyê qut kiribûn, ambargoya xwarinê danîn ser herêmê. Belkî tenê kaniyeke avê hebe li wir ew jî hatibû jehrîkirin. Xelkên Hewlêrê bi dizî alîkarî digihandin herêmê. Jinên Barzaniyan li wir pakrewaniyeke bêhempa nîşan dan. Zarokên xwe perwerde kirin, di kar û barên giran de xebitîn. Di demeke dirêj de li Herêma Barzanê zarok çênebûn. Ji ber ku zilamên Barzaniyan hatibûn jenosîdkirin heta salên 91–92an zewac çênebûn. Divê dîrok xwedîderketina jinên Barzaniyan û tekoşîna wan a birdozî binivîse. Ez bangî lêkolîner û dîroknasên cîhanê dikim bila werin Kurdistanê û bila bibînin bê ka jinên Barzaniyan piştî vê jenosîdê çawa xwe spartine jiyanê û tekoşîna xwe li hember jiyanê domandine. Ka bê çawa zarokên xwe perwerde kirine û tevlî tekoşîna azadiyê kirine, bibînin û bigihînin hemû cîhanê.”

**“Ji ber ku em Kurd in em di jenosîdan re derbas kirin”**

Muhsen Barzanî axaftina xwe wiha didomîne: “Ji ber ku em Kurd û Kurdistanî ne ji aliyê Erebên Şovenîst ve di sala 1983an de di Jenosîdê re, di salên 1986–1989an de jî di Qetlîama Enfalê re hatin derbas kirin.” Mehsun Barzanî axaftina xwe wiha didomîne: “Me ji bo dewleta serbixwe ya Kurdistanê şehîd dan û em ê ji bo dewleta Kurdistanê şehîd bidin jî. Jenosîda Enfalê, ya Mihelmiyan, ya Helepçe û Şingal a di sala 2014an de ji ber em Kurd û Kurdistanî bûn hatin serê me. Bila baş bê zanîn ku em ê heta dewleta Kurdistanê ava bikin doza xwe bidomînin.”

**“Tekane dermanê jenosîdê serxwebûn e”**

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di merasîma bîranîna şehîdên Enfalê yên Barzaniyan de axivî. Serok Barzanî di merasîma bîranîna jenosîda Barzaniyan de ragihand: “Tekane dermanê wan birînên kûr ên di dilê me de û dermanê kîmyabaran û enfal û birîna birayên me yên Kurdên Êzidî, tenê çûna ber bi serxwebûna Kurdistanê û rizgariyê ve ye.” Barzanî di berdewamiya gotara xwe de got: “Me riyên din ceribandin lê bi kêr nehatin. Ez ji we daxwaz dikim ku hûn Jenosîda Barzaniyan, Enfala 1988an, trajediyên ji Zaxo ta Xaneqînê bi ser me de hatine jibîr nekin û yekrêziyan ava bikin.”



Ev jenosîd navê xwe ji sûreya Qurana Pîroz a bi navê ‘Enfal’ digire ku wateya wê parvekirinên di dema şer de ne. Her çiqas ev weke ‘Operasyon’ hatibe binavkirin jî biryara Sedam Husên ew bû ku di serî de Barzaniyan, hemû Kurdan jenosîd bike.


### Parlementoya Iraqê di sala 2017an de weke ‘Jenosîd’ pesend kir

Parlementoya Iraqê piştî salên dûr û dirêj Enfala ku di sala 1983an de dest pê kir û heta 1989an berdewam kir, weke ‘Jenosîd’ pesend kir. Dê Bexda ji nasên Enfalkiriyan lêborînê bixwaze. Di heman demê de dê Enfal bikeve pirtûkên dersên dibistanê jî. Dê Parlementoya Iraqê ji bo pênasekirina Enfalê weke ‘Jenosîd’ li cîhanê dokumantên di destê xwe de wergerîne zimanên din. Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo ku Enfal weke jenosîdê bê nasîn li YE û NYyê dest bi xebatan kiribû. Di encama van xebatan de, Swêd piştî Îraqê welatê yekem e ku Enfal weke jenosîd pesend kir. Herwiha parlementoya Brîtanya û Norweyê jî weke ‘Jenosîd’ nas kirine.

### Bi daneyan Jenosîda Enfalê

Di sala 1983an de 8 hezar zilamên Barzaniyan li çolan hatin qetilkirin. Jinên Barzaniyan bi darê zorê li Mûsil û Hewlêrê hatin bicih kirin. Di navbera salên 1986-1989an de piraniya wan Kurd, 185 hezar Kurdistanî bi kimyabaranê hatin qetilkirin. Li Herêma Kurdistanê ji 4 hezar û 665 gundan 4 hezar gund hatin rûxandin. Hezar û 800 dibistan, 300 nexweşxane, 3 hezar mizgeft û 27 dêr hatin şewitandin. Bi giştî li Kurdistanê ji %90 gundan hatin şewitandin an jî rûxandin.

---



MURAD CIWAN

## Kuştina Husên Canpolatê mîrê kilîsê

**‘Ferman e, ferman e, fermana mîrên kurdan e!’**

Husên Canpolat li ser esasê irsî mîrê Kilîsê û ji ber tayînkirina ji paytextê, begêbeganê eyaleta Helebê bû. Loma hem mîr hem jî paşa bû.

Şerefname eslê Canpolatan digihîne Menteşayê (Mendê) Hekkarî ku gihîştibû Eyyubiyan, bûbû mîrêmîranê kurdên navbera Helebê, Antaqyayê û Şamê, ji Meraşê heta Hemayê dever hemî xistibûn destê xwe.

Di dema osmaniyan de Yavuz Sultan Selîm desthilata deverê da Şêx Îzzedînê mîrê êzdiyan, Qasim Begê ji nesla Mend û kurê wî Canpolat bir paytextê, ji bo pûçkirina hevrikiya li deverê Qasim Beg da kuştin û Canbolat di qesra Sultan de perwerde bû, postên hêja girtin.

Di dema Qanûnî de, Canpolat derket pêş, di girtina Belgradê, Rodosê û Boxdanê de qehremanî nîşan dan. Sultan Kilîsa bavûkalan lê vegerand û ew hat bû mîrê Kilîsê.

Husên Beg kurê Canolat bû, ku Canpolat mir, piştî du birayên xwe ew bû mîr.

Husên Canpolat di seferên ser Îranê de xizmetên hêja kirin ew bû begêbeganê Helebê, pişt re Heleb jê hat stendin ew wek mîrê Kilîsê ma.

Di 1012 (1603-1604)an de gava Nasuh Paşayê osmanî bû begêbeganê Helebê, yeniçeriyên Şamê êrîş bir ser Helebê, Nasuh Paşa ket tengasiye, alîkarî ji Husên Paşa xwest. Wî jî biraziyê xwe Alî Beg bi leşkerekî xurt şand hawara Nasuh Paşa û yeniçerî şikiyan.

Lê Nasuh Paşayê osmanî vê hêza mezin a Canpolatan xeter dît û êrîş bir ser Kilîsê.

Dostê Husên Paşa; Çaxalazade Sînan Paşayê esil îtalî ku wextekê tevî bavê xwe hatibû êsîrkirin, bûbû misilman û gelek post wergirtibûn, bûbû serdarê orduyên Anadoluyê û Kurdistanê; hem ji bo têkşikandina Celaliyan li Anadoluyê, hem jî ji bo sefereka ser îraniyan ku Tebrîz û Rewan ji destê osmaniyan derxistibûn derketibû seferê.

Serdar ferman şand ji Nasuh Paşa re ku ji sefera ser Kilîsê vegere û dev ji begêbegantiya Helebê berde, wî meqamî teslîmî Husên Canpolat bike. Nasuh Paşa her çendî îtîraz kir jî mecbûr ma Helebê ji Husên Paşa re bihêle.

Şah Abbas sefer anîbû ser osmaniyan , ku wan erdên bi Peymana Amasyayê ya 1590î; Azerbaycanê, Gurcistanê, Ermenistanê û Şêrwanê paş de bistîne,Tebrîz û Rewan zeft kiribûn. Li ser vê, Sînan Paşa li deşta Mûşê 40 hezar esker kom kiribû û ferman şandibû ji eskerên Anadoluyê, Kurdistanê û Bîladê Şamê re da li Mûşê bicivin.

Husên Canpolat çend yekîne di pêşiyê de verêkirin û bi xwe jî bi orduyeka 30 hezar eskeran derket ser rê. Berî ku Canpolat bigihê orduya osmanî, Çaxalazade li hember Şah Abbas şikesteke mezin xwar. Ji osmaniyan gelek esker hatin kuştin û girtin, yên mayî jî bêserûber paşde reviyan. Sînan Paşa bi xwe çek, xezîne, mal û milkên xwe bicî hiştibûn û bazdabû.

Wî di vê seferê de xetayên mezin kiribûn. Nîvê zivistanê derketibû seferê, yeniçeriyan serî hilda, mecbûr ma, dev ji seferê berda, vekişiya Wanê, tevî ku Wan nêzî serhedan bû li wir ket vehêsana zivistanê. Şah Abbas bêyî hayê wî ew ji nêzîk ve şopand, hat dor li Kela Wanê girt. Sînan Paşa reviya alî Erziromê . Orduya Şah jî vegeriya Tebrîzê.

Îcar Sînan Paşa esker xist pey orduya Şah Abbas, li derûdora Urmiyê şerekî dijwar derket. Ji ber şaşîtiyên eskerî, orduya Caxala şikesteka mezin xwar.

Mîrên kurdan ji rewşê nerazî bûn, wan xwest ew Sînan Paşa bibînin, lê xulaman nehişt. Ji vê, mîrên kurdan ketin gumanê ku ew cardin reviyaye. Ew jî tevî eskerên xwe ji şer vekişiyan. Roja din derket ku Sînan Paşa nereviyaye.

Li devera Taslucayê nêzî Urmiyê mîrên kurda rastî Husên Canpolat hatin, gotin muhtemelen Sînan Paşa reviyaye. Mîr Husên jî li ser vê li Taslucayê eskerên osmanî ên ku ji şer bêserûber direviyan li hev civandin û bi vekişiyaneka rêkûpêk a kêmtelefîn ew anîn gihandin Wanê. Husên Paşa çû ba Sînan Paşa.

Hezîmetê dinya Sînan Paşa hilweşandibû, hemû hêviyên paşeroja wî têkçûbun. Êdî li paytextê tu cih û war jê re nemabû. Wî, şerefa xwe jî tê de, her tişt wenda kiribûn. Gava têgihîşt ku 30 hezar esker bi Husên Canpolat Paşa re hene, ew hêrs û har bû, şûr derxist, serê Husên Paşa firand. Her tişt ji nişka ve bêyî hêvî û texmîneka tu kesî ev bûbû. Her kes matmayî ma, kurd şok bûn û orduya Canpolatan bêserî berê xwe da Helebê.

Gava xebera kuştina Husên Canpolat hat, Alî Begê birazê û wekîlê wî serî hilda, ku heta nêzî cudabûnê çû, seranserê Bîladê Şamê, Misir û Erebistanê ji bo osmaniyan xist bin xeterê.

Sînan Paşa bi hezîmetê, serîtewandî çû Diyarbekirê. Li wir ji kerban mir.

Encam bi serîhildana Canpolatan nema. Mîrên kurda zerarên mezin dîtin, axa wan bi pêlên çûnûhatê ên şeran talan bûn. Ew bi acizî û xemgînî ji serdarê osmanî dûr ketin.

Serhed, hema hema heta Wanê ket bin siya şûrê Şah Abbas. Li gor Îskender Begê Munşî, Mustefa Begê Mehmûdî , hakimê Kela Xoşabê Mehmûd Begê kurê Silêman Begê Mehmûdî, Emir Xanê Biradostî (yê ku pişt re bû lehengê serîhildana Kela Dimdimê), Zekeriya Xanê mîrê Hekkariyan û Hesen Begê mîrê Elbakê (Başkelê) hemî çûn dîwana Şah Abbas û hukmê wî qebûl kirin.

# Di berbanga sexwebûnê de temsîleke hevbeş a siyasî pêwîst û lezgin e - II



ZINAR SORAN

II) Referandûma serxwebûna Kurdistanê gaveke dîrokî ye

Tevgera rizgarîxwaziya neteweyî ya Kurdistanê di gelek waran de, di rewşeke gelek taybet, dijwar û metirsiyeke mezin re derbas dibe. Îro li seranserê Kurdistanê plan, lîstik û êrîşên piralî û hovane ji aliyê dagirkerên Kurdistanê û hevalbendên wan ve pêk tên. Di van plan û hevkariyên dewletên kolonyalîst de, rola dewleta Îran û Tirkiyeyê xwediyê cihekî taybet û piralî ye. Divê bi taybetî li ser van plan û hedefên dewleta Îran, Tirkiye û hevalbendên wan bê rawestan, armanc û hedefên wan yên rastî bêtir bên eşkere kirin.

Bi awayekî giştî, xetere û metirsiya li ser Kurdistanê û bi taybetî metirsiya li ser Başûr û Rojavayê Kurdistanê berdewam dike. Divê hemû hêz, partî, rêxistin û dezgehên Kurdistanê û gelê Kurd ji bona parastina destkeftiyên Herêma Kurdistanê û berlêgirtina ji nû ve dagirkirina Başûrê Rojavayê Kurdistanê bi berpirsiyarî tevbigerin; bi hemû hêz û îmkanên xwe nehêlin ev êrîş û armancên dewletên kolonyalîst û hevalbendên wan serbikevin. Bi awayekî giştî, pêwendiyên hinek rêxistinên bi dewletên kolonyalîst û bi taybetî siyaseta PKKê ya yekrengî, yekdengî, req, bêtolerans û lidijderketina dewleta Kurdistanê, ku bi rewş û siyaseta neteweyî û Kurdistanî nelihevkirî, bêtir keys û fersendê dide dewletên kolonyalîst ku êrîş û planên xwe yên li ser Kurdistanê berfirehtir û geştir bikin. Divê îro ji her demê bêtir partî, rêxistin û gelê Kurdistanê li gel bîr û baweriyên xwe yên cihê, di bin Ala Kurdistanê û bi siyaseteke hevbeş a neteweyî û Kurdistanî, mafê serxwebûna Kurdistanê derxînin pêş.

Di jiyana her miletî de demên dîrokî hene ku divê mirov li gor pêwîstiyên wan tevbigere. Miletê Kurd yek ji miletê kevnare yê Rojhilata Navîn e ku weke her miletî mafê wî jî heye ku qedera xwe bi destê xwe tayin bike û dewleta xwe ya serbixwe ava bike. Rewşa cîhanê, Rojhilata Navîn û Kurdistanê ya îro, ji her demê bêtir lihevhatî ye ku li Herêma Kurdistanê miletê me, bi awayekî azad û demokratîk qedera xwe bi destên xwe tayin bike û serxwebûna xwe îlan bike.

Wek tê zanîn, Serokê Herêma Kurdistanê Birêz Mesûd Berzanî, di 7ê Hezîrana 2017an de, bi partî û rêxistinên sîyasî yên Kurdistanê re civînek çêkir û di vê civînê de biryareke dîrokî; biryara referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê girt. Referandûma serxwebûna Kurdistanê wê di 25ê îlona 2017an de pêk bê. Biryara referandûmê, biryareke rewa, mafekî xwezayî û di cih de ye.

II. Biryara Sexwebûna Kurdistanê, li gor Deklarasyona Yekitiya Neteweyan jî meşrû ye

Biryara serxwebûna Kurdistanê, di heman demê de li gor xala duyem ya "Deklarasyona Neteweyên Yekbûyî " ya 1960an jî biryareke rewa û meşrû ye. Xala duyem ya vê deklarasyonê bi awayekî zelal diyar dike ku "mafê hemû miletan heye ku qedera xwe bi destê xwe tayin bike; li gor wî mafî, bi awayekî azad statuya xwe ya siyasî destnîşan bike û bi awayekî azad pêşketina aborî, civakî û çandî taqîb bike."

Di xala 5an ya vê deklarsyonê û di "hiqûqa navnetewî" de jî hatiye diyar kirin ku "welatên bindest û ne desthilatdar an jî hemû welatên ku serxwebûna xwe bi dest nexistine, ji bo ku bikaribin mafên xwe yên serxwebûneke rasteqîn û azadiyê bikarbînin, li gor daxwaz û îradeya wan a azad, bêyî ku di warê edet, bawerî an jî rengê wan de cihêtîyekê bixînin nav wan, hemû desthilatdarî bê qeyd û şert teslîmî gelên wan welatan bibin, wê tedbîrên lezgîn bêne girtin".

Eger Yekitîya Neteweyan li gorî van xalên Deklerasyona 1960an tevbigere, divê biryara "serxwebûna Kurdistanê" bi awayekî fermî meşrû bibîne û herweha ji bo gelê Kurdistanê, li Herêma Kurdistanê bi awayekî aştî û demokratîk îradeya xwe ya azad diyar bike, bi lezginî hemû tedbîrên pêwîst bistîne!

Kurdistan ji alîyê dewletên dagirker û emperyalîstan ve, bêyî îradaya miletê Kurd û Kurdistaniyan hatiye dagirkirin û perçekirin. Miletê Kurd ji bo serastkirina vê neheqiya dîrokî û weke her miletî, li ser axa bav û bapîrên xwe bi awayekî serbest û azad bijî, li hemberî dagirker, emperyalîst û kolonyalîstan gelek caran serî hildaye, têkoşîn û berxwedaneke dûr û dirêj daye; îro jî ev xebat, têkoşîn û berxwedan li her çar perçeyên Kurdistanê berdewam dike.

Miletê Kurd, miletekî aştîxwaz e; welatê miletekî din dagir nekiriye, miletekî din bi darê zorê nexistiye bin desthilatdariya xwe; ew tenê mafên xwe yên neteweyî, demokratîk û însanî dixwaze; ew tenê dixwaze wek her miletî li ser axa xwe bi awayekî serbest û azad bijî. Lê miletê Kurd û gelên li Kurdistanê dijîn, bi dehan caran ji alîyê dewletên dagîrker ve hatine qirkirin û sirgûn kirin. Herî dawî Kurdên Ezîdî, li Herêma Kurdistanê bi jenosîda DAIŞê re rûbirû man û bi hezaran jin û keçên Kurdên Ezîdî dîl hatin girtin.

Heta miletê Kurd jî qedera xwe bi destê xwe tayin neke û nebe xwediyê dewleteke serbixwe, demokratîk û azad; mixabin tu garantî tune ku ev sirgûn, enfal, neheqî û qetlîamên ku hatine serê miletê Kurd û Kurdîstaniyan, dubare û sêbare nebin. Di van şert û mercan de, tenê serxwebûn û dewlata Kurdistanê dikare miletê Kurd û Kurdîstaniyan ji jenosîd, qetlîam û enfalên wiha biparêze. Serxwebûna Kurdistanê, wê ji bo pêşeroja jiyaneke hevbeş a netewe, kêmnetewe, ol û bawerîyên cûda jî bibe bingeh û derfeteke girîng.

> Miletê Kurd, miletekî aştîxwaz e; welatê miletekî din dagir nekiriye, miletekî din bi darê zorê nexistiye bin desthilatdariya xwe; ew tenê mafên xwe yên neteweyî, demokratîk û însanî dixwaze; ew tenê dixwaze wek her miletî li ser axa xwe bi awayekî serbest û azad bijî.

Pirsgirêka Kurdistanê, êdî ne tenê pirsa miletê Kurd û Kurdîstaniyan e; di heman demê de ew, pirsa navçeya Rojhilata Navîn, dewletên Ewropayî û heta radeyekê ya cîhanê ye jî. Heta ev pirsgirêk bi awayekî dadwerî û rewa neyê çareser kirin; wê li heremê pirsgirêk, şer û tevlihevî her berdewam bikin; wê aramî, azadî û demokrasiyeke rastîn neyê heremê; wê encamên şer û aloziyên herêmê tîn û tesîreke mezin li ser civat û dewletên Ewrpoyê bikin; wê li heremê berberî û şerên wesayetî yên dewletên emperyalîst û mezin bidomin û ev jî wê tesîrê li civata wan welatan jî bike.

Bi awayekî giştî, di vê xebat, têkoşîn û hewldana pêvajoya serxebûna Kurdistanê de û bi taybetî ji bo beşdarîyeke berfireh, demokratîk û bi aştî, pêknanîna referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê, gelek girîng e ku di serî de hemû hêz, partî, rêxistinên siyasî, civakî û olî, siyasetmedar û rewşenbîrên Herêma Kurdistanê bi siyaset û helwesteke hevbeş, hemaheng, neteweyî û Kurdistanî li dora Serokê Herêma Kurdistanê Birêz Mesûd Barzanî bicivin; piştgiriya referandûma Serxwebûna Herêma Kurdistanê bikin; gelê Kurd ji bo referandûmeke azad û demokratîk amade bikin; xebat, têkoşîn û hewldanên ji bo pêvajoya serxwebûna Herêma Kurdistanê geştir bikin.

Herwiha divê hemû hêz, rêxistin, partî û kesên weletparêz ên beşên din ên Kurdistanê jî bê hesabên biçûk, bi her awayî alîkarî û piştgiriya vê referandûmê û pêvajoya serxwebûna Herêma Kurdistanê bikin. Ev referandûm, ne ya partiyekê û ne jî ya kesekî ye, ev mafekî meşrû û demokratîk yê miletê Kurd e. Ev gava pêşî ya sererastkirina neheqiya dîrokî ye.

Bi qasî ku tê dîtin, dewletên ku bi awayekî eşkere û tundî li dijî vê referandûmê derdikevin, di serî de dewleta Îran û Tirkiye, dewletên kolonyalîst in ku Kurdîstan di nav wan de hatiye dabeşkirin. Lê mixabin, em dibînin ku hinek hêz, partî û kesên Kurd jî li dijî daxwaza referandûm û avakirina dewleteke serbixwe ya Kurdistanê ne. Li gor wan "dewlet ji bo Ereban, Îraniyan û Tirkan ku Kurdistan di nav xwe de parve kirine û bi hêza dewletên xwe Kurdistan weke kolonî di bin destên xwe de digirin edet e, lê ji bo Kurdan qebehet e!" Bêgûman kesên vê yekê diparêzin dibe ku Kurd bin, lê ne xwediyê siyaseteke Kurdistanî ne. Kîjan dewlet, kîjan rêxistin û kîjan kes dibin bila bibin, yên ku li dijî mafên xwezayî, meşrû, demokratîk û însanî yên miletê Kurd û Kurdistaniyan derkevin, ew dibin şirîkê siyaset û helwesta dewletên kolonyalîst û hevalbendên wan. Divê em ji bîr nekin ku "Ti tiştek ji bindestî û koletiyê xwelîlisertir tune û herwiha ti tiştek ji serxwebûn, azadî û demokrasiyê jî bi rûmettir tune!"

Ji bo welatekî serbixwe, gelekî azad û civateke demokratîk divê hemû partî, hêz, siyasetmedar û rewşenbîrên Kurdan hewl bidin ku xeta neteweyî, demokratîk û Kurdistanî xurtir bikin û piştgiriya referandûma serxwebûna Kurdistanê bikin. Di encama referandûmeke azad û demokratîk de, gelê Kurdistanê wê bikaribe helwesta xwe ya ji bo serxwebûnê diyar bike. Ev mafekî gelê Kurdistanê yê herî xwezayî û demokratîk e. Lewma jî, divê ti hêz, partî, siyasetmedar û rewşenbîrên Kurd li hemberî keys û fersendeke wiha dîrokî bêdeng û bêhelwest nemînin.



### III. Garantiya serketina referandûmê, bi beşdariyeke girseyî ya jinên Kurdistanê mimkun e!

Di xebat û şoreşên neteweyî û azadiyê de, fedekarî û piştgiriya jinên Kurdistanê xwedî cihekî gelek girîng û taybet e. Di vê riyê de, zor, zehmetî, jar û azara herî mezin jî dîsa wan kişandiye. Jinên Kurdistanê gelek caran zilm û zordariyeke mezin ji hêzen dewletên kolonyalîst dîtine; ji bo dilê dijmin şa nebe, rondikên çavên xwe di çavên xwe de veşartine; gelek caran li ber çavên wan zarokên wan hatine şehît kirin; ew dayikên şehîdên Kurdistanê ne.

Ev referandûm ji hêlekê ve jî, wê bibe tolhildana şehîdên Kurdistanê. Her kurdekî welatparêz û şoreşger deyndarê şehîdên Kurdistanê ye û divê di 25ê îlonê de, bi serketineke mezin beşeke vî deynê xwe bide. Di vî warî de, temsîl û nûnerên şehîdên Kurdistanê, dayik û xwîşkên şehîdan e. Lewma jî piştî encameke serkeftî ya referandûmê, wê xelat û pîroziya herî mezin, pişk û para dayik û xwîşkên şehîdan be!

Garantiya beşdariyeke berfireh û serketineke mezin ya referandûma serxwebûnê jî, wê dîsa bi beşdariyeke girseyî ya jinên Kurdistanê mimkun be. Ger jinên Kurdistanê bi awayekî çalak tevbigerin û mobilîze bibin, wê gavê bila tirsa kesekî nemîne ku em dê serketineke mezin nîşanî dinyayê, dost û dijminan bidin. Loma jî di vê roja dîrokî de, barekî mezin û wezîfeyeke pîroz dikeve ser milên jinên Kurdistanê. Bi awayekî giştî jinên Kurdistanê û bi taybetî jî dayik û xuşkên şehîdan dikanin roleke gelek mezin bilîzin. Divê ji niha de, jinên Kurdistanê xwe mobilîze bikin; kuçe bi kuçe, mal bi mal bigerin, xebat û têkoşîna ji bo refrandûma serxwebûna Kurdistanê berfirehtir û geştir bikin!

Serxwebûna Herêma Kurdistanê, wê bibe destpêka serxwebûn û azadiya perçeyên din ên Kurdistanê jî. Biryara serxwebûna Herêma Kurdistanê, wê tevgera rizgarxwaziya neteweyî û demokratîk, hest û baweriyên neteweyî û Kurdistanî yên perçeyên din jî xurttir û geştir bike. Teva hemû kil û kêmasî û rexneyên di cih de, parastina destkeftinên Herêma Kurdistanê û piştgiriya referandûma serxwebûna Kurdistanê wezîfeyeke welatparêzî, neteweyî û însanî ye!

Di vê roja dîrokî û pîroz de, divê em heta kal, pîr û nexweşên ku nikarin bimeşin jî li ser darbestan bikin û wan bibin ser sindoqên referandûma serxwebûna Kurdistanê, da ku cîhan, dost û dijmin bibînin bê miletê Kurd çiqasî bi hesreta serxwebûn û azadiya Kurdistanê dişewite!

---

# Li Taxa Kurdî Tirsa Serxwebûnê



CANO AMEDÎ

Piştî demnîşankirina referandûma serxwebûna Kurdîstanê, li taxa "Kurdî" ba û bahozek rabûye mirov pir caran ecêbmayî dimîne. Bi salan e ew kesên rêxistin avakirin, rêxistin belav kirine, bi xwe û hevalên xwe re, bi gelê xwe re xirabî kirine îro rabûne weke berdevkên dagirkeran bertekan astengiyan derdixin û dijîtiya serxwebûna Kurdîstanê dikin. Ew aktorên doh doza serxwebûna Kurdîstanê dikirin îro rabûne dibêjin: "ne dema serxwebûnê ye, ne dema dewletbûnê ye, ji bo gelê Kurd dewletbûn pêwîst nake" û hwd. çîrokên dagirkeran weke benîştê pûç li ser zimanê xwe tevdigerînin. Heval û hogirên wan di nav qada têkoşîna rêxistinî de, di zîndanan de, di nav germaya şer de, jiyana xwe ji bo doza serxwebûnê Kurdîstanê dan, ew jî li gor berwejendiyên dagirkeran ketine tayê! Em dibînin îro li Kurdîstanê hinek rêxistin û derûdorên pêşeroja xwe bi dagirkeran ve gire dane ev çend sal e li gor stratejiyeke kûr, plan û projeyên dagirkeran birêve dibin. Li gor daxwaza dagirkeran propagandayên reş dimeşînin. Li dijî karwana serxwebûna Kurdîstanê, zimanekî bi jehr û bi xwîn bikar tînin. Gava li Tehranê, li Enqere, Şam û Bexdayê qêrîn bi dagirkeran dikeve xulamokên wan dest davêjin şûr û êrîşî daxwazên gelê Kurd dikin.

Têkilî û pêwendiyên xulamên dagirkeran li gor berjewendiyên rojane û kesayetî dimeşin. Gelek jê aktorên salên 1970î û yên 1980î ne. Çîroka jiyana wan bi rûreşî û gemariyê tê zanîn. Her dem keda hevalên xwe bin pê kirine an firotine. Hinek jê di demên dijwar de, li ser kar û barên xwe yên şexsî de jiyaneke bê êş jiyane. Xwe û malbata xwe her dem parastine, li hemberî tofanan, li ber ba û bahozan her dem "bisiûd" bûn! Her dem "zîrek û jêhatî" hatine pesandin lê rojekê li pişt xwe pirêzeyeke ber bi çav nehiştine. Hê jî bi xewn û xeyalên postên salên 1980î dijîn. Ji rastiyê dûr ketine, rast e, wê demê serok bûn, sekreter bûn, endamê komîteya navendî bûn, endamê lijnaya bilind bûn, lê îro rastî weke tîrêjên tavê li ber çavan e! Li holê ne erk maye ne jî nav û meqam maye! Tiştên hebûn we nift lê kir û şewitand!

Ew derûdorên îro li dijî serxwebûna Kurdîstanê tevdigerin û weke şûrê Ayettullahan jehrê diherikînin, xewn û xeyalên pûç dibînin. Em bixwazin an nexwazin gelê Kurdîstanê ber bi azadî û desthilatdariya xwe ve dimeşe. Em bixwazin an nexwazin dewleta Kurdî, serxwebûna Kurdîstanê îro ji hêvî û daxwazan derketiye, weke rastiya rojê ketiye rojeva dinyayê. Ji ber wê yekê dijayetî, neyartî û hesûdiya li dijî serokê Kurdîstanê Birêz Mesûd Barzanî nabe bersiv û dermanê têkçûn û rolên we yên xirabiyê. Divê hûn rojek zûtirîn vegerin ser riya rastiyê. Azadî û serxwebûn bi ked, bi bac, bi qelen, bi xwînê, bi êş û qewetê tê stendin. Tu hêz, tu dewlet wî mafî weke litûf nade kesî. Gelê Kurd li ser axa xwe doza welatê xwe û desthilatdariya xwe dike.

Belê mafê her Kurdekî û her rêxistinekê heye li ser pîvanên heq û hûqûqê siyaset û helwestên serokatiya Birêz Mesûd Barzanî rexne bike. Pêşniyar û projeyên çêkirî pêşkeş bike. Divê rexne û xwerexnekirin, li ser wezînên wijdanê û li gor hiqûqa mirovahiyê bên kirin. Bi dijayetî û neyartiya kesayetan siyaseteke demokratîk ne mimkûn e bi ser bikeve. Partî û rêxistinên Başûr bi riya hilbijartinan di parlementoyê de xwedî temsîliyet û xwedî hêz in. Birêz Mesûd Barzanî bi dengê gelê Kurdîstanê weke Serokê Kurdîstanê hatiye hilbijartin û di parlementoya Kurdîstanê de sond xwariye û dest bi kar kiriye. Erk û desthilatdariyeke meşrû û hiqûqî ye.

We çi kir? Îro hûn çi dikin û li ku ne? Ka hêza we ya doh? Hûn bi derûdorên xwe re çiqas lihevkirî ne? Bersîveke we ya erênî heye li hemberî heval û hogirên we? Di rojên zor û tengasiyê de gelo we erkên xwe bi cîh anîn an na? Dest deynin ser wijdana xwe û bersiv bidin. Hûn bi xwe ji bersiva xwe bawer dikin an na? Hûn bi rewşa îroyîn qayil dibin an na? Ger hûn daxwaza berdewamiya statû û bindestiya îroyîn dikin, eşkere derkevin hemberî gel û dîtinên xwe biparêzin. Li ser navê siyaseta Kurdî tu mafê we tune ye hûn desthilatdariya dagirkeran meşrû nîşan bidin! Êdî dev ji çîrokên pûç û vala berdin, xulamtiya dagirkeran we nake hêz û qewet!

Gotinek bapîran heye: "Kurmê şîrî heta pîrî" Ew kesên di jiyana xwe de bi ser neketine û her tim zirar dane derûdora xwe weke tacirên têkçûyî, defterên kevin tevdidin û her tim yên hemberî xwe tawanbar dikin. Di bin bandora dêrûniya têkçûnê de her dem dibêjin: Ez û ez... Tu carî nikarin realist bifikirin. Jiyana wan bi gilî û gazinan, bi rexneyên ne di cih de derbas dibe. Dixwazin herkes bi wan bawer bin, lê ji ber ku ew bi xwe ne bawer in bi şik li derûdora xwe dinêrin, lomekar in.

Li keda xwe, li keda hevalên xwe xwedî derketin karekî pîroz e, helwesteke paqij e! Li şehîd û hêjayên xwe xwedîderketin erkeke mirovahî û netewî ye, helwesteke civakî ye. Em baş dizanin li hêvî û baweriyên xwe xwedîderneketin bêxîretî ye û her tim zirarê dide derûdora xwe. Ew kesên sî sal berê nikaribûn di nav mala xwe de, di taxa xwe de bersiva demê bidin, rê li ber têkçûnê, belavbûnê bigirin pêwîst nake dijberiya serxwebûna Kurdîstanê bikin û "aqil" bidin hinekan. Ew kes û hêzên ku xwe Kurd dibînin, li ser navê doza Kurdîstanê, polîtîka an xebatekê dikin mafê hemûyan heye ku rexne û pêşniyaran bikin lêbelê di bin navê rexneyan de dijberiya doza serxwebûna Kurdîstanê, tawanbariya herî mezin e. Kîjan çîn û tebaqeyên civata Kurd dibe bila bibe ger piştgirî û alîkariya referandûma serxwebûna Kurdîstanê neke mafê wî tune bêje ez Kurd im. Azadkirina heremekê, bajarekî an jî ya gundekî ji bindestiya pergala dagirkerî çêtir e!

> Kîjan çîn û tebaqeyên civata Kurd dibe bila bibe ger piştgirî û alîkariya referandûma serxwebûna Kurdîstanê neke mafê wî tune bêje ez Kurd im. Azadkirina heremekê, bajarekî an jî ya gundekî ji bindestiya pergala dagirkeran çêtir e!



# Para Kurdan di kabîneya Rûhanî de wezîrek jî nîn e

■ ESKENDER CEIFERÎ

Ew Kurdên ku piştgirî didane Hesen Rûhanî, bi hêvî bûn ku ew ê herî kêm vê carê sê wezîrên Kurd pêşniyar bikin. Lê vê carê him Bîjen Zengene take wezîrê Kurd yê şîe ji wezareta Petrolê bêpar dibe û him jî ti Kurdekî din yê Kurd ku Sunnî be, ji aliyê serokkomar ve nayê pêşniyarkirin.

Ji bo cara yekemîn malpera Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî, bi rengekî cidî balê dikşîne ser mijara destnîşankirina wezîrên kabîneya dewletê û dibêje qet Xamineyî destewerdanê di vê mijarê de nake. Li gor daxuyaniya nivîsîngeha Xamineyî jî, hemû endamên kabîneya duyem ya Rûhanî li gor biryara wî nayên hilbijartin.

Hesen Rûhanî di hilbijartinên vê gerê de jî bûye serokkomar û hewl dide baweriyê ji bo wezîrên pêşniyarkirî bi dest bixe.



**Ji 1979an û vir ve ti Kurdekî nikarî bibe endam**

Di 38 salên desthilatdariya Komara Îslamî de tenê wezîrekî Kurd ji navçeyên sunnî yên bi bandor jî nehatiye danîn. Ji sala 1979an heya niha 12 gerên hilbijartinên serokkomariyê li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî nikarî bibe berendam.

Serokkomarên aliyê reformxwazan weke Rûhanî û Xatemî jî ku gelek ji dengên Kurdan jî bi dest xistin, weke serokkomarên din qet Kurdekî sunnî nekirin wezîr.

Wezîrên ku di postên hestyar de ne, bi şêwra Sipaya Pasdaran, Civata Ewlehiya Bilind û Civata Destnîşankirina Berjewendiyên Hikûmetê têne hilbijartin. Ev şêwr, qet nayê ragihandin û tê îdiakirin ku wezîr, bê destêwerdan têne pêşniyarkirin. Lê di rastî de endamên kabîneyê, baweriya xwe ne ji parlementeran belkî ji saziyên ewlehî distînin. Wezîrên weke Îstixbarat, Parastin, Navxweyî, Derveyî û Pêwendiyan di bin bandora biryara navendên girêdayî Xamineyî de têne pêşniyarkirin.

Di yasaya bingehîn a Komara Îslamî de hatiye teqezkirin ku rêberê Komara Îslamî di karûbarên siyaseta navxweyî, derveyî û parastinê de bi bandor e. Ji xeynî ku ev wezîr ji aliyê nivîsîngeha Xamineyî ve têne pêşniyarkirin, serokkomar divê bixwe jî rewatiyê ji wî bistîne.

Nivîsîngeha Xamineyî, tevî redkirina destnîşankirina hemû wezîran ji aliyê wî ve, lê venaşêre ku him ew postên ewlehî û him jî wezaretên Zanist, Perwerde û Çanda Îslamî jî hestyar in û Xamineyî biryara dawiyê distîne. Lê nivîsîngehê qet behsa wezîrê Navxweyî nekiriye ku hemû dijberên Komara Îslamî dibêjin bêyî ku Xamineyî erê bike, ew nayê pêşniyarkirin.

Rexnegirên Komara Îslamî dibêjin ku desthilata serokkomar sînordar e û nikare tiştekî bibêje ku li gor hêza Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî nebe. Gotara Xamineyî ji lêvegera yasaya bingehîn e ku tê de teqez hatiye kirin ku zimanê fermî, Farisî ye û ola fermî jî ya şîeyan e.

Hin ji hêzên reformxwaz ku îdia dikin nerîneke nermtir li hemberî Kurdan heye, carinan nedêla siyasetên xwe di hevrikiya Sipaya Pasdaran de didin. Ebdulla Nûrî ku di dema desthilata seyîd Mihemed Xatemî de wezîrê navxweyî bû, ji ber ku ragihandibû nikare bi Mihemedriza Neqdî rêveberê Îstixbarata Sipaya Pasdaran û Hidayet Lutfiyan rêveberê hêzên polîs re kar bike, Xamineyî ew nekir cîgirê fermandarê giştî yê hêzên çekdar.

### Wezîrên pêşniyarkirî ji aliyê Xamineyî ve tên erêkirin

Eger Rûhanî bixwaze jî, nikare Kurdekî bike wezîr. Nîşanderê vê rastiyê ev e ku Hemîdriza Hacîbabayî ku 8 sal beriya niha endamê seroktiya parlementoya îslamî bû, ragihandiye ku hemû wezîrên pêşniyarkirî ji aliyê Xamineyî ve têne erêkirin û nivîsîngeha wî, nirxandinê jê re dike. Civata Ewlehiya Netewî jî, xeynî Civata Bilind ya Ewlehiya Niştîmanî di bin fermana rêberê 'Komara Îslamî' de kar dike. Wezîrê navxweyî ku ji aliyê wî ve hat destnîşankirin, seroktiya wê rêxistinê û cîgiriya fermanderê giştî yê hêzên çekdar jî dike ku hertim pirsa Kurdan weke pirseke ewlehî û ne siyasî binav dike û lihemberderketina neyaran, ji planên wê yên herî bi bandor e.

# Civaka navdewletî ji lêkolînên fezanasiya Îranê nîgeran e

Komara Îslamî, hewl dide di warê zanistên esmanî û moşekan de pêş bikeve. Îranê, moşekek kêmtirî du heftiyan beriya niha şand ezman. Hat ragihandin ku lêkolînên fezanasiyê, karê sereke yê wê moşekê ye û wê satalaytan bi xwe re bibe. Piştî ku moşek ji parêzgeha Simnanê bi rê ket, karvedanên cuda di asta navdewletî de derketin.



Tevî ku moşekên Îranê yên fezanasiyê heya niha nekarîne bi rengekî serkeftî bi moşekên welatên pêşketî re hevrikiyê bikin, lê Îsraîl û dewletên rojava ji van çalakiyan nîgeran in.

DYA ragihand ku ev çalakî, xalên biryarnameya Neteweyên Yekgirtî di derbarê Rêkeftina Etomî de binpê dikin û hin dewletên Ewropî jî daxwaza sekinandina van çalakiyan dikin. Fransa û Almanya ji şandina moşekên fezanasiyê ji aliyê Îranê ve nerazî ne û Berîtanyayê jî nerîneke hevşêwe heye.

Li hember vê yekê Tehran îddîa dike ku bernameya moşekî, tenê ji bo armancên lêkolînî û zanistî ye û ew dixwazin tevlî pîşesaziya fezanasiyê bibin. Ew didin xuyakirin ku eger rê li ber wan neyê girtin, ew dikarin satalaytan bibin fezayê û mirovan ji bişînin û li wir bicih bikin. Hin kar jî ji bo şandina gazê ji bo valahiya ezman û vegerandina wê hatine kirin. Li hemû cîhanê, sîstema fezanasiyê, girêdayî wezaretên parastinê ye. Lê Îran dibêje ew karên fezanasiya xwe ji wezareta Parastinê cuda dikin.

Eger materyalek bixwaze di xeta erdê de bicih bibe, divê kêmanî bi qasî 160 kîlometran ji erdê dûr bibe. Moşeka ku nikare vê astê derbas bike, lezitiya xwe ji dest dide û nikare riya xwe berdewam bike ji ber ku divê herî kêm bikare 200 kîlometran dûrî erdê bisekine.

Tevî ku 'Komara Îslamî' nikariye di fezanasiyê de her sê planên derbaskirina asta 200 kîlometran, birina sîstema moşekî û vegerandina sîstemê ji bo ezman, ku ji standartên fezanasiyê ne, bicî bike lê nîgeraniya wan dewletan ji Îranê zêde bûye.

Tirsa DYA, Ewropa û hin dewletên din, tirseke stratejî ye. Ew dizanin eger dewletek bikare wan moşekan berhem bîne ku dikarin rast 200 kîlometran derbas bikin, dikare bi xwarkirina her du raste yan jî hokeyan, di çend hezar kîlometriya xwe de êrîşî bike ser armancên dijmin.

**Moşekên fezanasiyê yên Îranê di asta moşekên balistîk de ne**

Koreya Bakur, moşekên dûrhavêj dişîne medara erdê û di dema vegerê de, laşeyên moşekan dikevin ser erdê Korya Bakur û demildest ew moşek têne veşartin. Ev plan dikare di mînakên biçûktir de li Îranê jî bê bikaranîn. Ji ber vê, Îsraîl û rojava dibêjin armanc ji van çalakiyan, bikaranîna moşekên dûrhavêj e û pirsa han, pirseke ewlehî ye û gefê li hemû cîhanê dixwe. Moşekên fezanasiyê yên Îranê di asta moşekên balistîk de ne. Motorek û materyalên şer pê re ne û dikarin derbasî fezayê jî bibin yan jî du rasteyên wê bêne xwarkirin û di hemberî dewletên din de bêne bikaranîn.

> Moşekên fezanasiyê yên Îranê di asta moşekên balistîk de ne. Motorek û materyalên şer pê re ne û dikarin derbasî fezayê jî bibin yan jî du rasteyên wê bêne xwarkirin û di hemberî dewletên din de bêne bikaranîn.

Sedema ku herî zêde tirsê li cem civaka navdewletî çê dike ev e ku ew moşek dikare teqemenî û çekên etomî û yên kîmyayî jî bi xwe re bibe. Eger Îsraîl û rojava, dev ji plana Îranê ji bo êrîşa rasterast jî berdin, lê eger yek ji wan moşekan çeka etomî bi xwe re bibe û vegere ser erdê, gelo ew moşek û materyalên pê re wê li ku derê bikevin û ji kîjan navçeyê re bibin metirsî?

Deh salan piştî şerê cîhanî yê duyem, Almanya karî moşekên bi teknolojiya derbaskirina parzemînan ku materyalên etomî bi xwe re dibin, biceribîne û tê de serkeftî be. Piştî van ceribandinan, gelek pêşketin di warê fezanasiyê û şandina mirovan de ji bo stêrkan çêbûne lê metirsiya wan çekan qet nayê jibîrkirin.




### Îranê pêşketineke zêde bidest nexistiye

Eger ku behsa çalakiyên etomî nekin, Îranê pêşketineke zêde jî di warê fezanasiyê de bi dest nexistiye lê 5 salan beriya niha ragihand ku lêkolînerên wan karîne meymûnekê bi satalaytê re bişînin valahiya ezman û zîndî vegerînin. Lê wê moşekê tenê 120 kîlometre derbas kiribû.

Îranê 9 sal beriya niha moşekek şand fezayê ku hatibû ragihandin temenê wê 3 meh in. 6 sal beriya niha moşekek şand ku 3 heftiyan piştî şandinê, ket xwarê. Heman salê moşekeke din jî şand fezayê ku temenê wê du meh bûn. 3 sal beriya niha jî moşekek şandibû lê tevî ku temenê wê salek û nîv hatibû ragihandin, lê piştî 3 heftiyan ew jî ket xwarê.

# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Li Seqizê kolberekî Kurd ê bi navê Hebîb Muhibî li nêzîki gundê Duaw di encama teqeya rasterast ya hêzên ewlehî de birîndar bû. Kolberekî bi navê Celal Balan pênc rojan piştî ku li Pîranşarê hate birîndarkirin, li nexweşxaneya Mehabadê jiyana xwe ji dest da. Li çiyayê Sûrkêw yê Bane, kolberekî bi navê Îbrahîm Xakî û yekî din bi navê Îbrahîm Mehmûdî jiyana xwe ji dest dan û 3 kolber jî birîndar bûn.



Li gundê sînorî yê Dollebî li Serdeştê, kolberekî bi navê Azad Mîne Ebdulî ji aliyê hêzên sersînor ve hate birîndarkirin. Dema ku kolberekî bi navê Mensûr Resûlî Azer li Pîranşarê ji ber hêzên Sipaya Pasdaran direviya, ket ser mayîneke serdema şerê di navbera Îran û Iraqê de û jiyana xwe ji dest da. Li nêzîkî gundê Bêtûşê yê Serdeştê, kolberekî bi navê Mihemed Ehmediyan ji aliyê çekdarên Îranê ve hat birîndarkirin. Çekdarên sersînor ên Îranê li sînorê Sêro li Urmiyê welatiyekî Bakurê Kurdistanê yê bi navê Kamran Lezgîn xelkê Geverê kuştin.

Wezareta Îstixbarata Îranê rê nade dadgeha pêdeçûnê, hikma darvekirinê ya girtiyekî Kurd bi navê Hûşeng Rizayî biguherîne. Hûşeng Rizayî xelkê Nehawendê ye ku heft salan beriya niha bi tometa endamtî di partiyeke Kurdî de li Tehranê hate girtin û bi darvekirinê hate cezakirin. Ebûbekir Molaniya piştî 70 rojan îşkenceyê ji aliyê Sipaya Pasdaran ve li Makûyê serbest hat berdan. Tometa wî pêwendî bi partiyên Kurdî re bû.

> Çekdarên sersînor ên Îranê li sînorê Sêro li Urmiyê welatiyekî Bakurê Kurdistanê yê bi navê Kamran Lezgîn xelkê Geverê kuştin. Murteza Rehmanî, girtiyê siyasî yê Kurd li girtîgeha navendî ya bajarê Sine hate darvekirin. Tometa Murteza Rehmanî endametî di partiyeke Kurdî de bû.

Çalakvaneke jinan ê bi navê Fatma Elmasî li Seqizê bi danîna kefaleta 250 milyon Tumenî hat berdan. Tometa wê jina Kurd propaganda li dijî hikûmetê bû. Celîl Ahengernijad rojnamevanê Kirmaşanî ji ber rexnegirtin ji berpirsekî dewletê ji aliyê dadgehê ve rastî lêpirsînê hat. Şemsedîn Elîzade ku ji aliyê Sipaya Pasdaran ve li Urmiyê bi tometên siyasî hatibû girtin, bi danîna kefaletê, serbest hat berdan.

Çengîz Qedemxêrî xelkê Kamyaranê ku şeş salan beriya niha bi tometa endamtî di partiyeke Kurdî de bi 40 salan girtîgehê hat cezakirin, ji ber rê nedan ji bo çareseriya tendirustî li girtîgeha Mescid Sulêman ket gireva birçîbûnê. Ew girtiyê Kurd, di dema lêpirsînê de rastî îşkenceyê hatiye û di encamê de tendirustiya wî têk çûye. Girtiyekî Kurd ê sirgûnkirî ji bo navçeya Cûybar li Mazenderanê bi navê Husên Sarûkî bi tometa kuştina kesekî hat darvekirin. Ew welatiyê Kurd, sê salan beriya niha piştî pevçûnekê bi kesekî din re hat girtin û ji aliyê dadgeha Komara Îslamî ve bi tometa kuştinê, bi darvekirinê hatibû cezakirin.

Murteza Rehmanî, girtiyê siyasî yê Kurd li girtîgeha navendî ya bajarê Sine hat darvekirin. Tometa Murteza Rehmanî endamtî di partiyeke Kurdî de û kuştina çekdarekî Sipaya Pasdaran bû û ji aliyê dadgeha Sine ve bi sê caran darvekirinê hatibû cezakirin. Herwisa tometeke din ya wî, Şerê li dijî Xwedê bû ku ji bo endamên partiyên Kurdî bi kar tê.



# Rûreşiya sedsala 21an: Yemen

SARA PÎRANIJ

Li Rojhilata Navîn, navendeke din a ku şerê bi nûnertiyê dimeşe Yemen e; welatê herî feqîr ê cîhana Ereban... Piştî Bihara Ereban tevlîhevî li Yemenê jî çêbû. Qewimînên ku îro rû didin xwedî dîrokeke kevnar bin jî ji sala 2014an ve jî serhildan zêdetir bûne. Tevgera Şîe ya Hûsiyan di Îlona 2014an de serî hilda û hema bêje tevahiya Yemenê xist bin serweriya xwe. Li hember vê yeke, krîza di 2015an de berfireh bû û îro, li 2017an, dibe sedema felaketeke mezin. Kolera û şer nifûsa Yemenê kêm dike.

Dema hûn li krîza Yemenê dinêrin, Hûsî û Serokkomar Hadî, El Qaîde û Îran, Erebistana Siûdî û serokê berê Alî Abdullah Salih dibînin. Gelek aktorên vî şerî hene. Bi piştgiriya DYA û seroktiya Erebistana Siûdî koalîsyonek hat avakirin ku ji Misir, Bahreyn, Jordon, Kuveyt, Fas, Qatar, Senegal, Sûdan û Yekîtiya Emaretên Ereban pêk tê. Hikûmeta ku ji aliyê koalîsyonê ve piştgiriyê dibîne, serweriya Başûrê Yemenê dike. Hûsiyên îsyankar jî ji aliyê Îranê ve piştgiriyê dibînin û serweriya Bakur û paytextê dikin. Erebistana Siûdî û Îran ji ber şerê Yemenê hev sûcdar dikin.

**Proseya rûdanên pevçûnan**

Serokê Hûsiyên ku ji sedî 30ê nifûsa Yemenê ku 25 milyon welatiyên wê hene serî li hember Serokkomarê Yemenê Alî



> Hikûmeta Hûsiyan ji aliyê raya navnetewî ve nehatiye nasîn. Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî (KENY) destnîşan dike ku niha jî Serokê Dewletê yê meşrû tenê Abdurrabû Mansûr Hadî ye.

Abdullah Salih rakiribû. Di heman salê de di encama operasyoneke yekîneyên leşkerî yên Yemenê de Serokê Hûsiyan Huseyîn Bedrettîn El Hûsî hat kuştin û birayê wî Abdûl Malik El Hûsî kete şûna wî. Tevgera Hûsiyan li hember desthilata di sala 2011an de ku piştî Bihara Ereban hatibû cihê Salih, Abdurrabbû Mansûr Hadî jî derketibûn. Bi armanca standina zaftirîn maf û serweriyê, pêşnûmeya destûra bingehîn ku dixwest Yemen ji 6 herêman pêk were red kirin. Hûsiyan daxwaza serweriya zaftirîn dikir ji ber vê jî dixwestin Yemen ji du herêman pêk were. Hûsiyan di sala 2014an de serî hildan û di demeke kin de gihîştin Sanayê ku paytexta Yemenê ye. Bi tometa alîgirbûna Rojava û DYAyê, Serokê Dewletê Hadî ji berpirsyariyê xistin û parlemento jî ji holê rakirin û 'Komîteya Şoreşê' ava kirin.

Hikûmeta Hûsiyan di qada navdewletî de nehatiye nasîn. Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî (KENY) destnîşan dike ku niha jî Serokê Dewletê yê meşrû tenê Abdurrabû Mansûr Hadî ye. DYA û YE di serî de gelek dewletan konsolxane û balyozxaneyên xwe yên li Sanayê girtin.

**"Di dîrokê de 17 şer di navbera Siûdî û Yemenê de derketine"**

Rojnameger Murat Nazlı, ji Heftenameya Basê re şerê li Yemenê dinirxîne û dibêje; "Ev şerê li Yemenê ne yê du salên dawî ye. Erebistana Siûdî piştî salên 1910î du eyaletên Yemenê dagir dike. Di navbera wan de di dîrokê de 17 şer derketine. Berberiya di navbera herduyan de xwedî dîrokeke kevnar e. Beriya du salan jî Erebistana Siûdî bi piştgiriya DYAyê, welatên Kendavê êrîşî Yemenê kirin."

**"Rê li ber saziyên alîkariyê yên navnetewî tê girtin"**

Nazlı bersiva pirsa 'çima kêşeya Yemenê çareser nabe' bi mînaka kêşeya Îsraîl û Filîstînê dide; "Eger kêşeya 50 salî ya Îsraîl–Filîstînê çareser bibûya dê kêşeya 2 salî ya Erebistana Siûdî û Yemenê jî çareser bibûya. Ji ber ku DYA piştgiriya Siûdê dike, kes dengê xwe dernaxe û mûeyîdeyan nîşan nade. Herçiqas Erebistana Siûdî tu normên hiqûqa navnetewî û mafên mirovan bicih neyîne jî li Neteweyên Yekbûyî li Komîsyona Mafê Mirovan a NYyê xwedî kursî ye. Erebistana Siûdî jî naxwaze Yemeneke bihêz hebe, ji ber wê jî daxilî kar û berên Yemenê bû û di encamê de jî şer derket. Piştî van pevçûnan avahiyên bingehîn hilweşiyan. Eger hûn avahiyên bingehîn ên welatekî bombe34 bikin, karebê avê rûxînin wê ew welat bê av bimîne û eger mirov bê av bimînin ew dever dê bibe cihê herî ne xweş. Bi tu halî alîkarî nagihijîn Yemenê. Ev şer nayê sekinandin. Rê li ber saziyên alîkariyê yên navnetewî tê girtin. Ji ber vê jî mirin zêde dibin. Yemen welatekî feqîr e. Şer bidome wê mirin jî zêde bibin. Di serî de NY û cîhan midaxele neke dê ev şer bidome."

Nazlı di derbarê îddiayên li ser rola Îranê de yên li Yemenê jî dibêje "Hûsiyên wir Zeydî ne. Sûnî, Zeydiyan jixwe qebûl dikin. Lê Şîa qebûl nakin. Herçiqas weke Şîayan xuya bikin jî ji ber ku 12 Eliman qebûl nakin Şîa wan qebûl nakin."

### Rûyê din ê Yemenê: Kolera, xela û birçîbûn

Li Yemenê wêrankariya şer û ambargoya hevpeymana bi serokatiya Erebistana Siûdî dibe sedema tunebûna xwarinê. Yemenî nikarin xizmeta tendûristiyê bistînin. Li welêt ji ber xela û kolerayê hejmara qurbaniyan her diçe zêde dibe. Li aliyekî êrîşên koalîsyonê, li aliyê din şerê navxweyî. Heta niha 8 hezar û 160 kesî jiyana xwe ji dest daye, 46 hezar û 300 kes jî birîndar bûne. Ji ber nexweşiya kolerayê jî nêzîkî 2 hezar kes mirine. Her roj nêzîkî 5 hezar Yemenî, zarok, ciwan û pîr nexweş dibin. Li gor ragihandinan di 27ê Nîsana 2017an de heta niha 372 hezar û 900 kes ji ber nexweşiya kolerayê hatine tomar kirin. Ji van kesan 837 kes mirin. Rêjeya miriyan di bin 15 salî de ye. Nifûsa Yemenê ber bi tunebûnê ve diçe.

# Dabeşbûneke bêsînor û bidestxistina serxwebûna Ukraynayê

DERYA KILIÇ

Ukrayna yek ji dewletên ku piştî hilweşandina Yekîtiya Komarên Sosyalîst a Sowyetê serxwebûna xwe standiye ye. Dê îsal 26. salvegera serxwebûna xwe pîroz bike. Vê dewletê piştî hilweşina Yekitiya Sowyetê di sala 1ê Berfanbara 1991an de referandûma serxwebûnê pêk anî. Encama vê referandûmê ji sedî %90 dengên 'Erê' derketin. Parlementoya Komara Sosyalîst û Sowyet a Ukraynayê di 24ê Tebaxa 1992an de serxwebûna xwe îlan kir.

**Dîrok û rabirdûya siyasî ya Ukraynayê**

Li gor dîrokê li Ukraynayê yekem gelê ku dewlet ava kiriye Îskîtî ne. Gotiyên ku duyemîn gelê li Ukraynayê Beriya Mîladê bicih bûne û şaristaniya xwe ava kirine û di sala 375an de ji aliyê Hûnan ve hatine rûxandin. Piştî Hûnan di sedsala 5an de gelên Slavan li axa Ukraynayê bicih bûne.

Kiev paytexta Kiev Knezliyan (Kievskaya Rûs) ku weke pêşengê Belarûs, Rûsya û Ukraynayê tê qebûl kirin e.

Ukraynî yek ji gelên Slavan e ku li gel Rûs û Belarusî ji sê gelên Slavan e. Ji wan re Slavên Rojhilat tê gotin. Slavên Rojhilatî di bin sîwana Mîrekiya Kievê de, di sedsala 8an de ku ji Behra Reş heta Behra Baltikê xistibûn bin hikûmraniya xwe civiyan û mezheba Ortodoks a Hirîstiyaniyê qebûl kirin. Di sedsala 13an de ji ber êrîşên Moxoliyan Mîrekiya Kievê hilweşiya. Piştî hilweşîna vê mîrekiyê, mîrekiyên herêmê derketin holê. Mîrekiya Moskovayê ku piştî hilweşandina Mîrekiya Kievê derket holê, dê di dahatûyê de xurt bibe û Împaratoriya Rûsyayê ava bike. Di sedsalên 12an û 13an de piştî hilweşandina Mîrekiya Kievê axa Ukraynayê dikeve bin serweriya Rûsya û Belarûsê. Neteweperwerên Rûsî, Mîrekiya Kievê weke mîrekiyeke Rûsî dibînin. Li gor wan zimanê Ukraynî di demên paşî de ji gundan û ji tesîra Poloniyan derketiye holê. Li gor neteweperwerên Ukraynî jî Mîrekiya Kievê, dewleta Ukraynayê ye. Ji ber êrîşên Moxolan, Kievê gelek zirar dît û serweriya xwe ya siyasî winda kir.

**Destpêka serhildanên gundiyan**

Di dema dagerkeriya Polonyayê de Ukraynî rastî zilm û zordariya aborî û olî tên. Di sedsala 16 -17an de li hember serweriya Polonyayê û Kilîseya Katolîk, gundiyan her wextî serî hildida. Di vê demê de li berriyên Ukraynayê, komeke bi navê Kozak an jî Kazak derketiye holê. Kozakan piştgirî didan serhildanên gundiyan ên li hember Polonyayê. Serhildana herî mezin a Kozakan di sala 1648an de bi serokatiya Bogdan Hmelnitski rû da. Ukrayna bi sedan sal e li gel Polonya û Lîtwanyayê doza serxwebûnê didomîne. Bi pêşengiya Bogdan Hmelnitski di encama serhildana Kozakan a mezin de, di nexşeya Ewropa de, di warê leşkerî û îdarî de cihê xwe bi navê Zaporojye Seçî careke din girt.



Hmelnistki, li axa îro ya Ukraynayê bi giştî serxwebûna Kozakan stand. Ew dema kin ku Kozakan serweriya Ukraynayê dikirin, di dîroka Ukraynayê de demên kêm ên bi serxwebûnê derbas kirine ne. Hmelnistki dema dibîne ku nikare bi tena serê xwe li hember Polonyayê bisekine, di sala 1654an de dikeve bin serweriya Rûsyayê.

Piştî şerê di navbera Osmanî û Lehistanê de, Başûrêrojava û Rojavayênavînê Ukraynayê dikeve bin kontrola Osmaniyan û Osmanî bi navê Eyaleta Podolyayê eyaletekê ava dikin.

Di şerê Osmanî–Rûsî (1676 – 1681) de di navbera Osmanî, Xana Kirimê û Çarîtiya Rûsyayê de, li Kirimê Peymana Bahçesaray tê îmzekirin. Li gor rêkeftina ku dê 20 sal derbasdar be; Hidûdê navbera Çarîtiya Rûsyayê û Osmaniyan de dê Çemê Dnyeprê be. Li gor vê rêkeftinê Zaporojye ket bin serweriya Osmaniyan. Serweriya Osmaniyan li herêmê heta Rêkeftina Karlofçayê (1699) berdewam kir.

**Dema Yekitiya Sowyetê her du şerên mezin ên cîhanê û serxwebûn.**

Piştî Rûsya di sala 1783an de Kirimê dixe bin serweriya xwe, xweseriya Kozanan bi giştî radike. Navenda Ukrayna û Rojhilata wê dikeve bin serweriya Rûsyayê. Rojavayê Ukraynayê jî pêşî di bin serweriya Polonyayê paşî jî dikeve bin serweriya Împaratoriya Awusturya-Macaristanê.

Piştî hilweşandina Împaratoriya Awusturya–Macaristanê, di Şerê Yekem ê Cîhanê de Komara Netewî ya Ukrayna Rojava hat îlan kirin. Ev serxwebûn jî tenê çend salan berdewam kir. Piştî demeke kin Rojavayê Ukraynayê ket bin serweriya Polonya, Rojhilata Ukraynayê jî ket bin serweriya Yekitiya Sowyetê.

Di Şerê duyem ê Cîhanê de, bi giştî axa Ukraynayê ket bin serweriya Naziyan. Di berdewamiya şer de, li welat şerên partîzanî rû dan. Ukrayna di sala 1944an de ji bin dagirkeriya Naziyan filitî. Di şer de 5 milyon Ukraynî jiyana xwe ji dest dan. Li welêt 700 bajar û 28 hezar gund hatin rûxandin.

Yekîtiya Sowyetê pêşî di 1939an de paşê jî di 1944an de axa Rojavayê Ukraynayê bi dest xist. Di sala 1954an de Nikita Kruşçevê serokê Sowyetê Kirimê ji Komara Rûsyayê veqetand û kir bin serweriya Komara Ukraynayê ku herdu welat jî di bin serweriya Sowyetê de bûn. Zakarpatya di sala 1945an de tevlî Komara Sosyalîst a Ukraynayê bû, Kirim jî di sala 1954an de tevlî bû û bi vî awayî cara yekem Ukraynaya îro derket holê.

Di destpêka salên 1990î de li Yekitiya Sowyetê bi navê "Ji nû ve avakirin", dabeşbûnê dest pê kir û Ukrayna jî weke hemû welatên Sowyetê di bin tesîra neteweperiyê de bû. Piştî hilweşandina Yekitiya Sowyetê di sala 1ê Berfanbara 1991an de, referandûma serxwebûnê pêk anîn. Di encama vê referandûmê de ji sedî 90 dengên 'Erê' derketin. Parlementoya Ukraynayê di 24ê Tebaxa 1992an de serxwebûna xwe îlan kir. Yekem Serokê dewletê Leonid Kravçuk e.

### Taybetmendiyên Ukraynayê:

Navê welêt ê fermî Komara Ukraynayê ye, zimanê fermî Ukraynî û paytexta wê jî Kiev e. Cîranê rojhilat û bakûr rojhilat Rûsya, li bakur rojava Belarûs, li rojava Polonya, Slovakya û Macaristan, li başûrê rojava jî Romanya û Moldova hene. Hidûdê wê li Deryaya Reş û Deryaya Azakê heye. Li gor erdnîgariya xwe li cîhanê di rêjeya 46an de ye ku welatekî berfireh e. Welatê duyemîn berfireh ê Ewropayê ye. Gelheya wê nêzîkî 45 milyonan e. Piraniya şêniyên wê bi rêjeya ji sedî 77 Ukraynî ne. Rêjeya Rûsan li Ukraynayê ji sedî 17 ye. Nêzîkî 300 hezar jî Tatarên Kirimê ku Tirk dihesibînin hene. Embara qût a Ewropayê ye. Dewlet xwedî erdên çandiniyê ye. Li Ukraynayê avakirina motorên balafir û trimbêlên din jî bi pêş ketine. Aboriya Ukraynayê herî zêde ji metalûrjî û kîmyewiyê kar dike.

> Ukraynî yek ji gelên Slavan e ku li gel Rûs û Belarusê ji sê gelên Slavan e. Ji wan re Slavên Rojhilat tê gotin. Slavên Rojhilatî di bin sîwana Mîrekiya Kievê de, di sedsala 8an de ku ji Behra Reş heta Behra Baltikê xistibûn bin hikûmraniya xwe civiyan û mezheba Ortodoks a Hirîstiyaniyê qebûl kirin.

# Endamên LGBTÎ bo mafên xwe li kolanan e...

Serokê DYAyê Trump di 26ê Tirmehê de li dijî transan di hesabê xwe yê twitterê de çend twît parvekirin. Piştî van twîtan li DYAyê transan dest bi protestoyan kir. Li ser hesabê Trump hat ragihandin ku; "Hikûmeta DYAyê, wê qayil nebe ku di tu qadê de Trans di artêşa DYAyê de cih bigirin û ew ê nehêle jî. Divê artêşa me xwe ji bo serkeftinên biryardar amade bike. Kêmasiyên ji ber Transan û mesrefên wan ên tendûrîstiyê yên biha divê ne li ser milê artêşê be." Bi van gotinan Trump dibêje dê hebûna Transan li artêşê wê bê qedexekirin.

Serokê berê yê DYA Barack Obama beriya ku dema wî ya serokatiyê bidawî bibe, tevlîbûna endamên Transan bi nasnameya vekirî bo artêşê pesend kiribû. Beriya ku ev biryar bê pêk anîn, wê salekê weke mînak bihata ceribandin. Li gor îdareya Obama, wê artêş mesrafê endamên xwe yên ku dixwazin zayenda xwe biguherînin hilgire ser xwe.

Mijar, naverok, sedem û rewşa transên di artêşê de hîn ne diyar e lê di 27ê Tirmeha 2017an de endamên LGBTÎ yên DYAyê dest bi protestoyan kirin. Li aliyê din Pentagon hejmara endamên xwe yên trans nede jî, li gor The Guardianê ji 1 milyon û 300 hezar endamên artêşa DYAyê di navbera hezar û 320–6 hezar 630 kesî de trans hene. Em weke Heftenameya Basê bi endamên Sîwana Sor, Serkan û Belgim re axivîn.

**"Qedexekirina vê mijarê li hember mirovahiyê sûcê herî mezin e"**

"Xwezayê, ajalan her tiştî qetil dikin. Vê yekê qey trans dikin? Ew kesên em ji wan re dibêjin Hetero vê yekê dikin." Belgim bi van gotinan dest bi axaftina xwe dike. Di berdewamiya axaftina xwe de Belgim: "Bi lixwekirina kincekî diyar dibe ku kesek Trans an ne Trans e. Dibe hin kesên veşartî di bin cil û bergên heteroyan de jî hebin ku trans in. wê vê yekê ji ku bizanin? Em ê li gor derveyî mirovekî binirxînin? Em hê jî bi cil û bergan ve asê mane. Mîna parka Maçkayê. Ji jinekê re dibêjin tu nikarî vî li xwe bikî, nikarî vêya bikî. Bi yek çavî li mijarê dinêrin. Di navbera gotina Trump ku digot 'Nabe Trans di nav artêşê de hebin' û ev gotin heman tişt in. Nêremoyek jî dikare leşkeriya xwe bike. Wisa be bila mafê dengdana endamên LGBTîyan jî tune be. Wê demê dê gelek îktîdar têk biçin. Em tev ji nav gel tên. Bi xêr û gunehan, bi başî û xirabiyan, bi trans û nêremoyan, bi hetero û lezbiyenan em tev ji nav vî gelî tên. Çawa em bi çavekî xweşbexşiyê li her tiştî dinerin, divê em li vê mijarê jî wisa binêrin. Lê li gor min kesek derkeve û vê qedexe bike li hember mirovahiyê ev sucê herî mezin e."

"Ev biryar dê bandorê li hemû civakê bike"

Serkanê xebatkarê Sîwana Sor jî mijarê di çarçoveya polîtîkayên neolîberal de dinirxîne. Serkan, "Li seranserî cîhanê bizaveke wisa heye. Ev bi nêrîna Trump li hember LGBTÎyan belkî neyê îzahkirin. Trump di hundirê xwe de ne fenomenek e. Ew lîberalîzma ku ji salên 90î ve ji aliyê Rojavayiyan ve hatiye meşandin îro berovajî dizîvire. Di warê îdeolojiyê de berovajiyek li holê ye. Bi giştî bandorê li mafê mirovan bike jî bi taybetî li jinê, li LGBTîyan, ajal, pêkhateyên etnîkî, mafê zarokan û hwd. dike."

Serkan diyar dike ku Trump hewl dide ku biryarên di serdema Obama de hatine dayîn berovajî bike û ji xwe re qadekê veke. Serkan axaftina xwe wiha didomîne: "Li DYAyê berê polîtîkaya 'Don't ask; don't tell' (Nepirse; neaxive) hebû. Dibe ku di artêşê de bî lê ev nayê pirsîn û ragihandin. Di dema Partiya Demokratan de guherîn çêbûn. Ev guherîn hinek mafan bi xwe re tîne. Eger ev biryara Trump were sepandin dê helwesteke ciyawaz derkeve holê ku ji 'Don't ask, don't tell' ê jî paşverûtir e. Ev yek jî ji perwedeyê bigirin ta civakê dê bandorê li her tiştî bike."

**Gelo li Rojava hêza LGBTÎyan hat avakirin?**

Rojnameyên navdar ên Brîtanî Independent û Insurrection News di dawiya meha Tirmehê de ragihandibûn ku li Rojava hêzeke LGBTÎ hatiye avakirin lê berpirsyarên Rojava ji Basê re axivîn û ew îddîa derewandin.

**Rewşa LGBTÎyan li cîhanê**

Komeleya Lezbiyen, Gay, Bîseksûel,Trans û Înterseks (ILGA) raporteke lêkolînê weşand. Li gor raportê; li 8 welatan kesên ku xwedî têkiliyê hevzayendî ne tên kuştin û li 72 welatan jî cezayên zindanîkirinê hene.

Di raportê de destnîşan dikin ku li Afrîkaya Başûr, Rojhilata Navîn û Asyayê rastî cezayên tûnd tên lê li Ewropa û DYAyê rewş hinekî asayîtir e.

Li gor raportê li Îran, Erebistana Siûdî, Sûdan û Yemenê ji ber ku hiqûqa şerîî heye, cezayê kuştinê didin LGBTÎyan. Îro jî ev rewş didome. Her wiha li Somalî û Nîjeryaya Bakur jî mirov rastî heman cezayan tên. Li Sûriye û Iraqê ev ceza bi destê dewletê neyê dayîn jî bi destê hizbên tûndrew ên weke DAIŞê pêk tê. Li Misirê jî têkiliya hevzayendî ne qedexe be jî ji ber hikmên exlaqî gelek kes di zîndanan de ye. Li welatên weke Botsvana, Kenya, Zimbabve û Tunusê jî ji ber xebatên lobiyê hinek pêşketin rû didin.

Nivîskarê raporta ILGAyê Aengus Caroll, rastiya di derheqê raportê de bi kurtasî wiha bi lêv dike: "Li cîhanê tu welatek tune ye ku LGBTÎ rastî êrîş, deximandin (Damgalama) û ciyawaziyê neyên."



# Şahberhemên Muzîka Kurdî

ROHAT ALAKOM




Nivîskar baş kiriye ku muzîk di nav sînorên teng ên dengbêjiyê de nefetisandiye. Mirov gelek caran di çavkaniyên cihê de rastî gotina dengbêjiyê tê ku wek sînonîma (hemwate) muzîkê hatiye bikaranîn. Mirov vê berhema Zeyneb Yaşê dikare wek destpêka dîroka muzîka kurdî jî binavîne. Bona lêkoler, dîrokhez û evîndarên folklora Kurdî berhemeke gelek kêrhatî û balkêş e.

Ev pirtûka bi navê Şakarên Muzîka Kurdî ji aliyê lêkoler Zeyneb Yaş ve hatiye nivîsîn. Dema ez ji derketina vê çavkaniyê agahdar bûm, min xwest vê pirtûkê peyda bikim û bixwînim. Nivîskara pirtûkê berî çend mehan bi rêya hevalekê, wek dîyarî her du cild bi îmzekirî ji min re şandin. Ev xebata berfireh ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê de hatiye weşandin (cildê 1-2015, 447 rûpel, cildê II-2016, 598 rûpel). Di nav rûpelên pirtûkê de bi qasî 100 muzîsyen û hunermend tên nasandin. Agahiyên bîyografîk, berhemên hunermendan, tekstên hin stranan, notayên wan û wêneyên hunermendan li gorî pergalekê rêz bûne. Ev xebat, tenê hunermendên ku niha ne li jiyanê ne, yên ku çûne ser dilovaniya xwe dide nasandin. Xebat bi vî aliyê xwe ve sînorkirî ye.

Peyva şakar ku di navê pirtûkê de derbas dibe, di zaravayê Kurmancî de peyveke zêde nas û belavbûyî nîn e. Nivîskara pirtûkê bi wateya şahberhem, berhemên bijarte, şaheser bi kar aniye. Herwiha şah û şahbanûyên muzîka Kurdî jî tên nasandin. Zeyneb Yaşê xwestiye şahberhemên muzîka Kurdî derxe pêş. Nivîskar baş kiriye ku muzîk di nav sînorên teng ên dengbêjiyê de nefetisandiye. Mirov gelek caran di çavkaniyên cihê de rastî gotina dengbêjiyê tê ku wek sînonîma (hemwate) muzîkê hatiye bikaranîn. Mirov vê berhema Zeyneb Yaşê dikare wek destpêka dîroka muzîka kurdî jî binavîne. Bona lêkoler, dîrokhez û evîndarên folklora Kurdî berhemeke gelek kêrhatî û balkêş e. Min bi evîneke mezin ev pirtûk xwend. Divê ez li vir diyar bikim ku her netewe bi ziman, edebîyat, folklor, muzîk, dans û bi dîrokekê dibe netewe. Di avakirina (înşakirin) neteweyan de muzîk dikare roleke gelek mezin bilîze, neteweyan rake ser piyan, ji cîhê xwe bilivîne û seferber bike. Mirov bi rehetî dikare bêje ku muzîk yek ji wan îcat û şovên mirovahiyê yên herî kevn û herî mezin dikare bihesibîne!

Bi saya vê xebata Zeyneb Yaş, xwendevan di derbarê dîroka muzîka Kurdî de dikare gelek tişt û mijaran fêr bibe. Wek mînak mirov bersivên van pirsan dikare di pirtûkê de bibîne; Dengên hunermendan li ku derê hatine qeyd kirin, wan di kîjan radyoyan de kar kirine, li ku derê konser dane? Dema mirov rûpelên pirtûkê rûpel bi rûpel diqulibîne, dibîne ku hin hunermendan berê xwe dane Başûrê Kurdistanê çûne Zaxo, ji wir bi rê ketine çûne Bexdayê. Komeke wan hunermend û muzîsyenên Kurd di beşa Kurdî ya Radyoya Bexdayê de kar kirine, wek Seîd Axayê Cizrawî, Mihemed Arif Cizrawî, Hesen Cizrawî. Navê çend hunermendên jin jî em dikarin bidin wek Meyrem Xan, Elmas Mihemed, Fewiziye Mihemed, Nesrîn Şêrwan, Gulbihar (Faîze, Fatima Mihemed), Eyşe Şan. Dengê hunermendên Kurd tevlî pêlên radyoyên Mehabad, Tehran, Tewrêz, Kirmanşanê û Urmiyê bûne. Paşê gelek dengbêj û muzîsyen ji nav kurdên Sovyeta Kevn derketine, Radyoya Rewanê ji xwe re kirine star. Di dawiyê de ev hemû deng gîhiştine hev, di çanda neteweyê Kurd de bi xurtî deng vedane, rengînî û dewlemendiyeke dengan a bêhempa pêk anîne. Civatê qîmeteke mezin daye hunermendên xwe, ew ji nû ve hatine navandin, wek Ferzende (Teyrê ser milê qîz û bûkan) û Reso (Mîrê dengbêjan).

Zeynep Taş bi pêşgotineke dirêj qala giringiya xebata xwe û naveroka wê dike. Di destpêka pêşgotina xwe de bala me dikişîne ser mijarekê: "Di dinyayê de kêm qewm hene ku şîn û şahiyên xwe tev bi strandinê pêk anîbin; yek ji wan gelê Kurd bixwe ye". Bi rastî di folklora Kurdî de hejmara stranên şînê û govendê bi hezaran in. Gotin û stran fonksîyonên din jî dilîzin. Min berî demekê romaneke piçûk xwend, di romanê de ez rastî mijareke gelek balkêş hatim. Li wir di cîhekî de hêza stranan, qiymetê ku civatê daye stranan wiha derketiye pêş: "Lê ûsuleke axayên wê dewrê hebû, ew jî ev bû; ku girtiyek bi mirinê bihata cezakirin kî dibû bila bibûya ku keçek bihata li ser kilam bigota, ew kilam jî bi taybetî ji bo wî girtiyî bûya, wê demê ew ji bo evîna wî dibexşandin. Ku wisa nebûya bi awayekî din xelasbûna wî tune bû" (Yakup Meşe, Perîşan û Xelîl Beg & Sindiyanê Talo, 2016, rûp.15). Zeynep Yaşê bi zimanekî paqij, herikbar û nûjen ev xebata xwe amade kiriye.

Nivîskar hin caran çend peyv û gotin bi kar anîne ku balkêş in, wek mînak: alîgor kirin (binax kirin, gor kirin), pêzanîn (agahî û zanyarî), qeyran (sirgûn), qewan (sêlik, plak), canecan (samîmî, ji dil), dûqolî stran gotin (duet, strana ku ji aliyê du kesan de tê gotin).

Xebata Zeyneb Yaş bi pergaleke kronolojîk diherike. Evdalê Zeynikê wek muzîsyenê Kurdî yê herî kevn hatiye hesibandin. Pirtûk bi vî dengbêjê Kurd dest pê dike. Paşê em nasiya xwe didin kesekî ku heta niha me qet navê wî nebîhisiye; Xosrof Malool (1880-1971) hemwelatiyekî Asûrî ku berî sed salî ji Amedê koçberî Amerîkayê kiriye. Çend perçeyên muzîka Kurdî jî bi dengê wî li Amerîkayê hatine qeydkirin û heta rojên îroyîn hatiye. Min bi xwe ev beşa wek xeberekê, wek nûçeyekê xwend. Ev mînaka jî nîşan dide ku di arşîvên Amerîkayê, di arşîvên welatên Ewrûpayê de, di depo û jêrzemînan de, di qutî û sandoqan de, di dosya û albûman de çi tiştên veşartî hene, ew tenê benda me, hêviya me ne! Keda Ermeniyan jî tevlî pêşketina muzîka Kurdî bûye wek stranên Karapêtê Xaço û Aramê Tîgran.

Nivîskara vê xebatê Zeyneb Yaş Kurdeke ji hêla bajarê Sêrtê ye, niha li Amedê dimîne û karên xwe li wir dimeşîne. Ew, bi salan bi berhevkirin û danasîna folklora Kurdî ve mijûl bûye. Berî çend salan Zeyneb Yaş li gel Hîlmî Akyol di derbarê jiyan û berhemên dengbêja Kurd Eyşe Şanê de lêkolînek amade kir û weşand: "Ez Eyşe Şan im" (Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, 2008, Duhok). Peyva kelepûr jî wek peyva şakar di zaravayê Kurmancî de zêde cih negirtiye, kelepûr tê wateya mîrateya çandî, bi taybetî jî xezîneya folkloran (edebîyata devkî, zargotin).

Wek me li jor jî got, nivîskar di vê berhema xwe de jiyan û berhemên ji sedî zêdetir hunermendên niha ne li dinyayê ne dide nasîn. Lê belê carcaran hin hunermend hatine jibîr kirin. Wek mînak dema nivîskar, dengbêj Baqî Xido (1913-2009) dide nasîn, zêde qala heval û hemdemê wî Mişoyê Bekebûr/Mişo Bekebûr Berazî (1889-1956) nake. Mişo Bekebûr Berazî yek ji wan dengbêjan e ku destana Memê Alan ji serî heta binî bi hûralî zanibûye. Vê yekê cara yekem berhevkarê vê destanê lêkolerê Fransî Roger Lescot kişandiye. Di derbarê wî de di sala 2012an de belgefîlmekî (dokumenter) gelek baş ji aliyê hemwelatiyê wî Salih Kobanî ve amade bû. Dengbêjekî din ku hatiye jibîr kirin jî Keremê Kor e ku li herêma Agiriyê jiyaye, di sala 1977an de çûye ser dilovaniya xwe. Di pirtûka Zeynep Yaşê de qala çend hunermendên Kurdên Rewanê jî nehatiye kirin. Wek mînak her du bira Şêx Kamil û Şamilê Beko wek du muzîsyenên Kurd tên nasîn ku berî sedsalî dîlan, dewet û şahî şên kirine. Erebê Şamo bona birayê piçûk Şamilê Beko ev gotinên watedar bi kar anîne: "Dema Şamilê Beko fîqê dixe, mar meriyan naxin lê dûpişk direqisin". Şamilê Beko, mamosteyê hunermend Egîtê Cimo bûye. Yek ji wan dengbêjên Radyoya Rewanê Memoyê Silo jî di pirtûkê de cih negirtiye, dengbêjê navdar bi stranên xwe yên bi navên Sîsilê û Ezî kal bûm hatibû nasîn.

## Ji bo xwandevanan mizgîniyek...

Min bi sîstematîk ji serî heta binî rastnivîsîna teksta vê pirtûkê bi çavekî edîtorî kontrol nekir. Lê belê dema min wiha çavek li rûpela naverokê gerand, min nihêrî wek mînak navê bajarê Rewanê wek Yêrîvan û Êrîvan, navê bajarê Koyê wek Koy Sincex û Koysancax du caran cihê hatine nivîsîn. Bêgûman ev kêmasiyên piçûk di xebatên wiha delal de xweş xuya nakin! Di nav rûpelên cildê yekem de carcaran hin wêne, îllustrasyon û gravûrên kevn jî çap bûne. Ev berhemên ku berî sedsalan hatine çêkirin cara yekem di çavkaniyên biyanî de hatine weşandin. Eger nivîskar û amadekara vê pirtûkê xwe bigîhanda kaniya van çavkaniyan -agahiyên destê yekem- wê gelek di cih de bûya. Lê belê divê ez li vir diyar bikim ku kêmasiyên wiha piçûk di her xebateke fireh de bivê-nevê derdikevin pêşberî xwendevanan. Ev kêmasî di çapeke nû û tekstên dîgîtal de paşê dikarin bên serastkirin. Di dawiyê de bi kurtî ez dikarim bêjim ku min ev çavkaniya li ser mijara dîroka muzîka Kurdî bi kêfxweşî xwend, gelek tiştên ku min berê qet nebîhistibûn ji vê pirtûkê fêr bûm. Hêvî dikim ku Zeyneb Yaş di vî warî de berhemên nû di pêşerojê de pêşkêşî me bike. Em dikarin ji niha ve mizgîniyekê bigihînin xwendevanan; wek mînak di rûpela 4an de tê gotin ku lêkolîna wê ya bi navê Mihemed Şêxo li ber çapbûnê ye!

Ala Kurd – III

# Ala hebûna gelê Kurd e

ABUZER BALI HAN



Di sala 1960î de Mîr Kamuran Bedîrxan ji Jemal Nebez re dibêje: "Ew Ala Kurdistanê di serdema peymana Sewrê û vir ve li ser tê axaftin. General Şerîf Paşa (eslê xwe ji Silêmaniyê ye û li Stenbolê û Stockholmê jiyaye) di peymana Sewrê de wî, Kurd bi wê alê temsîl kirine.

Mamoste Mehemed Qizilcî Turcanî heval û hevkarê Simko Axa bû. Wî li Urmiyê rojnameya "Rojî Kurd" weşandiye. Di salên 1950î de Mamosteyê Koleja Şerîetê Îslam li Bexda bû û tim dihatiye dikanê hostad Beşîr Muşîr. Ez jî carinan beşdarî waneyên wî dibûm û min jî guhdariya dersan dikir. Carekê mamoste got, ew al di serdema Simko de li Rojhilatê Kurdistanê hebû. Qizilcî direjî da gotinên xwe û wiha got: "Dr. Ezîz Zendî (Bokan) di sala 1937an de "Komelê Azadîxwazî Kurdistan" li Rojhilat çêkir. Ew komel piştî çend salan têk çû. Ala Kurdistanê li cem Ezîz Zendî bû. Piştî wê, Ala Kurdistanê ket destê komeleya bi navê (J.K.). Weneyê xor tenê li ser kovara wan a bi navê "Niştîman" hebû. Wan nedizanîn wê komara Kurdistan bi zûyî çêbibe. Lê komar çêbû. Paşê ew xor û rengên sor û spî û şîn bûn bingeha Ala Kurdistanê. Li pêş çil sal bere, em li Ewropa dicivîn, di semîner û Newrozan de ew al her dem dadinan.Di wan demên borî de kesên Kurd ku xwe pêşverû, çepajo didîtin dema me ew ala pîroz radikir û şanî wan dida, wan bi me henek û siqefên xwe dikirin. Lê herkes îro dibîne ku Ala Kurdistanê bi fermî û bi teybetî bûye ala xelkê Kurdistan. Dem hatiye ku êdî Kurd hevûdu hembêz bikin û li hemû serokên xwe xwedî derkevin! Ji bo vê jî yekîtiyeke netewî ji Kurdan re şert e ku Kurdistan jî wê demê ava bibe û ala Kurd li çiya û baniyên Kurdistanê pêl bide...

**Hin gengeşî li ser Ala Kurd**

Ala hebûna gelê Kurd e.

Kurdnasê xoşewist İsmail Beşikçi, wî ji bo pêkhatina yekîtiya Kurd û Kongreya Netewî gotibû: "Mercê yekemin ew e; Ala Kurdistanê ya dîrokî pêwist e ku hemû partiyên Kurd wê bipejirînin û li wê xwedî derkevin!..."

Berpirsiyarekî YNK Dr. Berhem Salih dibêje: "Ez hêvîdar im ku Kurdistan dê azad bibe û Ala Kurdistanê dê di nav alên BM (Netewên Yekgirtî) de pêl bide! Dîsa ez hêvîdar im ku Kurdistan wê azad bibe! Ew ê wek dewleteke serbixwe bigîhêje armanca xwe. Ji bo wî niştîmanî û wê alê li dijî terora dagirkeran şerên dijwar qewimîn û kedên mezin hatin dayîn!"

Elî Qazî dibêje: "Tarîxa 17ê Berfenbara 1945 an ji bo Kurdan girîng e. Di rojeke wisa de komek xortên welatparêzên Kurd, Ala Kurdistanê li bajarê Mahabadê li ser banê dadgehê daçikandin. Parlementoya Heremî ya Kurdistanê sala 2009an, 17ê Kanûnê, ew roj -Roja Ala Kurdistanê- ragihandin."

Cara yekem e ku Dewleta Kurd ya Federal, ew ala ku ji Komara Mahabadê diyarî mabû, ew rakirin banî û li pêş çavên hemû cîhanê danîn! Gelo kîjan Kurdê dilsoz dikare bêje: "Ez vê alayê ji bo Kurdan napejirînim? Ma dem, ew dem e? Ma ew dibe sedem ku mirov xwe ji civîneke wisa şûn de vekişîne?!. Bi zanîn, an jî bi nezanîn karê neyaran hesantir kirin û dubendî di nav tevgera azadîxwaz de derxistin, ew ne karê mirovên çak e!..

Kurdan di nav xwe de şerê birakujî rakirin! Niha dor hatiye yekîtiyê. Yên dubendiyê dixwazin, pêwist e ku ew ji xwe şerm bikin!..

Dewletên dagirker vala ranewestîne! Ew dixwazin, Kurdên aqilê xwe sivik, wan di nav karên Kurdan yên girîng de bi kar bînin! Lê ez bawer dikim ku Kurdên wisa hêdî di nav Kurdan de hindik mane. Tu kesê ku bibe maşeya dest neyaran, pêwist e ku hêdî di nav Kurdan de nemîne!..

Roj hatiye ku Kurd bi yek dengî bi hev re bêjin: "Bes e bindestî, bijî biratî! Em koletiyê naxwazin! Em azadiyê dixwazin! Gelo dema ku xwesteka hemû Kurdan ew be, kîjan Kurdên bê aqil dixwazin ku derveyî van xwestekan bisekinin, an jî li dijî van xwestekan Ala Kurdistanê bikin mijara gengeşiyê û xwe ji konferans û komcivînan vekişînin! Kurdan ji têkoşîna xwe ya hemdemî ezmunên baş girtine. Roj êdî hatiye ku ji wan dersan sûd wergirin! Ew jî dikeve ser milê hemû rêxistin, sazî û mirovên niştîmanperwer...

Ji bo hemî Kurdan roj roja biratî û hevkariyê ye! Kurd heya roja îro tu caran wekî îro nêzîkî azadî û serxwebûnê nebûne. Ew jî bi saya çênebûna şerê birakûjî û navxweyî ye. Bi piştgirî û hevkariyê, Kurd dikarin Kurdistanê azad bikin. Vê carê dem hatiye. Kurdistan dê çêbibe!..

**Çavkanî:**

1) Ala Kurdan û ya Medan, Karîm Zand, Ozgur polîtîka, Elmanya, 18.02.2004
2)National Flag of Kurdistan, by: Dr. B. A. Eliasi, and Prof. Mehrdad Izady
3) Hawar (1932-1943), No: 9, 30 Îlon 1932
4) Hawar, Kovara Kurdî-Revue Kurde, kurdiş Journal, Nos.24-57
Damascus (Şam)/Syria, 1975
5) Komara Kurd Ya Mahabadê, William Aegleton, Weşanên Koral, Stenbol, 1962
6) Dema Nû, 21 Tîrmeh 2005 / Diyarbakir (Amed) hejmara 111
7) Ala Kurdistanê, A. Balî, Pena Kurd



FIRAT CEWERÎ

## Bîranînek min û Mehmed Uzun

Min û Mehmed Uzun di sala 1981ê de hevdunas kir û em tavilê bûn heval. Hevaltiya me heta wefata wî dewam kir. Gava me hevdu nas kir, wî hê sih nekiribû, ez jî nû bi ser bîstî ketibûm. Bi zimanê îro em hê xort bûn, lê me barên giran hilgirtibûn. Di sala 1984an de min ji Stockholmê bar kir bajarekî bi navê Karlstad, lê Mehmed Uzun li Stockholmê ma. Têkiliyên me bêyî navbir berdewam bûn. Em bi hev re li ser her tiştî dipeyivîn, me her tişt bi hev re par ve dikir. Em carina li ser siyasetê, carina li ser edebiyatê, carina li ser evînê dipeyivîn. Carina jî me siyaset, edebiyat û evîn di nav hev de distira û me nikaribû ji nav derketana. Di demek weha de, Mehmed Uzun telefonî min kir. Hinekî aciz xuya bû. Ji ber evînekê dilê wî şikestibû. Dixwest em seriyekî ji Swêdê herin welatekî din. Digel ku karê min hebû jî, min dîsa ew neşikand. Min got em seriyekî biçin Qibrisê. Kêfa wî hat. Me li hev kir û piştî hefteyekê me xwe li Qibrisê danî. Min di ber dilê wî da. Hêdî hêdî bi ser xwe ve hat. Em bi rojan ji sibehê heta danê êvarê diketin behrê, me xwe li peravê li ser qûma hûr dirêj dikir, êvaran jî em vedigeriyan otelê, me serê xwe dişuşt, kincên xwe li xwe dikirin û me xwe berdida nav kuçe û kolanên bajêr. Bi rojan bajar bêdeng û aram bû, lê êvaran geş dibû, bi dev re dibû. Bi gelek zimanan dihat peyivandin, mirovên gelek welatan têkel dibûn. Meyxane û restorantên bajêr bi dev re mişt dibûn. Bajar radibû çargaviyê. Min û Mehmed Uzun jî xwe berdida nav wê coşiya bajêr, em diketin nav wê pêlê û li ber diçûn. Lê em tavilê li xwe vardiqilîn, me xwe diavêt quncikeke bîraxaneyekê, me ew coşiya ku bajar dagir dikir jibîr dikir û em li xwe vedigeriyan. Mîna ku me ew jiyana xweş û geş heq nekiribe em dadigeriyan ser xwe û welatê xwe û me bi saetan li ser sohbet dikir. Me li ser masê Kurdistan ava dikir û dîsa xera dikir. Rojên me, li Qibrisa Yunanistanê bi wî awayî dibuhurîn.

Em rojekê ji xwe re derketin tûra bajêr û paşê gava me dît perên me nemane, em dageriyan bankê da ku em perena biguhêzin. Karmendê bankê ji bo guheztina peran paseporta me xwest, lê me herduyan jî paseportên xwe li otelê hiştibûn. Me kir û nekir wî bêyî paseport pere neguhestin. Em bi acizî ji bankê bi dûr ketin û me di ber xwe de têra xwe jê re çêr û sixêf kirin.

Me rast berê xwe da otelê da em ji bo guhastina peran paseportên xwe bînin. Em zêde li otelê neman, hema me rahişt pasaportên xwe, em derketin û çûn eynî bankê. Em li eynî bankê ketin eynî dorê. Zû dora me hat. Me vê carê kronên swêdî digel pasaportên swêdî dirêjî mêrik kirin. Digel ku pasaportên me ên swêdî bûn jî dîsa wî pirsî bê eslê me ji ku ye. Tu nemabû ez pê re hêrs bibûma û min bigota tu jî wek polisên tirka li me dikî. Lê min hêrsa xwe daqurtand û min got em kurd in. Mêrik bi dengê bilind kêfxweşiya xwe anî zimên û çend caran li ser hev uzra xwe ji me xwest ku wî bêyî paseport perên me neguhastine. Wî got, heke min zanîbûya hûn kurd in, pasaport ne lazim bû. Wî em keremî hundir kirin û ji me re çay û qahwe xwest. Mîna ku çav li xwediyên xwe ketibe, pir kêfxweş xuya bû. "Hûn kurd qenc in, hûn mirov in, lê hûn jî wek me di bin zilma hovan de ne" got û her xwest dilê me xweş bike. Em tibabekî li ba wî rûniştin û me têra xwe sohbet kir.

Êvarî, min û Mehmed Uzun li balkona otelê maseya xwe raxist, uzoya xwe vekir û hinek çerez danîn kêlekê. Em ê roja piştî wê vegeriyana Swêdê. Em di hefteyekê de têra xwe qemer bûbûn. Mehmed Uzun dîsa wek hertim dosyaya xwe ya romana Siya Evînê anî û danî ser qorziyeke masê. Ew bi wê romanê radiza, bi wê radibû. Wî xwe carina dixist dilqê Memduh Selîm beg. Carina jî digot, em jî wek Memduh Selîm, Celadet Alî Bedir-Xan û Îhsan Nûrî Paşa ne. Lê berî em derbasî ser romana wî bibin û ew bi deng ji min re bixwîne û ez jî fikrên xwe jê re bibêjim, em li ser helwesta karmendê bankê ketin sohbetê. Me li ser gotina "dijminê dijminê mirov dostê mirov e" demeke dirêj sohbet û analîzên sosyolojîk û psîkolojîk kirin.

# Çend Rojnameyê Xeta Başûrî û Kirmanckî

MUTLU CAN

Bêguman nuştişê kirmanckî de cayê kovaran û rojnameyanê kurdkî ke welat, Tirkîya û Ewropa de vejîyayê, muhîm o. Nê weşanî bîyê zemînê nusîyayîş û pawitişê lehçeyanê kurmanckî û kirmanckî. Ma ke ewnenê vînenê ke serranê 2000î ra pey averşîyayîşê weşangerîya perîyodîk yê kurdkî aver şîyo, tena hûmarê kovaran û rojnameyan zêde nêbîyê hetê muhtewewa, zeftewirî û teknîkî ra zî mesafeyêko pîl ameyo qetkerdiş.
Nê averşîyayîşî ra girêdayê cayê lehçeya kirmanckî bîyo gird, hûmarê nuştoxan û tewirê nuşteyanê kirmanckî vêşî bîyê. Şima do cêr ra çend rojnameyê ke 2000î ra pey Ewropa û Tirkîya de ameyê weşanayîş û xeta Kurdîstanê Başûrî de weşan kerdê bivînê. Amancê ma oyo ke şima derheqê nê rojnameyan de tayê agahîyan bigîrîn; muhtewaya înan de çiqas ca dîyayo kirmanckî?, berpirsîyarê înanê beşê kirmanckî kam ê? Tede kam-kamî nûşto? ... xulasa cewabanê persanê winasîyan bimusîn.




Ma ke ewnenê vînenê ke serranê 2000î ra pey averşîyayîşê weşangerîya perîyodîk yê kurdkî aver şîyo, tena hûmarê kovaran û rojnameyan zêde nêbîyê hetê muhtewewa, zeftewirî û teknîkî ra zî mesafeyêko pîl ameyo qetkerdiş. Nê averşîyayîşî ra girêdayê cayê lehçeya kirmanckî bîyo gird.

**Peyama Kurd**

Hûmara yewine ya Peyama Kurdî 17.09. 2004 de weşanîyaya. Rojnameyêko hewteyane yo. Bi ziwanê kurdkî (kurmanckî-kirmanckî-sorankî) weşan kerdo. Manaya çekuya peyamî mesaj o û merkezê rojnameyî Bonn (Almanya) o. Hema-hema her hûmara rojnameyî de di rîpelî bi kirmankî vejîyayê. Nuştoxê ke tede hîna zaf nuşteyê înan ameyê weşanayene nê yê:

C. Zerdeşt Pîranij, Ehmedê Dirihî. Gawanê Welatî, Hespî Aydın, İrfan Kaya, M. Selîm Mûrad, Mahmut Arif Ayçiçek, Munzur Çem, Orhan Zuexpayij, Roşan Lezgîn, Selîm Çürükkaya, Seyîdxan Kurij

Rojnameyê Peyama Kurd ke edîtorê beşê kirmanckî Seyîdxan Kurij bîyo de tewir bi tewir nuşteyî weşanîyayê. Rojnameyê kurdkî ke Ewropa de vejîyayê, înan mîyan de êyê ke bi hawayo biîstîqrar û sewîyeya muhîm de ca dayo lehçeya kirmanckî, înan ra yew o. Pêro-pîya 96 hûmarê Peyama Kurd vejîyayê. Çend taybetîyê muhîmî yê rojnameyî wina yê:

Rîpelanê kirmanckî de ge-ge bi hawayo kilmî qewimîyayîşê aktuelî û xeberî dîyayê. Çend nuşteyê Mahmut Arîf Ayçîçek, Orhan Zuexpayij û M. Selîm Mûradî ke derheqê tarîxê ma yê nêzdî de yê û tede portreye muhîmî dîyenê şinasnayîş muhîm ê. Ancîya roportajê ke hetê Seyîdxan Kurijî ra ameye kerdene bale ancenê.

**Rûdaw**

Rojnameyê Rûdaw ke hûmara ey a tewr verêne temmuza 2009î de ameya weşanayîş. merkezê ey şaristanê Koln (Almanya) o. Herçiqas tay bo zî hema-hema her hûmare de ca dayo lehçeya kirmanckî. Goreyê zanayîşê ma tewr tay 218 hûmarê nê rojnameyî vejîyayê. Nuştoxê ke Rûdaw de nuşte, nameyê çendê înan nê yê: Malmîsanij, İsmail Beşikçi, İsmet Siverekli, Roşan Lezgin, Hudai Morsümbül, Hesê Bele, Hesen Çakır, Xezala Şarikî, Sidqî Hirorî (kurmanc), Wehdet Siwanij, Murad Canşad.

Rojnameyê ke tede kunciknuşteyê (köşe yazısı) kirmanckî bi hawayo sîstematîk weşanîyayê zaf tay ê. Rûdaw yewê înan a. Eke ma bi hawayo spesîfîk biewnê rojnameyî ra di çî bala ma anceno; înan ra o verên nuşteyê Dr. Îsmaîl Beşîkçî yê. Rûdaw rojnameyo verên o ke nuşteyê birêz Beşîkçîyî çarnîyayê kirmanckî ser û tede weşanîyayê. (Hûm. 20, 21, 22, 55) O dîyin yew nuşteyê Sidqî Hîrorî (kurmanc) yo ke sernuşteyê ci Sultan Sehak (1272-1388) o. Herçiqas kurmanckî ra ameyo açarnayîş zî kirmanckî de nuşteyo yewin o ke babeta xo bawerîya Yaresanîzm o. (Hûm.: 34)

**BasNûçe**


No rojnameyo ke bi ziwanê tirkî û kurdkî (kurmanckî-kirmanckî) weşan kerdo, hûmara ey a yewine gulana 2014î de vejîyaya. Weşanê ey hetanî hûmara 125. a ke teşrîna peyene ya 2016 de vejîyaya dewam kerdo. Da-vîst hûmaran ra teber heme hûmaranê BasNûçeyî de ge-ge yew ge-ge zî di rîpelî bi kirmanckî vejîyayê. Muhtewaya nê rojnameyî de 150î ra vêşêr nuşteyî ke tewiranê cîya-cîyayan de ameyê nuştiş ca gênê. Rojnameyê ke serra 2000î ra pey dest bi weşanê xo kerdê, înan mîyan de çend rojnameyê ke bi hawayo sistematik ca dayo lehçeya kirmanckî ra yew o.

Rojname de nuşteyê nê kesan ameyê weşanayene: Abdulhemîd Yûsif, Akman Gedîk, Alî Aydin Çîçek, Aydin Batur, Bedrîye Topaç, Bîlal Zîlan, Çeko Kocadağ, Ehmedê Dirihî (Ahmet Kasimoglu), Hebûn Okçu, Îlhamî Sertkaya, İsmet Sîvereklî, Kazım Çetinkaya, Lerzan Jandîl, M. Emîn Kaçan, Miraz Babij, Muhamed Batur, Murad Aygun, Murad Canşad, Mutlu Can, Müjdat Gîzlîgöl, Nadire Guntaş Aldatmaz, Necîbe Kirmizigul, Pêşar Bextewar (Mutlu Can), Qefîr Bêkes, Rinde Becerîklî, Roşan Lezgîn, Serdar Bedîrxan, Şeyda Asmîn, Welat Amedî, Welat J.Mîyanroyan, Welat R. Ramînazad, Wisif Zozanî, Yado Kirdone, Zelal Gündüz, Zelal Mevlutoglu

Ma reya verêne nê rojnameyî de vînenê ke yew nuştoxa cinîye wextêkê derg de û bi hawayo biîstîqrar kunciknuşteyî nuştê. Na nuştoxe Nadîre Guntaş Aldatmaz a ke eynî wext de kirmanckî de tezê masterî yo tewr verên nuşto. Ancîya manaya yew roportajî ke BasNûçeyî de ameyo weşanayîş pîl a. No roportaj hetê Mutlu Canî ra fermandarê pêşmergeyan Saît Çurukkaya reyde ameyo kerdene. (hûm. 123) Seke yeno zanayîş Çurukkaya bi xo kirmancanê/zazayanê Çewlîgî ra bî û nê roportajî ra demekê kilmî dima; demo ke operasyonê raxelisnayîşê Mûsilî de wezife kerdêne teqayîşê bombayêk ver şehîd kewtbî. Kirmanckî de roportajê ke babetê xo xeberê/qewimîyayîşê aktuel ê zaf-zaf tay ê. Hem no hem zî bêguman roportajo tewr peyên o ke şehîd Saît Çurukkaya reyde virazîyayo, nê di xususî ehemîyetê nê roportajî zêdnenê.

## Tarîx, Seyahat û Edebîyat

Gustave Flauberto ke bi romanê xo Madame Bovary romannuştoxanê girdan yê dinya mîyan de ca girewtbî mabênê 1849-1851î de Rojhelatî ra gêraybî. Doğu'ya Yolculuk (Raywanîya Ver bi Rojhelatî) seba wendoxanê ewroyinan hem belgeyêko tarîxî hem zî seyahatnameyêko zengîn o. Flaubert Çemê Nîlî ra çar û nem aşmî de vîyarto û Fransa ra vejîyo rayîr. Uca ra şîyo Misir, Sûrîye û Fîlîstîn ser ra derbazê Anadoluyî bîyo, Îzmîr û Îstanbulî ser ro vîyarto Yunanîstan û axir resayo Îtalya. Claudine Gothot-Mersch ile Stéphanie Dord-Crouslé ke pisporê Flaubertî yê, eser bi notan û edîsyonê înan tirkî de reya verêne vejîyo û hetê Sel Yayıncılıkî (Weşangerîya Selî) ra ameyo çapkerdiş.



## Mesajê Referandumê Xoserîye -III-

Referandumê Xoserîya Başûrî, tarîxê sîyasî yê dinya rê mesajê tarîxî yo. Çar parçe de kurdî, bi seserran marûze qetlîyaman, surgûnan mendî. Zaf dejî dîyê. La reyna zî heme prosesê nê qetlîyaman de mucadeleyê xo terk nêkerd. Xoverrodayîş baqî mend. Coka no referandum do bibo cewabê Enfal. Bibo cewabê Helebce, qetliyamê Gelîyê Zîlan. Wa bibo cewabê Newala Qesaba û Roboskî...

Ez zerrî ra hevî kena ke kurdî başûrî bi nîsbeto gird 'YA' vanê û rayîrê azadî akenê..

Kerem Sevînç
(Muzîsyen)

## Kemerê Tebîî û Faydeyê înan

**Îyolît:** Na minerale zêde nêna şinasnayîş. Halkerdişê problemanê psîkolojik û cefayan de, aktîfkerdişê fonksîyonanê mezgî, halkerdişê problemanê metabolîzma de, zêdînîyayîşê hêzê fîzîkî û ruhî de faydeyê na mînerale estê.

**Hematît:** Na kemere bîr û bawerîya (özgüven) merdimî xurt kena. Seba merdiman bena wesîleyê bextewerî, enerjîyê pozîtîfî, cesaret û performansê cinsî. Nîzamê herîkîyayîşê gonî tayîn kena û naye ra girêdaye tansiyon rê zî faydeyê aye esto. Vernîya rijîyayîşê porî gêna.

**Perîdot:** Wucudî ra eştişê toksînan de faydeyê na kemere esto. Leş û hişê (vîrê) merdimî notralîze kena. Hetê psîkolojîkî ra tesîrê ayê pozîtî benê. Vernîgirewtişê hîsanê sey poşmanîye, xosucdarvînayîş û obsesîfîyan de ardimkar a.

**Akîk:** Sey "Kemera/Kerraya bêmerg û Kerraya Yemenî zî yena şinasnayîş. Kemerena şîfayinan ra yew a. Pozîtîf enerjî dana merdimî. Nêweşîyanê cîldî rê faydeyê xo zaf o, Damaran kena bihêz, hêzê cinsî zêdnena. Vernîgirewişê nezer û stresi de rolê aye pîl o. Cesaret, bîr û bawerî û senkronîzasyonê merdiman aver bena. Esteyan, didanan, dejanê leşe rê rind yena.

**Ametîst:** Na kemere êyê ke nêrehetîya cîldî ancenê înan rê rind yena. Enerjîyê negatîfî merdiman ra dûrî fînena. Nêweşîyanê qelbî rê faydeyê ci esto. Atmosfero ke tede ya rê enerjîyêkê pozîtîf vila kena û merdiman ser o hîsê rehetîye peyda kena.

**Akumarîn:** Vera krîzanê psîkolojik û depresyonî zaf faydeyin o. Balansê tansîyonî temîn keno. Sîstemê muafîyetî (bağışıklık) keno hêzdar. Kesanê agresîfan ser o hîsê rehetî û sakînîye peyda keno.

**Sîtrîn:** Organanê sîstemê hemilnayîşî ser o tesîrê aye yo pozîtîf esto. Bitaybetî zî nêretîyanê made, cîgere (qeseba sîyaye), velke, roqila rê rind yeno.

**Sodalît:** Muhtewaya xo de sewîyeya berz de soda û kalsîyum estê. Damaran, hucreyan û organîzmayan ser o tesîrê xo pîl o. Aktîvasyonê lenfî, sîstemê hemilnayîşî û hormonan xurt keno. Tazyîqê gonî dano waro û desteg dano fealîyetanê qelb û aqilî. Vera nezer û fikranê negatîfan faydeyê xo esto. Merdimî keno sakîn û dejê sereyî rê baş o.



## Kombîyayîşê Grûba Xebate ya Vateyî yo 30. Virazîya

Kombîyayîşê Grûba Xebate ya Vateyî yo 30. 27.07.2017 de saete 9 de, Dihok de Hotel Jiyan de dest pêkerd. Kombîyayîşî 5 rojî dewam kerd, 31.07.2017 de qedîya. Grûbe na reye termanê şaredarîye ser o gurîya.

Nê 16 kesî beşdar bîy:

1. Ehmedê Dirihî (Çewlîg)
2. Ehmed Kirkan (Sêwregi)
3. Şukrî Urgun (Hêni)
4. Nureddîn Celalî (Çewlîg)
5. Heyder Diljen (Sêwregi)
6. Serdar Bedirxan (Pîran)
7. Huseyn Kulu (Dêrsim)
8. Cemal Polat (Çêrmûge)
9. Deniz Gunduz (Gimgim)
10. M. Selîm Uzun (Pali)
11. Îhsan Espar (Pîran)
12. M. Malmîsanij (Pîran)
13. Nadîre Guntaş Aldatmaz (Dêrsim)
14. Pinar Yildiz (Licê)
15. Zulkuf Demîrtaş (Pali)
16. Seyîdxan Kurij (Çewlîg)

Seke yeno zanayîş Grûba Xebate ya Vateyî 1996 de Swêd ronîyaya û a serre ra nata warê standardîzekerdişê lehçeya kirmanckî de xebata xo domnena. Grûbe naye ra ver 2006 de şîye Kurdîstanê Başûr, kurdanê hewramîyan pîya yew konferans viraşt û derbazê mintiqaya Hewraman bîye. (Seba ke derheqê nê konferansî de melumat bigîrîn biewnîn Espar, J. Îhsan; "Konferansê Kirmanckî û Hewramkî", Vate: kovara kulturî, dewreyê diyine, hûmare: 7 (27), Îstanbul, Payîz 2006, r. 4-9)



## Heyderê Keça ra Di Şîîrî

**Erê Gule**

Erê Gule ti nata be
To ra hes kena ti înam be
Dûrî meşo ti nêzdî be
Bipersê halê mi hîn be.

To ra dot nêvînen kora
Meke mi binê sonda ra
Hes kena ez zaf to ra
Ti çila zere çiman a.

Bejna to zê serno sem a
Hunerê to hecayê dinya
Rindîya to ez her roj vana
Eslê to hewl cawo xas ra.

Bê to ez cêrena zere de
To ez caverda wertê sere de
Non û hesira mi têwertê de
Rew racêre Heyderî ser de

**Erê Rinde To ra Vana**

Erê rindê to ra vana
Pîla endî ti azeb a
Maya mi nêzana ti kam a
Vace ez veyva çê şima na.

Rindê êna hurdî hurdî
Çim sîyaye burî qelemî
Por munito bijangî derge
To de estê zaf hunerî

Şîrina mi ama zerê
Xelîya ma eşta xo sare
Rindê êna aşmo sere
Veng çin o bîya kerre

Heyderê Keça



# Dûhok de Kombîyayîşê Grûba Vateyî

**SEYÎDXAN KURIJ**

Ma sey Grûba Xebate ya Vateyî kombîyayîşê 30. Kurdîstana Başûrî de bajarê Dûhokî de viraşt. Kombîyayîş 27.07.2017 saete 09.00 de dest pêkerd û 31.07.2017 saete 17.00 de qedîya.

Tayê embazî ke welat de û êyê ke Ewropa de manenê cuwa ver bi teyara şîyî Hewlêr û uca ra şîy Dûhok. Ez û çend embazî zî ma bi otobuse berê Îbrahîm Xelîlî ra şîyî. Seke ma tersayene o qayde zehmetî çin bîye. Ma berê gumrikî T.C ra zî yê Kurdîstanî ra zî zaf rehet, bê problem derbaz bîyî.

Embazê ke cuwa ver şîbîy, ê yew roje şîy Laleş zîyaret kerd, yew roj zî şîy Barzan, qebrê Mistefa Barzanîyê bêmergî ser. Mi zaf waştênî ke ez şêrî Barzan, xususî qebrê Barzanîyê bêmergî zîyaret bikerî. La çi gune na rey ez nêeşkaya. Înşalah hîna rey.

Ma Dûhok de Hotel Jîyan de mendî. Hotel Jîyan standardanê Ewropa de yew Hotel a. Ez 1994 de zî na hotel de mendbîya, la o wext hema înşaat bî. Ma wayîrê keyeyî rê zaf-zaf spas kenî. Ma 17 kesî bîy. Her kesî rê yew Swît Oda abirnîyaybi. Werd, xizmet û luks rê yew vateyê ma çin o. Hewza Hotel zî bîye, ma serê sibayî/şewdirî kewtênî awe, no germ de sere sibayî ajna kerdene zaf hol ameyênî.


### Rojê ma yê Dûhokî

Taye embazî 7 rojî, tayê embazî zî 5 rojî mendî Dûhok de. Ez 5 rojî menda. Ma hema-hema her şan şîyeni suka Dûhokî, ma suk ra gêraynî, ma kafeyan de ronîştênî, embazan çî-mî herinayêni. Mi zî kenaya xo rê kincê kurdan û embazanê xo rê xelatî girewtî. Çîyo ke bala mi ante, suk zaf qelabalix bî, her wext yew hereket estbî, yew candareyî bî, keyfê dikandaran hol/baş/rind asayênî. Ma hîna zaf suka kehene ra gêrayî. La Dûhok çend rey suka kehen ra bîya gird.

Ez reya verêne 1994 de pa 3 ciniyan şîya Dûhok. Înan ra 2 cînî alman bîy. O wext Kurdîstan newe azad bibî. Iraq ser o amborgoyê yewbîyayê neteweyan (UNO), Kurdîstan ser o zî amborgoyê Îraqî estbîy. Pero bîn ra zî Tirkîya cereyan birnaybî. Kurdîstan, bi taybetî zî Dûhok mîyanê tarî de bî. Sey çarşî tena suka kehen estbî. Ez reyna 2005 de Dûhok ra vîyarta şîya Silêmanîye û Hewlêr ra Dûhok ser ro agêraya, ameya berê Îbrahîm Halîlî.. Ez bajar mîyan ra vîyarta. Sey heme bajaranê Kurdîstanî Dûhok zî ne 20 serran de çend qat bîyo gird. Dûhokê 1994î Dûhokê ewroyin het de sey yew dewe bî. Bajarîbîyayiş û verdeşîyayişo ke neteweyanê bînan 50 serran de ardo ca, kurdan 10-15 serran de ardo ca. Ê parkî ke, ê merkezê rotiş– hêrînayîşî ke Dûhok de estî, zafê bajaranê Ewropa de çîn î. Çîyo ke zaf bale mi ante, zafaneyê parkan de semedê qicana/domanan cayê kaykerdişî estî, şar pa cînîyan û domananê xo ya şino seyrangehan. Wina yew cûya bihereket, bişenayî bitaybetî semedê ma yê ke Ewropa ra yenî, zaf weş ameye. Çarşîyanê modernan de hîna zaf erebî estbîy, yanî ereban çî-mî hêrînayênî. Wina aseno ke erebî Kurdîstan sey yew cayo emnîyetin vînenî, o rid ra yenî Kurdîstan de çî-mî hêrînenî.

La merdim ganî vajo ke Dûhokê kehenî de problemê binawanî (infrastruktur) sey kanalîzasyon ûêb. estî. Ganî şaredarî nê problеman çareser bikero.





Dûhok

> No kombîyayiş de ma termanê şaredarî/beledîya ser o xebitîyayî. Yanî termê ke şaredarîye de yenî şuxulnayîş, ma goreyê yew lîsteyê tirkî, kirmanckîya nê terman tesbît kerdî.

### Derheqê Xebata Grûba Vateyî de

Êyê ke nas nêkenî, ez semedê nê wendoxan bi kilmî behsê xebata Grûba Vateyî bikerî. Grûba Xebate ya Vateyî reya verên 1996 de ameye pêser, la 1997 de qerarê dewam kerdişê na xebate û vetişê kovara "VATE" gîrîya. O wext ra nat ma her serre de yew rey yan zî di rey yenî pêser û semedê lehçeya kurdkî ya kirmanckî xebate kenî. Ma serranê verênan de Ewropa de hîna zaf Swêd de kombîyayişî xo viraştênî, la nê serranê peyênan kombîyayîşê Grûba Vateyî welat de, hîna zaf Dîyarbekîr de bîyênî.

No kombîyayişo 30. bi. Nika Dîyarbekîr de û Bakur de şertê viraştişê kombîyayişê Grûba Vateyî nêmendî, naye ra bi ardimê dezgeyanê Kurdîstanê Azadî, ma no kombîyayiş Dûhok de viraşt.

Ez wazena bi kilmî xebata Grûba Vateyî ser o melumat bidî wendoxan. Na grûbe seke awan bîya o wext ra bîyo tena ziwanî ser o kar kena. Hedefê na xebata standardîzêkerdişê kirmanckî yo. Ma wazenî yew ziwanê nuştişî, ziwano ke bi ey merdim bieşko yew edebîyato modern bîyaro orte, awan bikerî. Naye ra ma verê cû hîna zaf rastnuştiş, gramer û tayê nameyanê xususîyan ser o vindertî. Nika ma hîna zaf tesbîtkerdişê terman, yanî termînolojî û hedrekerdişê ferhengî ser o xebitîyênî. Grûbe heta nika zaf wareyan de termî tesbît kerdî. Sey mîsal termê edebîyat, huqûq, cografya, nameyê nêweşîyan, çîçekan, heywanan uêb. No kombîyayiş de ma termanê şaredarî/beledîya ser o xebitîyayî. Yanî termê ke şaredarîye de yenî şuxulnayîş, ma goreyê yew lîsteyê tirkî, kirmanckîya nê terman tesbît kerdî.

Grûba Xebate ya Vateyî heta nika 52 hûmarê kovara Vateyî weşanayî û weşanxaneyê Vate her ware de (roman, hîkaye, şîîr, sanike, fiqra, folklor) kitabî çap kerdî. Na grûbe emser yew musabeqaya şîîr û hîkayeyan viraşte û xelatî dayî kesanê serkewteyan.

### Referandumê 25 Êlule

Ez wexto ke hama nêşibîya Kurdîstan zî, mi referandumê 25 Êlule yê semedê dewletbîyayîşê kurdan, yê xoserîya Kurdîstanî taqîb kerdênî. Goreyê tehmînê mi gereka vengê belê (erê) zaf bivejî. Çi heyf ke Kurdîstan de şîrketê cîpersayişê fîkrêpêroyî çîn î, eke estê zî mi bi xo nêeşnawitî. O rid ra merdim nêşkeno yew tehmîno objektîf bikero. Mi ne 4 rojan mîyan de wina yew mînî perskerdiş (anket) viraşt. Ez ge-ge esnafan ra, ge-ge cadeyan ser o xortan ra, merdimanê pîlan ra, şoforanê taksîyan ra persaya. Ez raştê kesî nêameya ke vajo "na/ney". Zafê kurdan hema ca de vanê reya ma " erê/ya" ya. Taye însanî ecêb manenî ke senî merdim eşkeno wina çî pers bikero. Sey mîsal ez cadeyî ser o çend xortan ra persaya, înan ca de va, "Tabî ma vanî erê, erebî dişmenê kurdan î, ma senî vajî na?". Reyna mi cadeyî ser o çend merdiman ra pers kerd, înan ca de va, "kam vajo "na", o kafir o". Yew taksîramitoxî va, "serek vano, ma her rayîr ceribna, bê xoserîye yewna rayîr nêmend".

Mi şûbeyê Dûhokî yê Sendîqaya hûnermendan zîyaret kerd. Mi uca de çend hûnermendan de sohbet kerd. Înan zî hemeyan tê fekra va, helbet reya ma "erê" ya.

Ganî merdim nayê zî vajo ke tayê însanî îdare ra memnûn nîyî. Tayê karmendan û pêşmergeyanê teqawutan çend aşmî yo ke meaş nêgirewto. No demo pêyen de tayê problemê aborî estî. Helbet şar nê problemen ra Hukmatê Kurdîstanî berpirsîyar vîneno. La ancî zî nê merdimî zî nêvanî "na". Nê însanî îdare ra lomeyî xo kenî, la dima zî "ma vera xoserîya Kurdîstanî, vera dewletbîyayişê Kurdîstan nîyî" vanî.

# Derheqê Tradîsyonê Fekkî, Kultur û Edebîyatê Şarî de Çend Mûlahazayî

**NEWZAD VALÊRÎ**

Verê cû qal/vate bibi, dima nuştiş peyda bi. Merdimî (însanîyet), kamcayê dinya de beno wa bibo reya verêne bi qal/vatiş xo îfade kerdo û tarîxê zaf xorî ra heta nikayî zî yew tradîsyono fekkî (oral, şifahî) awan bîyo. No tradîsyon verê îcadbîyayîşê nuştişî de yew hewceyîyê mecbûrî bî, heto bîn ra zî kulturê nuşteyî rê bingeyêk awan kerdibi.

### Tradîsyonê Fekkî

Tradîsyonê fekkî mîyanê tarîxê însanîyetî de hetêk ra awankerdişê edebîyatê fekkî de rol gêno hetêk ra zî zereyê kulturo fekkî de mabênê demo vîyarteyî û demo ameyoxî de sey yew pirdî wezîfe îfa keno. Coka tarîxê însanîyetî verê bi vatiş dest pêkerdo û dima ra bi nuştişî, seranserê dinya de xorînîya zemanî ra heta nika hîna dewlemend û hîna payîdar berdewam keno.


Sey miletanê bînan, edebîyat û şîîra kurdan zî xora bi tradîsyonê fekkî, sey şaxê kulturo fekkî dest pêkerdo û ewro zî kişta edebîyatê nuştekî de bi nameyê xo yo bînî; "anonîm" cuyeno. Ma nê nuşteyî de mîyanê edebîyatê kirmackî de wayîrê damarêka qewetin/zixmin edebîyatê anonîmî ser o vindenê, tayê malumatî danê.

Mîyanê komelanê kurdan ra yew komel zî kirmanc ê û kirmancî xorînîya tarîxî ra heta nê demî sey komelê kurdanê bînan bi ziwanê xo yew edebîyatê şarî awan kerdo ke awanbîyayîş, averşîyayîş û esasê nê edebîyatî, tena seba folklor û edebîyatî ney, warê tarîx, antropolojî, sosyolojî de, bi îfadeyo pêroyî seba kulturî zî wayîrê zaf ercî yo, qiymetin o. Coka ma çendin nê kulturê fekkî û edebîyatê şarî nas bikerî ma hende kamîya kulturê xo zî hîna baş fehm kênî.

### Tradîsyonê Fekkî û Kultur

Gama ke edebîyatê dinya bêro tehlilkerdiş ma vînenê ke edebîyatê pêro miletan bi vateyê Walter J. Ongî demê teşekûlê "kuturo fekkî yê yewine (birincil)/eslî" ke verê kulturê nuştekî de bingeyê ziwanê qiseykerdişî ser o ronîyayî destpêkeno. Bade cû sey prosesanê "ezberkerdene", "hiş/vîr de nimiteyine", "bedilnayene", "qalibkerdene" û "vîrardene" bingeyê kulturê nuştekî rê zemînêk awan beno.(1)

Kulturo fekkî verê kulturê nuştekî, bi hezaran serrî verê cû destpêkerdo û heta nika ciwîyayo û nika zî bi taybetî bajaran ra dûrî cayanê sey dewan, mezrayan de estbîyayîşê xo domneno. No kultur ewil bi fekkî destpêkerd, cuwa pey zerêyê zemanî de averşîyayîşê naturalê xo de beno wayîrê yew tradîsyon û bi nê tradîsyonî demê verênan ra heta demo nikayin ciwîyeno.



Edebîyatê şarî ke çaxê kulturê fekkî de awan bîyo hem kulturê nuştekî rê beno çîme hem zî rolê rayîr-akerdoxê/amadekerdoxê edebîyatê klasîk û moderni kay keno. Kurdan de zî wazena wa lehçeya sorankî û kurmanckî wazena wa hewramankî û kirmanckî de bo seruvenê vîyartîşê edebîyatê fekkî ver bi edebîyatê nuştekî çarçewaya tayê prosesan de muşaxas beno (virazîyeno). Edebîyatê şarî kişta hedrekerdenê edebîyatê klasîk û modernî de ancî xeylêk deman sey yew demara arterî yê esasî (ana arter damar) estbîyayîşê xo domneno.

Gama ke ma bizanî mîyanê kurdan de, yê ke destpêkerdişê edebîyatê nuştekî de tewr ereymendeyî kirmanckî, estbîyayîşê edebîyatê şarî seba kirdan hîna sey yew çimeyêko eslî û cîdî ca gêno. Seke yeno zanayîş edebîyatê nuştekî de estbîyayîşê metnê verênî encax heta serranê 1850î şino (2) û reyna tarîxê edebîyatê klasîk seserra cuwa ver nêşino.(3) Destpêkerdîşê edebiyatê modernî zî serranê 1970î de ronîyeno. (4)

### Edebîyatê Fekkî / Şarî

Edebîyatê fekkî yan şarî, hetê awanbîyayîş, averşîyayîş û şekil girewtişê wayîrê yew tarîxê xorînî yo û sewbîna bi tesîrê dewiran û şertanê cîyayan demo vîyarteyî ra heta nika ameyo. "Bi awayê pêroyî kurdan de edebîyatê fekkî zaf dewlemend o. Yew komel dewrê zext û zordarîya ke bi seserran dewam kerdo de semedê faktoranê sey hêrîşanê teberi ra xo pawitiş, koçberî, cuya feodalî, çinbîyayîşê perwerdeyê fermî ûsn. mîsyonê çimeyo eslî dano nê edebîyatî. (5)

Sey komelanê bînan yê kurdan (kurmanc, kird) kirmancan de zî erjê kulturî, edetî û bawerî, tecrubeyê cuye, hîs û fikirîyayîşê ferdî û neteweyî bi sayeyê tradîsyonê fekkî dem bi dem û nesil bi nesil hewilyayê (transfer bîyê) û ciwîyayê. Herçiqas bi hemparîye îcadkerdişê nuştişî no transferkerdiş û vilakerdiş bi unsuranê nuştekî û vînayeyî (image) virazîyayo zî, hema zî mîyanê cuya şarî de xo îfadekerdişê fekkî û mehsulê ey edebîyatê fekkî/şarî ganî yo û zaf wareyan de bi awayo aktîf ciwîyeno.

Edebîyatê kirmanckî yê şarî/anonîmî ke çarçewaya tradîsyonê fekkî de awan bîyo wazena wa kirmacanê ke ferdê cematê Rayê Heqî (Elewî-Oizilbaşan) bê wazena wa yê cematê şafîîyan (sunnîyan) bê her di komel/ware de kêmî yan zêde, kesanê cîya-cîyayan seba awankerdene û ciwîyayena nê edebîyatî kede sarf kerde. Bi yewna îfade; ne tena dengbêjî û hozanî, înan ra teber extîyaran ra heta xortan, camerdan ra heta cinîyan zaf kesî seba averşîyayîşê nê edebîyatê şarî/anonîmîyî wayîrê kede û rolî yê. Bitaybetî mîsyonê cinîyan ke edebîyatî ser bîyo/beno nêno înkar kerdene. Sey "sanik", "lawik", "lorî", "şîn" (şiware) zafê tewirê anonîmî fekê cinîyan ra ameyê vatene û tutî/domanî cara ewil pê sayeyê mayê xo înan dir bîyê şinasî.

Edebîyatê şarî yê kirmanckî de, sere de "deyîrî bi nameyanê xo yê bînan "lawik", "klam/kelûm" û "manî", "şîn" û sey "lorî" tewrê (çeşîd) cîyayîyan de cuya şarî, hîs û fikrê şarî sey babetanê eşq, merg, cuye, xerîbî, cîyabîyayîşî, şer, afat, koç usb. yeno ifadekerdene. Bi yew ziwano zelal û bi retorikê naturalî nê babetî şîîra anonîm de cayê xo girewtî.

Şîîra anonîm de çîyêko balkêş, nînan de estbîyayîşê ritim, aheng û muzîkalîte o. No meyan de Fuad Köprülü vano ke şîîra anonîm û muzîk pîyabesteyê yewbînan ê, yewbîn reyde eleqedar ê. Gama ke merdim biewno cuya hozanan, aşiqan û ma kurdkî de vajîme dengbêjan eserê înan ra bigîre heta îcrakerdişa înan û tradîsyona dengbêjî de ser ra heta cêrî tesîrê muzîkî xo eşkera keno. (6) Birastî lorî, şîn, manî ra heta deyîran her yew tewirê şîîra anonîm de pîyayî û hemahengê vate/qisey û ritim/melodî têhêt de ca genî.

Netîce

Kulturo fekkî, hetêk ra çîyê ke hezar serran verî ra yadîgar ê înan zerê xo de muhafeze keno û heto bîn ra zî bi sayeyê nînan kulturo nuştekî rê yew bîngeyo dewlemend awan keno. Ewro her çiqas kulturo nuştekî hakîm bo zî, mîyanê şarê ma de rol û mîsyonê kulturê fekkî û edebîyatê anonîm hema zî hîna erjayeyî yo û sey yew gencîyê (hazîneyê) nêkeşfbîyaye vinderte yo. Eke şaîr û nuştoxê kurdan nê mîrasê kulturî yê dewlemendî ra hîna baş îstîfade bikerî; no, seba edebîyatê nuştekî yê kurdkî çîyêko zaf qîymetîn o. Edebîyatê nuştekî nê mîrasê xorînî ser o zaf beno hêzdar û baldar.

> Mîyanê komelanê kurdan ra yew komel zî kirmanc ê û kirmancî xorînîya tarîxî ra heta nê demî sey komelê kurdanê bînan bi ziwanê xo yew edebîyatê şarî awan kerdo ke awanbîyayîş, averşîyayîş û esasê nê edebîyatî, tena seba folklor û edebîyatî ney, warê tarîx, antropolojî, sosyolojî de, bi îfadeyo pêroyî seba kulturî zî wayîrê zaf ercî yo, qiymetin o.

### Çimeyî-Notî:


1. Walter J. Ong, Orality and Literacy: The Technologizing of the Word, Methuen, Londra-New York, 1982, s.13-14.
2. Peter Ivanowiç Lerch, Forschungen ûber die Kurden und die Iranischen Nord-Chalder, St. Petersburg, 1858.
3. Biewn;. Ehmedê Xasî, Mewlid, Litoğrafya Matbaası, Dîyarbekir Vilayeti, 1899, r. 28 (Esero ke telîf a û bi destê kirdan nuşteyî ya verên; "Newlîdê Kirdî" (Mewlîdê Nêbî) bi destê Mela Ehmedê Xasî, serra 1899î de weşanîyayo. Cara ewîl Malmîsanij 1985î de transkrîbe bîyo û newera weşanîyayo.)
4. Tirêj dergisi modern edebiyata geçişin ilk örneklerine yer vermiştir. (Tirêj, İzmir, 1979, Sayı: 1)
5. Joyse Blau, Contes Kurdes, ed. Fleuve et Flamme, Paris, 1986, s.19-20.
6. M. Fuad Köprülü, Edebiyat Araştırmaları, Ötüken Yayınları, İstanbul, 1989, s.12.

## Weşanxaneya MORÎ:

# MORÎ dê her dem bo perwerdeya zarokan bixebite

GÖNÜL GÜN

Edebiyata Zarokan û materyalên perwerdeya zarokan, di têgêhiştin û pêşveçûna zarokan de girîng û taybet e. Ji bo edebiyata zarokan û materyalên perwerdeya zarokên Kurd jî hin xebat tên meşandin. Yek ji wan ên ku xebatan dimeşîne jî weşanxaneya Morî ye. Morî di 22ê Hezîrana 2016an de li Amedê hatiye avakirin û ji bo zarokên ku temenê wan ji 3 û heta 14an e pirtûkan çap dike. Her çiqas Morî di demeke nêz de ava bûbe jî pirtûkên cur bi cur çap kirine. Edîtoriya weşanxaneya Morî derbarê xebatên xwe de ji Heftenameya Basê re axivî.

**Morî yek salî ye**

Edîtoriya weşanxaneyê dest nîşan dike ku, Morî, bi dilxwaziyeke zarokane û bi evindariya zimanê xwe di 22ê Hezîrana 2016an de li Amedê ava bûye û van agahiyan dide, "Morî bi tenê ji bo zarokan, pirtûkên perwerdeyê amade dike. Armanca me ew e ku bi riya pirtûkan xewn û xeyalên zarokan pêş bikevin û ev materyal di perwerdeya Kurdî de bên bikaranîn. Weşanxanxeya Morî bi hişyariya ku zimanê zikmakî herî baş di zarokatiyê de tê hînkirin dixebite û ji bo ku zimanê Kurdî bi riya materyalên cuda bê hezkirin û li gorî derûniya zarokan pirtûkên zanistî, hestiyarî, civakî û psîkomotor tên amadekirin. Naveroka pirtûk û materyalên me, bi hişyariya zayenda civakî, ekolojî, pêşveçûna çand û hunerê, ziman û zanînê, civakî û takekesiyê, bîrkarî û pêşveçûna tenduristî û fizîkî bi baldarî tên amadekirin."

Ji bo pirtûkên zarokan bi qasî mijaran, hêsaniya ziman û xêzkirina pirtûkan jî girîng tê qebûlkirin. Edîtoriya weşnaxaneyê li ser vê mijarê wiha dibêje, "Di saziya Moriyê de pirtûk ji destê nivîskarekî dernakeve. Dema em pirtûkê ji bo çapê amade dikin, em 4-5 hevalên nivîskar re dişînin. Piştî ku ew li ser tekstê û li ser sererastkirina ziman disekinin, em wê tekstê ji pedagoga xwe re dişînin. Paşê jî wekî pirtûk çap dikin. Em bi gelek wênesazan re dixebitin ji ber ku formata her pirtûkeke me cuda ye. Carinan jî em pirtûkên xwe wekî mînak çap dikin û beriya çapê di dibistanan de bo perwerdeya zarokan bikar tînin. Li gorî nêrîn û rexneyên mamosteyan em pirtûkên xwe ji nû ve dizayne dikin."




Weşanxaneya Morî ku salek berê li Amedê ava bûbû, ji bo zarokan pirtûkên perwerdeyê yên bi Kurdî çap dike. Armanca Morîyê ew e ku xewn û xeyalên zarokan pêş bixe û materyal di perwerdeya Kurdî de bên bikaranîn.

**"Armanca me ew e ku hemû zaravayên me pêş bikevin"**

Edîtoriya weşanxaneyê li ser cure û zimanên pirtûkên Moriyê van agahiyan dide, "Piştî avakirinê me 2 setên perwerdeyê û 4 pirtûkên folklorîk û 2 pirtûkên Kurdên Xorasanê çap kirin. Di nava salekê de 4 set 13 pirtûkên zarokan hatin çap kirin. Em bi hemû zaravayan pirtûkên xwe çap dikin. Armanca me ew e ku hemû zaravayên me pêş bikevin. Heta niha me pirtûkên çîrok ên zarokan bi Kurmancî çap kirin û setên perwerdeyê jî pirtûka Bîrkariyê ya pêşdibistanê bi Kurmancî û Kirmanckî çap kir. Pirtûkên Morî'yê; Torî Morî (destpêka xwendinê 6 pirtûk) Kundê Zana (seta xwendinê 8 pirtûk), Tûtî (3 pirtûk), Şengê û Pengê, Pîrê û Dîko, Mam Rovî, Çîrokên Kûndirîkê, Pîrê û Çûçê, Şahmaran, Rovî û Legleg, Nûtiya Xweşik, Kêzxatûnê, Bendar (2 pirtûk), Kevirê Xelatê, Baxçeyê Kulîlkan, Hitokê û Papûşko (10 pirtûk), Yaro û Pînekê ne. "

### "Di vê Îlonê de em ê gelek pirtûkên hêja çap bikin"

Edîtoriya Morî diyar dike ku Morî bi tenê çîrokên folklorîk çap nake û wiha pê diçe, "Wek me li jor jî qal kir armanca me ew e ku em ji temenê 3an bigire heta temenê 14 salî bo hemû zarokan pirtûkan çap bikin. Em pirtûkên xwe dikin sê beş; ya yekem çîrokên zarokan, ya duyem pirtûkên perwerdeyê, ya sisiyan bo zarokên nûciwan jî pirtûk û romanên fantastîk. Em niha 2 romanên bo xortan amade dikin. 'Bendar û Kevirê Xelatê' her du roman jî fantastîk in." Edîtoriya weşanxaneyê di derbarê eleqeya ji bo pirtûkên zarokan ên bi Kurdî de wiha dibêje "Dê û bav pirtûkên me bo zarokên xwe bi dilxwazî dikirin. Zarok jî hem jî hêla wêne ve hem jî ji hêla naverokê ve ji pirtûkên me hez dikin. Di zarokîstanê de, zarok çîrokên me yên folklorîk ji ber dikirin."

Edîtoriya Weşnaxaneya Morî di dawiya gotinên xwe de van tiştan dibêje,"Di vê Îlonê de em ê gelek pirtûkên hêja çap bikin. Morî dê her dem bo perwerdeya zarokan bixebite. Morî her diçe mezin dibe. Malbatên me li ser malpera me û her wiha li ser înternetê jî dikarin pirtûkên me sîparîş bikin û peyda bikin.

## İlhami Sertkaya:

# Bêyî edebiyat, pêşeroja ku em xweziya xwe pê tînin nayê

BERFO GILÎDAX

Ji ber gelek sedeman hin nivîskar û helbestvanên Kurd bi salan e li derveyî welêt dijîn. Yek ji wan jî nivîskar û helbestvanê Kurd İlhami Sertkaya ye. Sertkayayê ku bi salan e li derveyî welêt dijiyî, heta niha 8 pirtûkên helbest û romanên bi Tirkî, pirtûkeke helbestan a bi Kurmancî, 5 pirtûkên helbest û romanan ên bi Zazakî (Kirmanckî) û broşûreke Yunanî, bi tevahî 15 pirtûk nivîsîne. İlhami Sertkaya li ser jiyan û berhemên xwe ji Heftenameya Basê re axivî.

İlhami Sertkaya di sala 1957an de li navçeya Kanîreşa Çewlîgê hatiye dinyayê û zarokatiya wî li Kanîreşê derbas bûye. Ji Enstîtûya Perwerdeyê ya Çewlîgê di sala 1979-1980an de mezûn bûye û ji ber rewşa wê demê bi tenê salekê mamostetî kiriye. Sertkaya ji ber sedemên wê demê neçar maye ku berê xwe bide xerîbiyê û nêzî 30 sal e li derveyî welêt dijiyî. Sertkaya ji ber têkiliya xwe ya siyasetê û hezkirina xwe ya edebiyatê dibêje ku ew nikare dest ji van her du tiştan berde û ji bo jiyana xwe, van her du tiştan jêveneger dibîne.



### "Zimanê zikmakî cîhana esil a herkesî ye"


Nivîskar Sertkaya di derbarê nivîsandina bi çend zimanan û xweşî û zehmetiyên wê de wiha diaxive: "Cîhana her zimanekî ji hev cuda ye. Ger hûn ketibin vê cîhanê, wê demê hûn dikarin li vê cîhanê jî bigerin lê belê zimanê zikmakî yê herkesî cîhana wî ya esil e. Min zaravayên Kurmancî û Kirdkî yên Kurdî baş nizanîbûn. Min hînbûna baş a van zaravayan wek deynekî hesiband û ez hîn bûm. Piştî pirtûkên helbestê yên bi Kurmancî, min demildest berê xwe da Kirdkî ya ku halê wê hê xirabtir e. Ger hûn zimanekî û mentiq û hemû hûrgiliyên wê baş bizanibin, wê demê dikarin bi rehetî binivîsin û hûn zehmetiyê nakişînin. Ji aliyekî ve helbet nivîsandin bi xwe zehmet e, ev ne bi zimên re eleqedar e. Çimkî gava ku hûn bi kîjan zimanî dinivîsin wê demê hûn bi tenê bi wî zimanî difikirin. Tu carî hûn bi zimanê ku pê dinivîsin bi zimanekî din nikarin bifikirin. Roman, bi taybet jî helbest, tu carî di zimanekî din de heman mane û hestê nade. Ji xwe cîhana her zimanekî ji hev cuda ye."

**Li xerîbiyê 30 sal...**

Sertkaya, li ser pirsa me ya "30 sal e ji welatê xwe dûr î, gelo ev rewş him wek şexs him jî wek nivîskar û helbestvanekî çawa bandor li ser jiyan û pênûsa te kir?" wiha bersiva me dide, "Rewşa welatê ku yeman e siyaseta vê jî yeman e. Ez bi vê hişmendiyê ketim nav siyasetê. Herçiqas mirov bizanibe tiştê ku neyê hişê mirov tê serê mirov, dîsa jî mirov nizane wê çi were serê mirov. Helbet min qet texmîn nedikir ku ez ê 30 salan ji welatê xwe dûr bikevim û nikaribim biçim welatê xwe. Rastiya ku jê re dibêjin 'hesret' e. Di hesretê de welat, dever, bûyer û rojev û çandên ji hev cuda hene... Mirov di nav jiyaneke tevlîhev de ye. Helbet mirov tiştekî dijiyî ev tişt li ser mirov bandor dike û li ser tecrûbeyên mirovan bi bandor e. Mirov pey bersivên pirsên nû dikeve. Di xeribiyê de, ger bikarîbî rewşa neyînî bikî erênî û digel vê li xeribiyê ziman, çand, edebiyat û nivîskarên cuda dibînî û wan nas dikî û muqayeseyan dikî. Herçiqas hesret hebe û ev yek di berhemên mirovan de cî bigire jî dîsa mirov dibêje divê ez xwe radestî hesretê nekim. Bi kurtî vê bibêjim ku divê ne bi tenê hesret, herwiha tiştên ku min dîtine, jiyame û hîn bûme jî di berhemên min de cî bigirin." Sertkaya heta niha 8 pirtûkên helbest û romanên Tirkî, pirtûkeke helbestan a Kurmancî, 5 pirtûkên pêkenok, helbest û romanên Zazakî/Kirmanckî û broşûreke Yunanî, bi tevahî 15 pirtûk nivîsîne. Kilama Şilanê, Birîna Bêar û Çewlik Bir Şiirdir Şimdi, navê hin pirtûkên wî ne. Her wisa bi senaryoya şanoyên Zazakî ya ku Sertkaya bi xwe nivîsine bi navê 'Hesrete' û 'Doktor Laser' wek berhemên şanoyê di berhemên wî de cî digirin. Sertkaya, diyar dike ku niha di dest wî de du romanên xilasbûyî hene. Piştî xebata du salan romaneke Zazakî xilas bûye û herwiha romana wî ya Tirkî jî piştî xebata salekê amade ye.

**"Qedera civakan bi du tiştan digûhere"**

Sertkaya di dirêjiya axaftina xwe de dibêje, "Nivîsandin bi daxwazê nabe. Dibe ku we gelek tişt jiyabin, ev nayê wê wateyê ku hûnê binivîsin" û wiha pê de diçe: "Eger nivîsandin hêsan bûya wê demê herkes wê bibûya 'nivîskar.' Herkes dikare binivîse lê herkes nikare bibe nivîskar. Divê ji bo edebiyatê daxwazeke we hebe. Divê qebiliyeta we hebe da ku hevokan di şikl û maneyên cuda de bikaribî bikarbînî. Ji aliyekî ve divê hûn gelek xwende û zana bin. Ji bo ku ji xwîneran re vebêjin, divê hûn zana bin. Ne bi tenê tiştê ku min jiyane, eleqeya min a edebiyatê yanî bi awayekî din bînim ziman, evîna min, min motîve dike. Ji wir şûn de êdî nivîsandin her di jiyana we de ye. Bêyî edebiyat, pêşeroja ku em xweziya xwe pê tînin nayê. Edebiyat ji bo civakekê hinek derûnî ye, hinek civakî ye û hinek çandî ye lê di eslê xwe de, nasname û ziman e. Qedera civakekê bi du tiştan; gotin û nivîsê digûhere. Ev jî edebiyat e. Edebiyat abadîn e. "




Nivîskar û helbestvanê Kurd İlhami Sertkaya heta niha bi zaravayên Kirmanckî, Kurmancî û Tirkî bi tevahî 15 pirtûk nivîsîne. Sertkaya dibêje, edebiyat ji bo civakekê hinek derûnî ye, hinek jî çandî ye lê di eslê xwe de nasname û ziman e.



CIWANMERD KULEK

## Dewlet

6ê Hezîrana 2011an Devlet Bahçeli, serokê Mhpê, li Meydana Stesyonê a Diyarbekirê wiha bang li Kurda dikir: "Hûn dibêjin "perwerdehiya bi zimanê dayikê", gava hûn perwerdehiya bi zimanê dayikê wergirin ma wê zikê we têr bibe?" Bahçeli ji bo kampanyaya partiya xwe a hilbijartinan hatibû Diyarbekirê. Partiya wî Mhp di 1999an de, bi bilindbûna pêla netewperest li Tirkiyê piştî girtina serokê Pkkê Abdullah Öcalan, di tarîxa xwe de dengên herî zêde wergirtibûn û ketibû meclisê. Du sal şûn de, 2001, gava krîza aborî a herî mezin a di tarîxa Tirkiyeyê de rû da Bahçeli di hikûmeta koalisyonê de di pileya herî bilind a siyasî a jiyana xwe de, alikarê serokwezîrtiyê, kar dikir. Di wê pêvajoyê de ku ji bo derbas kirina vê qeyranê her tişt hat nîqaş kirin û heta ji derveyî meclisê û ji derveyî welêt wezîr hatin anîn bo rast kirina aboriyê, ji bo têrkirina zikê welatiyan û baştir kirina piyaseyan tenê rêyek nehat ceribandin: Sûcdar kirina zimanê Tirkî. Bahçeliyê serokê partiya herî netewperest a Tirkiyeyê ji her kesî bêhtir dizanibû ku ziman ji faktoreke aboriyê bêhtir meseleyeke kulturê, netewbûnê û nasnameyê ye. Ji ber vê yekê ye ku em îro ro dibînin ku Venezuelaya ku bi duyemîn zimanê herî mezin ê cîhanê (a ne gorî hejmara axêverên wî), Spanyolî, diaxive ne dewleteke herî ziktêr e lê tew resmen jî "ji birçîna" dimire.

Dema Bahçeli wiha digot, serokê Pkkê jî ji çaxa ku hatibû girtin de bi riya parêzerên xwe misêwa ev peyam dişand derve û bang li Kurda dikir: "Hin dibêjin "dewlet", 22 dewletên Ereba hene ti xêr jê ne dîtin, a Kurda hebe wê çi xêrê jê bibînin?" Meseleya ku îro ro ev dewlet xwe ji Ereb bûnê bêhtir bi mezhebên xwe dixin rêzekê û bi vî rengî hem li navçeya xwe û hem li siyaseta navnetewî tevdigerin li aliyekî, tişta seyr ew e ku Öcalan ji 200 dewletên cîhanê çû evên hanê ji Kurda re kire mînak. Pirsgirêkên ku ev dewlet dijîn çiqas ji ber dewletbûna wan e, çiqas ji ber rejîma wan e, çiqas ji ber erdnîgariya wan e, çiqas ji ber baweriyên wan e, çiqas ji ber têkilî, civak û aborîzaniya wan e?.. Eger dewletbûna wan birastî jî çavkaniya pirsgirêkên wan be, naxwe ne lazim e ku çareserî jî hilweşandin yan tasfiye kirina van dewletan be ji bo ji navbirina pirsgirêkan? Gelo çima yekane tişta ku Kurda neceribandiye û bi dest nexistiye ji wan re wek rizgarî tê nîşandan? Em bibêjin bi rastî jî bi alavên zanistî hate isbat kirin ku pirsgirêkên van dewletan ji ber dewletbûna wan e, gelo em ê karibin pirsgirêkên hemû dewletên cîhanê bispêrin dewletbûnê? Wê çaxê em ê çi bikin ji dewletên halê wan xweş, nisbeten bê pirsgirêk û her kes dilê xwe dibijîne wan? Gelo çawa Swêdiyeki, Frensiyekî yan Amerikiyekî ku ez bawer nakim ku Kurdekî ewqas êş û derdê tinebûnê kişandî nexwaze dewleteke wî ya wek a wan hebe, fahm nake ku derdê wan î herî mezin bêderdî ye û ew jî ji ber wê ye ku dewleteke wan heye?

Dewletek dikare biçewsîne, zext û zor û zilmê ji bike, û dikare xweşî, pêşdeçûn, ewlehî û zenginiyê ji ava bike û belav bike. Cudahiya di navbera van herdu bijartekan de tişteki basit e: Birêvebirin. Pergala birêvebirinê ye, rejîma wê dewletê ye ya ku dewletan baş û xerab dike, ne dewlet bi xwe. Ji xwe re bifikirin: Eger dibistanek perwerdehiyeke baş nade, ew ji rûyê hebûna dibistanê ye yan jî rûyê pergala wê ye? Kî ji ber qezayên trafîqê û kuştinê pêşniyaz dike ku seyare ji dinyayê bên rakirin? K. Marx, rêberê ideolojiya ku Pkkê dabû pey, iddia dikir ku pergala sosyalist wê li nav dewletên ku alavên wan ên hilberandinê pirr pêş de ketine û kapîtalîzm li cem wan gihaştiye lûtkeyê pêk bê. Vêca gelo çima buhartin û ji navçûna dewletê ne li bal dewletên tirr tirre û xwedan tarîx û raboriyeke dirêj lê li nav me Kurdên Tirkiyê ên ku hînê ne dewletek di xewnê şevan de dîtine ne xud muxtariyek nas kirine pêk were? Dewletên Yekbûyî ên Amerikayê ji 50 dewletan pêktê, bifikirin ku rojekê Amerîkî hişyarbûn û gotin em ê tenê dewleteke xwe, yeka herî piçûk, tasfiye bikin û bibin ser îdareyeke di a ji 49 dewletên mayî.

Gelek mirovên dilxwaz bi salan angaşt kirin ku mebesta Pkkê û serokê wê ji van gotinan tênê xapandina dewleta Tirk bû, lewra ev tenê taqtiq û taqiye bû. Lê digel ku taqiye ji bo xapandina kesê li hember tê kirin xuya ye ên ku bi vê taqiyeyê xapiyan ji Tirkan bêhtir Kurd bûn ji ber ku Tirk ya cuda li dijî Kurda in û Kurd ji li berbayê van taqtîqan bûn bawermendinî hişk ên ku ji Tirka pirtir li dijî dewletbûna Kurda derdikevin. Bülent Ecevitê helbestkar, serokwezîrê hikûmeta wê demê a ku D. Bahçeli şirîkê wê bû, li meclisa Tirkiyê sê dengan wiha digot û dibiland: "Ne tenê li Tirkiyê û li navçeyê, Kurd li Arjantînê jî dewleteke ava bikin em ê li dijî wê bin." Gelek kesên ku heta demeke nêzik bi navê taqtiq û taqiyeyê li daxuyaniyên Öcalan û Pkkê ên li hember dewletbûnê (ew jî tenê dewletbûna Kurda!) ne digirtin û tê dibihurîn, gelo çi hîs kirin dema bihistin ku pile bilindên Pkkê heta bi ên li Ewropa eşkere ragihandin ku ew ne tenê li Tirkiyê lê li parçeyên dijî li dijî dewletbûna Kurda in, nexasim li parçeyeki wek Başûr ku êdî meseleya dewletbûnê ne hewceyî ti taqtîk û taqiyeyan e?

Dizanim hin jê bi dileki rast û dilxwaz mesele û arişeyên li ber dewletbûna Kurda tînin bîra xwe di vir de. Rast e, zehmetî gelek in. Lê gelo heq û pêwîstiya mafan li gor hêsanîbûn û dijwarbûnê tê diyar kirin? Bo nimûne, eger D. Bahçeli bigota "ez jî bi we re, kerem bikin perwerdehiyê bi zimanê xwe bikin", me yê karibûya di çend salan de û bi çi zehmetiyan ev yek têxistaya pratîkê? Gelo îro li Bakur referandûmek li ser perwerdehiya bi kurdî bêkirin, ew ê ji sedî çendê Kurda bibêjin "Erê"? Ihtîmal e ku Kurd bi xwe jê re bibêjin "na", gelo wê çaxê divê em bibêjin perwerdehiya bi kurdî ne mafekî rewaye, divê em dev jê berdin, xêrekê nagihîne me?

Maf ne tenê ji ber wê yekê tên parastin ku dikarin bibin realîte. Tenê ji ber ku heq in. Dibe ku ti carî nebin rastî û nebin nesîbê me jî, lê divê –û em dikarin – bibêjin û bixwazin ku ev heqê me ye. Dema nehiyeyek dibe wilayet hezar tişt diguherin, Kurd bibin dewlet çawa wê tiştek neguhere û pêşde neçe? Dewlet ji bo hêz û quwetê, perwerdehiya bi kurdî ji bo ronahî û geşedanê!

# Zebeşên Diyarbekirê li ber tunebûnê ne

■ BENGÎ BAWEŞAN

Hin mexsûl, ji bo hin bajaran bûne nasname. Dema dibêjin zebeş hema Diyarbekir tê bîra meriv. Bi salan e cotkariya zebeşan li Diyarbekirê tê kirin û cotkariya zebeşan di folklor û aboriya vî bajarî de cî girtiye. Her wisa zebeşên Diyarbekirê bi mezinahî û tama xwe jî bal dikişandin. Lê belê cotkarên Diyarbekirê dibêjin ev deh salên dawîn e her ku diçe ji ber gelek sedeman zebeşên Diyarbekirê ber bi tunebûnê ve diçin û ji ber vê heta gelek cotkar berê xwe dane cotkariya mexsûlên din. Cotkarê Kurd Zeki Îlhan ku 30 salan cotkariya zebeşan kiriye, li ser rewşa zebeşên Diyarbekirê ji Heftenameya Basê re axivî.



Bajarê Diyarbekirê ku bi zebeşên xwe tê zanîn, niha cotkarên Kurd dibêjin zebeşên Diyarbekirê ber tunebûnê ne. Ger lê xwedî derkevin û xebatên rêkûpêk bikin wê mîna berê ji zebeşan debreke baş bê bi dest xistin.

**"Niha zebeşên Diyarbekirê wek sembol tên çandin"**

Cotkarê Kurd Zeki Îlhan dibêje cotkariya zebeşan di heman demê de karê malbata wî bûye. Hê zarokekî biçûk bûye di nav zeviyên zebeşan de mezin bûye û heta 30 salan karê zebeşan kiriye. Lê belê Îlhan, ji ber gelek sedeman mecbûr maye ku dest ji karê xwe yê 30 salî berde. Îlhan niha çandiniya sewzeyan dike.

Îlhan wiha behsa rewşa cotkariya zebeşên Diyarbekirê dike,"Me bi qasî 30 salan zebeş diçandin û debreke baş jî bi dest dixist. Lê belê ev deh salên dawîn e cotkariya zebeşên Diyarbekirê kêm bûye û zebeş jî mîna berê ne mezin in. Ji ber gelek sedeman ev yek çêbûye. Niha erd ji bo cotkariyê biha ne. Yanî cotkarên ku zebeşan diçînin, hema bêje piraniya wan ne xwedî erd in. Dema erd biha be, nikarin erd îcar bikin, çimkî tevî bihayê îcarê, mesrefên din jî hene. Wê demê ev yek ji bo cotkaran zehmet e û nikarin heqê keda xwe jî hildin. Ji bilî vê, erdên Diyarbekirê westiyane û meriv nikare zebeşan biçîne. Ev jî dibe sedem ku hilberîn û qelîteya zebeşan ne baş be û êdî mîna berê zebeşên mezin ên wek 80-90 kîlo jî bi dest nekevin. Berê festîvala zebeşan jî bi awayekî rengîn dihat kirin. Her wisa ji ber ku zeviyên zebeşan bi dermanên kîmyewî tên dermankirin, ev dermanên kîmyewî dikeve nav axê û zirarê dide erd. Her wisa bi nezanî zeviyên zebeşan zêde tên avdan û ew jî dibe sedem ku erd çorax bibe. Ew hemû bûne sedem ku cotkariya zebeşên Diyarbekirê her ku biçe ber tunebûnê ve here. Li şûna zebeşan niha ji ber karê zêdetir, garis tê çandin. Niha zebeşên Diyarbekirê wek sembol tên çandin."

**"Ji bo zebeşan xwedî derketineke xurt lazim e"**

Îlhan diyar dike ku kesên xwedî erd, tevî ku erd û derfetên wan hene, dîna xwe baş nadin erdên zebeşan. Îlhan dibêje dewlet alîkariyê nade cotkarên nexwedî erd û yên xwediyê erdên biçûk lê dide kesên xweyî erd ku jiwxe rewşa wan baş e. Wekî din Îlhan destnîşan dike erdê ku du an sê salan li ser hev garis lê bê çandin, sala din eger zebeş lê bê çandin, debreke baş nayê bi dest xistin û wiha pê de diçe; "Çimkî wê çaxê erd xira dibe. Ger du û sê salan li ser hev genim bê çandin û paşê zebeş bê çandin debreke baş jê derdikeve.

Îlhan balê dikişîne ser şiklê hin cotkariyan û dibêje cihên ku cotkariya gelek mexsûlan dikin ên wekî bajarên Antalya, Edene û Mersinê, bi riya dilopandinê (sistema ku erd bi dilopên avê tê avdan) erd tê avdan û bi vî awayî erd zêde nayê avdan, mexsûl jî bi vî awayî zirarê nabîne...

### "Xebateke rêkûpêk pêwîst e"

Cotkarê Kurd Îlhan dibêje rewşa cotkariya zebeşan ne qeder e, ger xwedî lê derkevin û xebatên rêkûpêk ji bo zebeşan bên meşandin, wê cotkariya zebeşan mîna berê baş û zêde bê kirin û wiha pê de diçe, "Zebeşên Diyarbekirê hene û xilas nebûne û winda jî nebûne. Lê pirsgirêk ji ber sedemên beşerî ne. Ger pêkan bûya ez ê biçûma gundekî ku hê erdê wê xav e û li vir erdekî min î sabît bi qasî 50-100 donim û motora min hebûya minê cotkariya zebeşan bikira. Ger cotkariya zebeşan bi awayekî baş û bi pisporî bê kirin, wek berê wê debreke baş ji zebeşên Diyarbekirê bê girtin. Cotkariya zebeşan ne zehmet e, pir hêsan e."

Îlhan dibêje ger erdê cotkar bi xwe hebe, dikare ji zebeşan debara xwe bike lê ger erdê wî tune be niha debara ji zebeşan gelek zehmet e. Îlhan amaje pê dike ku di nava mehên 4 û 5an de zebeş tên çandin û piştî 40 rojan jî tên berhevkirin û firotin. Îlhan tîne ziman ku zebeş, di axa hinekî reş û hinekî jî bi qûm de baş çêdibe. Her wisa zebeş li ber çeman baş çêdibin. Erdên wekî benîşt bo zebeşan ne baş in û zebeş ji germê jî gelek hez dike.

Bazirganên Kurd:

# Bila bazirgan li welatê xwe kargehan vekin

■ BİLAL ADLIĞ

Pêşketina derfetên çûnûhatinê, înternet û şiyarbûna bazirganên Kurd ên bi normên cîhanê re, bazirgan dest bi hilberandinên din ên bazirganiyê dikin. Piştî salên 2010an Kurdên Bakur ku bi taybetî jî di salên 90î de terka welatê xwe kiribûn, berê xwe careke din dan welêt û dest bi karkirin û bazirganiyên cuda dikin. Yek ji wan bazirganan jî Weysi Dermirhanê ji Batmanê ye ku piştî 15 salên xebata di tekstîl û dikanên li Stenbolê de, berê xwe daye axa bav û kalên xwe. Weysi, di sala 2016an de tekstîla xwe li gundê Dirbêsa ku girêdayî Batmanê ye ava dike. Weysi, li gundê xwe tekstîla xwe vedike û dest bi pakêt û ûtîkirina markayên navdar ên Tirkiyeyê dike. Em weke Heftenameya Basê bi bazirganê tekstîlê Weysi Demirhan re di derbarê karê tekstîlê û tekstîlvaniyê de axivîn.

**"Xebatkarên me yên xwedî dîplomaya zaningehê jî hene"**

Weysi, çîroka vekirina tekstîla xwe ji me re vedibêje û wiha didomîne: "Di sala 2016an de me tekstîla xwe vekir û niha 30 xebatkarên me hene. Dema me dest pê kir tenê endamên malbata me hosteyên vî karî bûn. Ji bilî me hemû xebatkar ne xwedî tecrûbe bûn. Me bi dilekî fireh ew fêrî karê ûtîkirin û pakêtkirinê kirin. Îro hemû xebatkarên me jî bûne hoste. Çend xebatkarên me yên ku zanîngeh qedandine jî hene. Zanîngeha xwe bidawî kirine û li benda bicihbûna di karê xwe de ne. Naxwazin betal bimînin û em jî li gund in, ji bo van ciwanan dibin derfeteke baş. Piraniya xebatkarên me jî jin in." Demirhan ji me re qala armancên xwe di vî karî de dike. Demirhan; "Em niha ji markayên mezin re dixebitin. Em niha tenê ûtî û paketê dikin. Armanca me ew e ku em dest bi hilberandina cil û bergan bikin. Hedef û daxwaza me ew e ku em di demeke kin de dest bi hilberandinê bikin. Eger em dest bi hilberandinê bikin dê hejmara xebatkarên me bigihîje 70-75an Wê demê dê karê me berfirehtir bibe û em ê him hilberînin him jî ûtî û pakêtê bikin û bifiroşin. Eger em dest bi hilberandinê bikin, ev, dê tesîreke gelek erênî li gund û gundiyan bike."



"Îro li Batmanê bingeha karê tekstîl û bazirganiyê gelek baş e. Ew Kurdên ku li bajarên Tirkiyeyê dixebitin jî giştî bi vî karî re mijûl in. Ez bangî wan dikim da ku vegerin welêt û li vir kargeh û tesîsên hilberandinê vekin."

**"Xebatkarên me bi giştî jin in"**

Tekstîla Baran Groupê di 19ê Nîsana 2012an de li gundê Kaniya Henê ya girêdayî navçeya Hezoya Batmanê hatiye ava kirin. Cîo'yê Baran Groupê Seyfettin Kılıç ji Basê re qala karê xwe, bazirganî û rewşa xebata tekstîlvaniyê dike. Kılıç dibêje, "Me di sala 2012an de tekstîla xwe vekir. Beriya em vegerin welêt me li bajarên Tirkiyeyê heman kar dikir. Me biryar da ku em li welatê xwe karê xwe bikin, da ku fêdeya me bigihîje welatiyên me. Niha 280 xebatkarên me hene û piraniya xebatkarên me jin in. Zaftirîn xebatkarên me lîse qedandine û çend xebatkarên me jî zankoya du salane (Önlisans) qedandine. Bi rastî jî vegera me bo welatê me kêfxweşiyek çêkir. Em li vir dirûtina kot û penyayan dikin."

**"Em kincan didirûn û dişînin Stenbolê"**

Kılıç di derbarê karên xwe de ji me re wiha diaxive: "Em ji fîrmayên mezin ên Stenbolê kar digirin û karê wan li vir, li Batmanê amade dikin û dîsa dişînin Stenbolê. Li gor zehmetî û hêsaniya cil û bergan mehane karkiriya me diguhere lê em dikarin bibêjin bi giştî mehane 45 hezar kar ji tekstîla me derdikeve. Niha em karê dirûtin, şûştin, ûtî û pakêtkirinê dikin." Kılıç dema ji me re qala xeyalên xwe dike dibêje, em dixwazin bi marqaya xwe, bi navê xwe û karê xwe derkevin bazarê û wiha didomîne; "Di dahatûyê de em ê hejmara xebatkarên xwe bikin 500-600 û dest bi afirandina marqaya xwe bikin. Wê demê ez bawer im ku dê kar û fêdeya me zaftir bigihîje welatê me."

**"Werin bila Kurd jî kar bikin"**

Kılıç jî weke Weysi Demirhan bangî karsazên Kurd ku li derveyî welat kar dikin, dike û wiha pê de diçe: "Ez bangî hemû bazirganên Kurd dikim, bila werin li welatê xwe kargehan vekin û welatiyên xwe bixebitînin. Him xebatkar dê neçar nemînin ji welatê xwe dûr nekevin û him jî hûn wê li ser axa xwe karê xwe bikin. Piştgiriya dewletê jî, teşwîqên aborî jî hene ji bo ku hûn vegerin welatê xwe. Yek kargeha ku li welat tê ava kirin ji bo 40–50 malbatî dibe cihê kar û xebatê. Niha Batman ji bo karsazên bi tekstîlê re mijûl in gelekî guncaw e.



### "Ez bangî Bazirganên Kurd dikim; vegerin!"

Eger bazirganên Kurd berê xwe bidin welatê xwe dê Batman jî bikeve nav rêjeya sereke. Weysi di derheqê xebata xwe ku bi salan li Stenbol û bajarên Tirkiyeyê kiriye dike û dibêje: "Îro li Batmanê bingeha karê tekstîl û bazirganiyê gelek baş e. Ew Kurdên ku li bajarên Tirkiyeyê dixebitin jî giştî bi vî karî re mijûl in. Ez bangî wan dikim da ku vegerin welêt û li vir karsaz û tesîsên hilberandinê vekin. Bila werin di nav mirovên xwe de van karan bikin. Herêma me gelek paşdamayî ye. Divê em hemû berpirsyariya xwe bicih bînin. Eger ew karsaz jî vegerin welêt û karê xwe li vir bikin, dê tesîreke baş li welêt bikin. Îro li Batmanê bingeha tekstîlê heye. Bila werin û biyaniyan jî bi xwe re bînin û werin. Karê tekstîl û bazirganiya hilberîneriyê li Batmanê gelek pêşketiye. Eger em li vî gundî, li serê van çiyayan dikaribin karê xwe bimeşînin, ev tê wê wateyê ku Batman û herêma me ji bo tekstîlê gelek baş e. Ez di wê baweriyê de me ku wê Batman di warê tekstîlê de bibe mînyatûrê Stenbolê."

# Hosteyên Cîgeran; Li Diyarbekirê rojê 8 ton cîger tê xwarin

■ ROZAN ATEŞ

Hinek bajar hene ku, bi navê xwe dernakevin pêş. Ew bajar bi taybetî an bi navê xwarin an bi navê vexwarin an jî bi tiştekî din tên bîra mirovan. Diyarbekir çiqas bi navê zebeş û sûran derketibe pêş jî, kibabên cîgeran jî bûye sembola Diyarbekirê. Mirov nikare cîgeran jî ji wan cuda bifikire. Cihê cîgeran di nav çanda xwarinên Diyarbekir de gelekî giring e. Gelê Diyarbekirê cîgerên biraştî bes di şîvê naxwin, serê sibehan li şûna taşteyê jî cîger tê xwarin. Cîgerê Diyarbekirê bala geştyarên dimatî û xerîban jî dikişîne. Cîger berê di nav kuçeyên kevin de, binê sûran û li ber derî erebeyan dihat firotin. Niha Cîger di nav bajêr de gelekî popüler bûye. Cihên kevn, şûna xwe dane cihên lûks. Berê li Diyarbekirê rojê tonek cîger dihat xwarin lê niha ev rêje rabûye 7-8 tonan. Cîger ji bo aboriya bajêr jî gelekî taybet û girîng e. Osman Hoste li Diyarbekirê karê Cîgeran dike û ji Basê re behsa karê xwe dike û wiha dibêje: "Cîger li cihê luks be jî li cihê ne luks be jî ji bo gelê Diyarbekir ti girîngiya vê yekê tune ye ji ber ku ev xwarin li her derê tê xwarin. Ji ber ku gelê Diyarbekirê dizane ku cîger li nav kuçeyên kevn tê xwarin û tama wê jî li wan deran xweştir e."

**"Em li ser daxwaza gel hatin van deran"**

Hostayê cîgeran Îhsan, niha li navenda nûh karê xwe yê cîgeran dimeşîne û dibêje: "Em li ser daxwaza gel hatin van deran. Kesên ku li cihê kevn cîgeran dixwin ji me re dibêjin, "Em dixwazin êdî cîgeran li cihên lûks jî bixwin û tama wê cîgerê winda nekin." Wek mînak hûn herin jiyana kibabfiroşan mêze bikin hemûyan li cihên biçûk dest bi vî karî kirine û hêdî hêdî cihên mezin vekirine. Em li ser daxwaz û pirsgirêkan hatin cihêyê nû."

**"Sala 2016an gelekî xerab derbas bû"**

Hosta Îhsan dibêje : "Jixwe mirovên Diyarbekirê bi cîgerê şiyar dibin û bi cîgerê radikevin." û gotina xwe wiha berdewam dike: "Niha rewac gelekî zêde ye, berê ne wiha bû. Bûyerên Diyarbekirê bandoreke mezin li karê me kir, bi taybetî jî li aliyê geştiyaran ve. Lê niha rewş hêdî hêdî ber bi başiyê ve diçe." Îhsan diyar dike, "Sala 2016an ji aliyê me ve gelekî xerab derbas bû lê em bawer in ku sala 2017-2018 bi bo me dê baş bibe."

**"Cihê cîgeran li nav herêmê gelekî giring e."**

Dema behsa cîgeran tê kirin, ewil Diyarbekir tê bîra mirov. Hosta Îhsan behsa çanda cîgerê dike û dibêje: "Çanda cîgerê gelekî kevn e. Diçe heta sala 1970î û di wê salê de popüler dibe, heta niha tama xwe diparêze û heta îro tê" Hosta Îhsan Mînakekê dide û dibêje "Bajarê Rihayê dibêje cîger a me ye, Diyarbekir jî dibêje ya me ye. Lê cîger ji destpêkê jixwe ya Diyarbekirê ye." Cihê cîgeran li nav herêmê gelekî girîng e." Hosta Îhsan behsa xwarina cîgeran dike û dibêje: "Cîger li Diyarbekirê rojê nezikî 5-7 ton tê xwarin. Gelê Diyarbekirê sibê, navroj û bişev cîgeran dixwe, em jî daxwaza wan bicih dikin." Hosta Îhsan diyar dike ku nifûsa Diyerbekir ji xwe nezikî 2 milyonan e. Em bêjin nezikî milyonek mirov her roj cîger bixwin, daxwaz û pêşkeşî hevdû temam dikin.

**"Cîger li ku be jî ji bo Diyarbekiriyan ne girîng e"**

Hostayê cîgeran Osman jî wiha behsa cîgeran û karê xwe dike: "Hûn jî dizanin ku berê cigêr li nav kolanên kevn, binê sûran û an jî li ser erebeyan dihat firotin. Lê belê ew der ji ber ewlehiyê cihên bi talûke bûn û geştiyar jî gava diçûn wan deran hînekî bitirs diçûn. Lê ew der ji bo me cûda bûn, ew der xweşikahiya me bûn." Hosta Osman axaftina wiha didomîne, "Gava geştiyar tên, dixwazin herin cihên lûks, ji bo vê jî cihên lûks ji bo Diyarbekirê tişteki gelekî baş e." Osman li ser bajarê Diyarbekirê jî dibêje: "Vekirina cihên lûks ji aliyekî ve jî ji bo bajêr baş e. Lewra şênî tê bajêr. Ev guherîn ji bo gelê Diyarbekirê nayê tu maneyê lewra Diyarbekirî dizanin ku cîger li nav kûçeyên kevn jî di binê sûran de an jî li ser erebeyan jî tê xwarin. Diyarbekir êdî bajarekî mezin e. Biçûktiya wî nemaye. Ew tişt jî daxwaz in."

### "Berê rojane tonek cîger dihat xwarin, niha 7-8 ton tê xwarin"

Hosta Osman derbarê eleqeya xelkê bo cîgerê jî wiha diaxive: "Berê her kes, ji bo ku cîgeran bixwin berê xwe didan sûkê, lê îro cihên cîgeran li nav bajêr jî gelekî zêde bûne. Êdî hûn dikarin li her derê cihên cîgeran bibînin û bixwin. Hûn taxa Diclekentê ne, hûn dikarin cîgeran bixwin an jî hûn dikarin li cihên cuda bixwin. Berê em bêjin toneke cîger dihat xwarin lê niha ev rêje bûye nêzikî 7-8 tonan. Eleqe û rewac jî îro gelekî zêde bûye."

Hostayê cîgeran Osman wiha behsa girîngiya cîgerê dike, "Herçiqas qeydeke nivîskî tune be jî, rewşenbîr û siyasetmedar jî dizanin ku cihê cîgerên Diyarbekirê cuda ye. Tama cîgerên Diyarbekirê gelekî cuda ye. Tama cîgerên xweş ên Diyarbekirê ji biharat û rûnê dûv tê. Ji bo aboriya bajêr jî gelekî girîng e ji ber ku em qala 8 tonan dikin û kîloya cîgerê jî bi 40 lîreyî tê firotin."

Navçeyên Diyarbekirê:

# Gêl, Hênê, Çêrmûg, Çingûş

NÛJÎN ONEN

Bajarên kurojbirojbidîwaranbiavahiyan tê dorpêçkirin, nahêle kumirov bêhnê bistîne, li her cîhekî guncaw hew tu dibînîavahiyekhatiyeçêkirin. Her ku diçe darûberên li bajaran jî kêm dibinçi tiştên ku nêzî xwezayê ne roj bi roj bi destê mirovan ji holê radibin. Gerrewşwihaberdewam bike wê rojekê darekbi dest me nekeve da ku em pişta xwe bispêrin û bêhna xwe vedinû li dengê çivîkên li ser daran guhdar bikin. Em hatine wextek wiha ku êdî mirov ji bo bêhna xwe veke û xwe biavêje bextê xwezayê berê xwe bi navçe û gundan vedikin. Ji ber ku hîn dor nehatiye ser navçeyan ji ber ku hîn xwezaya navçe û gundan bi destê mirovan nehatiye xerakirin. Êdî ev der wek cîhê bêhnvedanê tê dîtin. Hefteya Borî me berê xwe dabû navçeyênDiyarbekirê. Vê hefteyê jîemê geştaxwebinavçeyêndinberdewambikin. Vê carê jîemê danasînanavçeyên; Gêl, Hêne, Çêrmûg û Çingûşêbikin. Belkîrojekê rêya webi van navçeyanbikeve, belkî bêhnawe ji bajaran tengbibe da ku hûn biçin bêhnaxwe li wir vekin.



**Gêl (Eğil)**

Gêl yek ji navçeyên Diyarbekirêye kubixwezaû dîrokaxwe weke bihûştekebiçûk li kêlekaçemê Dîcleyê ye, 50 km dûrîDiyarbekirêye. Hetaniha ji bo vê navçeyê geleknavhatinebikaranîn; Gêl (Kurmancî), Aşipalis (Asûrî), Welareseko (Ermenî), Encil-Enigelene (Sûryanî), Eagla-Artagigarata (Romayî), Basilo( Bîzansî) û Eğil (Tirkî). Gêl him ji aliyê geşta xwezayê, him ji aliyê dîrokê, him jî ji aliyê geşta baweriyê ve yek ji navçeyên girîng ê Diyarbekirêye. Ji navên ku min rêzkirine jî diyar dibe ku gelek şaristaniyanli vir hikûm kirine. Li gor lêkolînên arkeolojîk dîroka navçeyê digihêje Serdema Paleolîtîka Navîn (Berî Zayînê 20000-15000) hîn berî hezar salan li vir jiyan hebûye. Şaristaniyên kuli navçeyê hikûm kirineemdikarinwihabinivîsînin; Hûrî-Mîtaniyên kuêdîweke pêşiyên Kurdan tênqebûlkirin. Herwiha Urartu, Med, Pers, Îskenderê Mezin, Asûrî, Roma-Bîzansî, Ebbasî, Selçukî, Tîmûr, Akkoyunî, Safevî û Osmaniyan hikûm li vir kiriye. Şerefxanê Bîdlîsîjîdi pirtûkaxwe ya Şerefnameyê de wihabehsa dîroka Gêlê dike; "EşîraMirdasiyan di sala 1029an ji Helebê hatineû Keleha Gêlê bidestxistine. Li navçeyê bêhtir Kirmanc dijîn û axaftin jî bêhtir bi zaravayê Kirmanckî ye. Navçe him bixwezayaxwe him jî bi dîroka xwe demên dawiyê bûye cîhekî girîng. Herwiha ji berku li navçeyê qor û qebrên nebî û ewliyayan yênwek Hz. Elyasa û Hz. Zulkîf, Nebî Harûn, Nebî Alak, Zunnûn û Danyalhene, weke bajarê Pêxemberan jî tê naskirin.

Piştî zanyariyên dîrokî, ger rojekê rêya we bi vê navçeyê ket hûn dikarin çi bikin, li ku bigerin ezê ji we re vebêjim.







**GeştaCurnê**

Li Gêlê dema bi erebeyê hûn berjêrî qeraxa bendava keça qral dibin dê çavê we li curnê li ser avê bikeve, ewcurn ji bokesêkudixwazin li ser bendavê derkevegeşta xwezaû dîrokê firsendekegelekîbaş e. Hercurnek 10 kesîradigire, li wir xizmetekeekstra jî didin geştiyaran ew jî muzîk e. Geştiyarên ji govendê hez dikin, dikarin li ser bendavê govendê jîbigerînin. Dema we geşta ser bendavê xelas kir îjar dema xwarinê ye. Masiyên ku ji bendavê tên girtin li restorantê, li kêlekabendavê tênçêkirin, kesên ji masiyan heznakin dikarin xwarinêngoşt jî bixwin.

**Keleha Gêlê**

Evkelehakudi demaAsûriyan dehatiyeçêkirin ji bo wê demê cîhekî stratejîk bûye. Li her sê aliyênkelehê newalên kûr hene. Li ser kelehê gelek bîr hene, di zinaran de hatine qewartin û bi ava baranê hatine tijekirin. Bi vî awayî pêdiviya avê hatiyedabînkirin. Her wiha 4 tûnelên veşartîjîdi vê kelehê hene û ev tûnel ji bo ku biçin hemaman û ji bo ku di dema şer de dijmin kesên ku di kelehê re derbasî cîhênewle dibin nebîne, hatine çêkirin. Li aliyê rojavayê kelehê li pêş, fîgûrê qralê Asûriyanbinivîsamîxanhatiyeçêkirin. Li aliyê kelehê yê din jî stela, Qralê Asûra Salmanasarê III. Bi awayekîku milê wî yê çepê bistû ve daliqandiye, di destê çepê de şûr, di destê rastê de bivirê du serî, li serêwî jîserpoşekheyebivîawayî hatiyeteswîrkirin.

**Şikeftên Dêranê**

Piraniya van şikeftan li aliyê Dêranê ne. Ev der jî di bin Gola BendavaDîcleyê de maye. Hin şikeftên ku ji avê xelas bûne di bin avê de nemane niha jî tên dîtin. Ji sedî zêdetir şikeft hene li herêma Dêran. Li qeraxabendavêweke tabloyeke dîrokîdixûye.

**Gorên Qralên Asûriyan**

Ev gorên Qralên Asûriyan ku di zinaran de hatine qewartin, di şiklê pîramîdan de ne. Gorên Qralê Asûriyan li qerexabendavaDîcleyê ne. Ev avahiyên hezar salî ênli kêlekabendavê rûyekîcihêdide wê derê kumirov ji temaşekirina wê têr nabe. Li aliyê rojhilataGoraQralê Asûriyan tûnel jî hene lê ji berkuew tûnelbikevirû qirşikantije bûye hatiyegirtin.

**Hemamênli navçeyê**

Li navçeyê sê hemamên dîrokî hene; yek li aliyê Dêranê, yek li taxa Tekya û ya din jî li taxa keleha kevn e. Ji bo hemama li devera dêranê, di bin erdê de tûneleke veşartî hatiye çêkirin. Lê devê tûnelê bikeviranhatiyegirtin. Hemamên li taxa tekya û dêranê jî di bin ava bendavê de mane. Dema av nizm dibe, ji jor ve hemama dêranê xuya dibe.

**Qebrên Nebî û Pêxemberan**

Me behsa van nebî û pêxemberan kiribû ku didu jê ji ber ku dikira di bin bendavê de bimana li gorên Hz. Zulkif û Hz. Elyesa barkirin ser girê Nebî Harûn. Ger hûn bixwazinhûndikarinserdanaqebrê nebî û pêxemberan jî bikin.

> Weke navê gelek bajar û navçeyên Kurdistanê, navê Çêrmûgê jî bi demê re hatiye guhertin. Germav, Germik, Cermik û herî dawî jî navê wê bûye Çermik. Ev navçeya ku 90 km dûrî Diyarbekirê ye bi xweza û germavên xwe, ji bo geşta tendûristiyê ji bo navçeyê gelekî girîng e.

**Dêrên Suryaniyan**

Li navçeyê li binê kelehê, dêra Suryaniyan. Qubeya li ser mîhraba dêrê bi awayekî taybet hatiye çêkirin ji bo akustîka deng pêk bîne. Bi awayekî hatiye çêkirin ku boriyên seramîk tê de hatiye çêkirin û bicîhkirin. Ji kîtabeya avahiyê jê hinek xerabûye bi suryanî hatiye nivîsandin, ji wir tê fahmkirin ku Piştî Zayînê di sedsala 3yan hatiye çêkirin. Li hêla kelê yê dêrê, li cîhekî bilind, di nav şikeftê de gorên pênc ezîzên xiristiyanan hene ev gor ji aliyê Suryaniyan pîroz tê qebûl kirin.

**Hênê (Hani)**

Yek ji navçeya din a Diyarbekirê li rojhilatê Diyarbekirê dikeve û 97 km dûrî bajêr e. Gelên li navçeyê dijîn bêhtir zaravayê Kirmanckî diaxivin lê Kurmancî hene. Navê navçeyê bi zaravayê Kirmanckî tê wateya kaniyê. Ev navçe jî xwedî dîrokeke gelekî kevn e. Li navçeyê şopên Hûrî-Mîtanî û Nairiyan tên dîtin. Yek ji cîhên dîrokî yê navçeyê, Mizgefta Mezin a Hênê ye. Mizgeft li navçeyê, li kêleka şaredariyê ye. Li gor texmînan di serdema 13. û 14. de ji aliyê Artûqiyan ve hatiye çêkirin. Yek ji cîhê din Medreseya Xatûnî ye. Ev medrese jî ji Artûqiyan maye û di serdema di navbera 12-13an de hatiye çêkirin.

**Ava Eyn Kebîr**

Li navçeya Hênê yek ji balkêştirîn cîh ew e ku li kêleka Medreseya Xatuniye çavkaniya avdaniyê

## Çiyayê Bûkê û Efsaneya wê

Ev çiyayê ku dema mirov ji dûr ve temaş dike dişibe koma mirovan, bi awayekî xwezayî ji ber maşandina av û bayê çêbûye. Sedema ku ji vî çiyayî re dibêjin Çiyayê Bûkê jî ev; Li gor rîwayetan du bûkên ku bûne berdêlî, dema ji ber wan çiyayan re derbas dibin rastî hev tên û di wê navberê de nifiran li hevûdu dikin. Piştî wan nifiran him herdu bûk û him jî berbûyên wan li wir dibin kevir û sîlûetên wiha derdikevin holê.

## Li Çêrmûgê cihên seyranê

Li Çêrmûgê ji xeynî germav û cihên dîrokî alternatîfek e din heye ew jî cihê seyran ê ye. Sûlav û çemê li Çêrmûgê ji bo geştyarên herêmê û bajar û navçeyên derdorê bûye cihê bêhnvedanê. Çem û Sûlava Sînagê ji bo demsala havînî gelekî hênik e, kesên ji him û gima bajaran aciz in bi malbatê xwe re berê bi van seyranan vedikin. Li ber çem gelek cafe û cihên xwarinê jî hene kesên bixwazin dikarin xwarinên xwe bi xwe re bibin li wir goşt bibirêjin û têkevin avê.

ya navçeyê ji wir tê. Ava ku ji heft çavan derdikeve li hewza dîrokî ya medreseyê digewim e ji wir jî diçe ser zevîyên navçeyê. Herwiha çîroka vê hewzê jî heye; Rojekê şivanek dema pezê xwe li cîhekî bêav diçêrîn e, dibîne ku bizineke wî li cîhekî av vexwariye û riyê wê şil e. Şivan dide pêy bizinê û çavkaniya avê dibîne. Piştre jî bilûra xwe diavêje nav avê û dibîne ku av ji ku tê. Şivan dibîne ku bilûra wî li ava Eyn Kebîr derdikeve.

**Çingûş (Çengûş)**

Navê berê yê navçeyê Çingûş e, bi zaravayê Kirmanckî tê wateya çavê şil. Li gor hin çavkaniyan Çingûş di 1040îde ava bûye. Navçeya Çingûşê 117 km dûrî Diyarbekirêye. Yek ji cîhên navçeyê yê dîrokî Tek Beden e. Keleha Tek li navenda Çengûşê, li Taxa Camiya Kebîr e. Ev keleha li ser girekî 150 metreyî bilind hatiye çêkirin. Ev keleha li kêleka çemê Çengûşê bi pireke hilawistî mirov dikare xwe bigihînê. Yek ji cîhê dîrokî yê navçeyê Dêra Ermeniyan a Surp Asdvavadzîn e. Ev dêr di sedsala 15an de hatiye çêkirin. Dêreke din jî li navçeyê heye û ew jî Dêra Ermeniyan, Surp Garabed e, ev jî di sedsala 15an de hatiye çêkirin lê gelek cîhên wê hilweşiyane. Berê bêhtir li navçeyê Ermeniyên Kurmanc dijiyan lê dewletê Tirkmenên ji Kafkasyayê anîne li vir bicîh kirine da ku demografiyê bigûherînin.

**Çêrmûg (Çermik)**

Weke navê gelek bajar û navçeyên Kurdistanê, navê Çêrmûgê jî bi demê re hatiye guhertin. Germav, Germik, Cermik û herî dawî jî navê wê bûye Çermik. Ev navçeya ku 90 km dûrî Diyarbekirê ye bi xweza û germavên xwe, ji bo geşta tendûristiyê ji bo navçeyê gelekî girîng e.

**Germava Çêrmûgê**

Ev germavli gor lêkolînan ji bo gelek nexweşiyan baş e, hin ji wan ev in; Nexweşiyên Jinan, Êşa piştê, nexweşiyên çermîn, ba û felca zarokan û hwd. Dîsa jî kesên ku bi biryarin ku biçin vir, divê ewil biçin bijîşkan piştre biçin germavê. Pileya germahiya avê 48 e. Di hundirê avê de sodyûm, biokarbonat, klor, sulfat, bromur û kukurd heye. Ji xeynî germav û xwezaya xwe navçe bi cîhên xwe yên dîrokî jî girîng e. Yek ji balkêştirîn cîhê dîrokî yê navçeyê Sînagogeke cihûyan e. Ev avahî weke mal tê bikaranîn. Tevahiya sînagogê bi kevirên reş û spî yên bazalt hatiye çêkirin. Li ser deriyê sînagogê kitabeya Îbranî heye. Li gor salnameya wan, ev der di 5176an de hatiye çêkirin. Ji bo geştiyaran li navçeyê gelek otel jî hatine çêkirin. Kesên ku dixwazin li wir tedawî bibin dikarin li wan otelan bimînin.

**Pira Haburmanê**

Ev pira nêzîkî gundê Haburmanê di wexta xwe de pireke stratejîk bûye. Pireyê rêya Çêrmûg, Sêwreg û Helebê bi hev vegirê dida. Pira ku 3 çavê wê hene, bi keviran hatiye çê kirin. Li gor kîtebaya li ser pirê, pir di sala 1179an hatiye çêkirin. Her çar aliyên pirê bi çiya ye.



